# BERBANG

Organa Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê * Sal: 7 Hejmar 2/88



RAPORA XEBATA

FEDERASYONA KOMELÊN

KURDISTANÊ LI SWÊDÊ

JI BO KONGRA 8-EM

(13-14.2.1988)











BERBANG

Organa Federasyona Komelên Kurdistanê
Li Swêdê
Organ för Kurdiska Riksförbundet

**Berpirsiyar**
K. Îzol
**Serekredaktor**
R. Zîlan
**Redaksiyon**
M. Bekir, C. Hayderî, J. Kurdo, R. Simo
**Karê teknîkî**
Broyê Macîr, Bavê Rojbîn

**Ansvarigutgivare**
K. Izol
**Chefredaktör**
R. Zilan
**Redaktion**
M. Bekir, C. Hayderi, J. Kurdo, R. Simo
**Sättning och layout**
Broyé Macir, Bavé Rojbin

**Adress**
Box 45205
S-104 30 Stockholm

**Telefon**
08/68 60 60

**Postgiro**
64 38 80-8

**Abonetî/Prenumeration**
Kes/Enskilda: 100 Skr./sal-år
Meqam/Myndigheter: 200 Skr./sal-år

**Îlan/Annons**
Rûpela paşîn/Baksida: 2000 Skr.
Rûpelên navîn/Insidor: 1000 Skr.

Redaksiyon ne berpirsiyarê nivîsarên bi îmze û axaftinên Federasyonê ye. Nivîsarên ku ji Berbangê re tên şandin, heke çap jî nebin, li xwedî nayên vegerandin.

**ISSN-0281-5699**

Xwendevanên hêja,

Bi vê hejmara Berbangê ve em salekî xwe diqedînin. Komîta Kargêr, Komîta Giştî û Redaksiyona Berbangê, vatiniyên xwe yên salekî bi başî û kêmasiyên xwe, anîn cî.

Di vê hejmarê de ji xwe em Rapora Xebata salekî pêşkeşî xwendevanên xwe dikin. Herweha ev rapora ji bo hemû Komelên me yên endam, nunerên Kongra 8-em û rêxistinên xwendî re jî hatiye şandin. Êdî, nunerên Kongra 8-em dikarin dîtin û rexneyên xwe di derheqa vê raporê, di Kongrê de bînin ziman. Li gor biryara Komîta Kargêr, ji hemû endamên organên Federasyonê dewa hat kirin ku li ser karûbarên salekî û bi tevayî dîtin û pêşniyarên xwe li ser rewşa Federasyonê, ji bo Berbangê binivisînin. Hin heval nivîsên xwe ji bo me şandin. Ji ber vê yekê, ev hejmara bi temamî li ser Rapora Xebatê û nivîsên ku heta niha ketiye destên me ye. Em spas ji bo hemû xwendevanên xwe û herweha ji hemû endamên Federasyonê re dikin ku bi nivîs û alîkarîyên xwe yên hêja, piştgirî ji bo xebata Federasyonê kirin.

Redaksiyona Berbangê bîryar dabû ku li ser 50 saliya serhildana Dersimê jimareke xas derbixe. Ew hêjmar wê piştî kongra Federasyonê bê çapkirin.

Em hêvî dikin ku Kongra 8-em ji bo hêztirbûna Fedarasyonê gavên girîng û hêja bavêje.

**Keya Îzol**

**Sal: 7 Hejmar 2/88 (47) 8.2.1988**

# "TU KÊR, EZ PENÊR"

**R. ZÎLAN**

Ev bû devî-devî sal û nîvekê, ku em çend heval ji kovara Berbangê re bûne redaksiyon û me karûbarên wê hildane ser milên xwe. Di vê dema çûyî de, kêm-zêde, tiştên ku ji me hatin xwastin û erk û wezîfeyên ku diva bû em pê rabin, me anîn cîh. Tiştên ku di vî warî de ji destên me dihatin der jî, me tê de çu dirîxî nekirin. Va ye îro kongreya Federasyonê ye, weke gişt organ û dezgehên Federasyonê em jî ji gelek rexneyan re armanc in. Divê em jê re armanc jî bin. Ev dongî û encamên her cure bizav û tevgerên civakî û siyasî yên demokratîk in. Jê rizgar bûn, divê çu caran nehête bîra mirovî. Ji ber vê yekê jî em bêî tirs û saw sîngên xwe didin ber tîrên rexneyan û xwe jê re bikin armanc.

Helbet divê ez bibêjim, ku ez bi xwe ne xwediyê wî mafî me ku bi navê hemû hevalên redaksiyona Berbangê bipeyîvim. Dîtinên wan bibêjim û di warê pirsên têvel de bîr û baweriyên wan berpêşî xwendevan û beşdarên kongreyê bikim. Lê ez her tiştî li ser navê xwe dibêjim û didim diyar kirin. Ji xwe biryar û pêşniyara komîteya kargêr ya Federasyonê jî di vê çarçovê de bû. Ango her hevalekî ku di organeke birêvebirinî û desteya redaksiyonê de wezîfedar e, dikare li ser karûbarên Federasyonê rexne û dîtinên xwe di hejmara taybetî ya Berbangê de biweşîne. Ji lewre, heke di rexne û dîtinên min de tiştên ku ji aliyê hevalên desteya redaksiyonê ve bihêne parvekirinê hebin jî, ew bi tenê min eleqeder dikin.

Herwekî me li jorê jî got, di vê sal û nîvê de, tiştên ku di karîn û şiyana me de bûn, em pê rabûn. Di gel vê çendê jî, ez bi xwe di tiştên kirî de gelek kêmasî û çewtiyan dibînim. Îro, sebeb çi dibin bila bibin, divê em li wan kir û kêmasiyên xwe mukir bihên. Rexneyên sûdbexş û qencîxwaz yên ku di van waran de li me bihêne girtin, bi ser ser û çavan qebûl bikin. Ji rastiyê revîn û ew nedîtin, mirov çu caran nagihîne cîh û deverekê... Ji ber vê yekê, ez bi xwe wan kêmasî, şaşî û çewtiyan qebûl dikim û rexne li xwe digirim. Bi taybetî ji wan heval û dostên ku bi nivîsarên xwe ve alîkariya me kirine, lê sed heyf û mixa bin ku nikarîbûne wan nivîsarên xwe bêî şaşî û çewtî di Berbangê de bibînin, ji wan yek bi yek hêvî dikim ku vê kêmasiya me bidin bin lingên xwe. Herweha ji xwendevanên kovara Berbangê jî, yên ku me gelek caran nivîsarên tijî bi şaşiyên nivîsînê û rastnivîsînî pêşkêşî wan kirine, doza lêborînê dikim...

Gelo ji ber çi ewçend kêmasî û şaşî bûn, sebeb û hoyên wan kêmasî û çewtiyan çi bûn? Gelo keysa rê li wan girtinê tune bû?

Bi a min, sistiyên rêxistinî, pûtepênedan û kêmbiha dîtina Berbangê û pêwîstiyên rêkûpêkiya danûstandinên wê di gel xwendevanan, herweha pûtepênedan ji bo di waxta xwe de ragihandina agehî û nûçeyên karûbar û xebatên Federasyonê û yên komeleyên endam, sistiya otorîteya Federasyonê,weke kardêr,di ser karkerên xwe de, sebeb û hoyên herî girîng yên kêmasî û şaşiyan bûn.

Heye ku piştî xwendina van rêzên jorîn bihête gotin, ku ev bêbextî ye, yan jî buhtan e. Lê rastî tal e, ew çendî tal be jî divê mirov wê bibêje... Gelek ji wan sebeban, bê guman bi destûra Federasyonê û nemaze kesên ku ji bo komîteya kargêr ya Federasyonê dihên helbijartin ve girêdayî ne. Berî her tiştî, her kesê ku ji bo komîteya kargêr dihête helbijartin, heke rojê bi awayekî rêkûpêk çend saetên xwe nede karûbarên Federasyonê, erk û wezîfeyên xwe nehîne cîh û bi ser de jî wan biavêje ser hevalên din û ji wan re bike barê serbar, rêkûpêkiya rêxistinî namîne. Her tişt aloz dibe. Ev yek hate serê me. Hevalê ku ji karûbarên kovara Berbangê berpirsiyar bû, bûbû yekî çend serî. Nema dizanîbû xwe bike çend perçe û kerî da ku her perçekî xwe bi wezîfe û kar bi alîkî de bişîne. Heçi karûbarên Berbangê bûn, carina bi hefteyan jî dor nedihatê. Gelek caran materyal ji bo yek yan jî du hejmaran hazir bûne, lê ew di waxtê xwe de çap nebûne. Ew ancax piştî çend hefteyan ketine bin çapê. Xwendevan wilo zanibûye, ku ew ji zexeliya redaksiyonê bûye. Redaksiyonê derketina Berbangê bi derengî êxistiye. Lê di rastiyê de welê nebûye... Da ku em rewş û pergala Berbangê baştir bikin, divê em di vî warî de guhartineke destûrî bikin. Ango, "Endamê komîteya kargêr yê ku dibe berpirsiyarê Berbangê, divê bi tenê bi karûbarên kovarê ve bilî bibe. Nabe ku komîteya kargêr erk û wezîfene din bispêrê." Heke bi riya destûrê guhartineke holê bikeve bin qeyd û bendan, dê gelek pirsgirêkên Berbangê çareser bibin. Di rewşeke holê de, dê pirsên ku me li jorê behs kiribûn, ji binî de rabin.

Heçî pirsa çewtî û şaşiyên rastnivîsînî û nivîsînê ye, êdî ez bi xwe gelekî fedî dikim ku kad bikim. Ew hema hema di her hejmarê de bûne. Di hin hejmaran de ew gihane kêrteke gelekî berz û bilind. Wisan ku nivîsevan bi xwe ji nivîsara xwe tiştek fêm nekiriye. Ewî bi xwe nema zanibûye ku çi nivîsiye. Helbet divê em bibêjin ku me, weke redaksiyon, nivîsarên ku me biryara çapkirinê li ser dane, ji aliyê ziman de rast kirine. Lê hingî ji me hatiye, me bi zimanê nivîsevan nelîstiye. Di vî warî de gelek ji wan kêfxweş jî bûne. Lê kesin jî hebûne, ku ji ber zimandirêjiya xwe nikarîbûne her tiştê ku nivîsîne di rûpelên Berbangê de biweşînin, em bi "zimannezan"-iyê ve îtham kirine. Bi ser de jî, bêî ku sebeba rastî ya tûrebûna xwe bibêjin, hêrsketina xwe li ser rastkirina zimanê nivîsarên xwe nîşan dane. Di warê nivîsînê de tiştên tewşo-mewşo gotine. Çêla riya Bedirxanan kirine. Hem jî bêî ku wê riyê bizanibin...

Lê divê hûn jî bizanibin ku çi hatine serên me. Me ne bes şaşiyên nivîsevanan rast kirine. Herwisa şaşiyên nivîsînê jî. Çewtnivîsîna nivîsaran hertim ji me re bûye serêşiya herî mezin û 'eyba herî giran. Ecêba girantir ew bûye, ku tiştên me rast kirine, careke din, lê vê carê ji ya berê xerabtir, şaş hatine nivîsîn.

Niha teknîka nivîsîn û çapa Berbangê ji yên berê gelekî pêşdetir e. Her tiştên wê gelekî moderntir û nûjentir bûne. Wisan ku mirov nikare wê bide ber ya berî niha bi du salan. Lê, heçî berhemên vê modernîzmê ne, gelekî xerab û naşirîn in. Kadroyên teknîkî yên Federasyonê nikarin ji heq derkevin. Ew di vî warî de gelekî qels in. Bi taybetî ji aliyê bi datayê nivîsînê de. Divê ev pirs bihête çareser kirin, yan na dê Berbang nikaribe xwe ji rexneyan rizgar bike.

Li milekî din jî, divê em li vir bibêjin, ku me ji tu kesî alîkarî nedît. Weke ku ji me tole û heyf bihête hildan, kesî destên alîkarî û dostaniyê nedan me. Heta berî niha çend mehan, çu kesî ji kovara Berbangê re nenivîsiye. Kesên ku berê ji Berbangê re dinivîsîn, weke ku boykotek hebe, bi yekdestî û bi hevpeymanî kovar ji nivîsarên xwe bêpar kirin. Çire??? Gelo endamên komeleyên Federasyonê bersiva vê pirsê hîç meraq nakin?...

www.arsivakurd.org

# Ber bi kongra 8-em

**Hanefî Celeplî**

**Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê ku di van rojên pêşiya me de wê kongra xwe ya 8-em pêk bîne, rêxistineke netewî û demokratîk e û ji bo halkirina pirsên civakî û çandî yên kurdên li Swêdê dixebite. Herweha ew ji bo başbûna rewşa li Kurdistanê hewl dide.**

Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê ji pêwîstiyên kurdên di civata Swêdê de dijîn, pêkhat. Di salên 70-î, herçend 4-5 hezar kurd li Swêdê dijîn û gelek astengên wan yên civakî û çandî hebûn jî, federasyoneke kurdî li Swêdê tunebû. Sedemê vê yekê grêdayê rewşa kurdên li Swêdê û rewşa siyasî ya li Kurdistanê bû. Di nav hêzên Kurdistanê de hevkarî tunebû; wê rewşê tesîrê kurdên siyasî yên li Swêdê jî dikir.

Lê gava ku pêwîstiya kurdan bi federasyonekê xwe xurtir nîşan da, di sala 1979-an de munaqaşa vê yekê jî destpêkir û di sala 1980-î de înîsyatîvek ji aliyê komelên kurd de hate girtin, lê biserneket.

Sedema vê yekê wek me got rewşa li Kurdistanê bû. Komelên ku li Swêdê (Stokholmê) hebûn, her yek ser bi siyaseteki bû. Yekî tehemul nedikir ku yekî din bibe serokê Federasyonê. Yekî nedigot ku xêra gelê me ev e ku em hevûdu qebûl bikin û ji hevûdu re hurmet bikin. Gazinên Ehmedê Xanî, qet nebe em, îro, piştî çend sed salan bi cîh bînin.

Li dawî pêwîstiyên objektîv li hember astengên subjektîv biserket û Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê di sala 1981-an de hate damezrandin. Ji xwe ev yeka prensîpeke diyalektîkê ye ku heta mirov li ser vê stêrê hebin, ev prênsîp jî wê hebe. Lê di vir de rola me wek unsûrê însan gelekî girîng e. Em dikarin bi tewr û tevgera xwe prosêsa pêşveçûnê bi lez bikin an jî giran bikin. Divê em, bi taybetî jî emên ku ji xwe re dibêjin sosyalîst, komûnîst û pêşverû di vî warî de bi mesûliyeta xwe agehdar bin. Yanê divê em rewşa xwe baş tahlîl bikin, pêşeroja xwe bibînin û li gor wê yekê bîryaran bigrin û ji bo bicîhanîna wan bîryaran jî xebat bikin. Tucar nabe ku em him ji xwe re bêjin sosyalîst û komûnîst û him ji bo çareyên ji derdê xwe re bêjin; ev çareke baş e, îdeal e, lê rewş rê nade û xwe bidin alîkî. Wazîfa sosyalîst û komûnîstan ev e, ku çareyê baş keşf bikin, di nav xelqê de propaganda wê bikin û ji bo bicîhanîna wê jî di refên pêşiyê de bê westan kar bikin.

Belê, federasyoneke kurd di sala 1981-an de hate damezrandin. Li gel gelek kêmasiyan hin xebatên hêja jî kir. Lê pir neçû astengên ku di destpêkê de hebûn cardin xwe nîşan dan û Federasyon kete rewşeke weha ku hebûn û tunebûna wê ne diyar bû. Di kongreyên wê de hilweşandina wê dihate rojevê.

Di sala 1985-an de ev komeleyên ku Federasyon pêkanîbûn, bîryara xwe dan ku avayiya Federasyonê biguhêrin. Li gor avayiya nûh divabû kurdên ku di belediyên têvel yên Swêdê de dijîn, ji xwe re komelan sazbikin, hemû kurdên welatparêz di van komelan de cîh bigrin û ev komele jî tenê bi pirsên civakî û çandî yên kurdan mijûl bibin û rewşa Kurdistanê bi bîrûraya giştî bidin nasandin û piştgiriya hêzên demokrat û pêşverû ji bo tevgera rizgarîxwaz li Kurdistanê bigrin.

Ev bîryareke rast û di cîh de bû. Xebatên ku Federasyonê piştî guhartina avayiya xwe kirine, nîşan didin ku ev modela, ne modeleke "utopîk" bûye, şertên wê zûde hatiye; lê hewldan pêwîst bûye. Ji ber ku ji me kurdan re li ser esasê netewetî rêxistinîbûn divê. Bi taybetî jî di warê demokratîk de li gor xetên siyasî rêxistinî bûn, tu feyde nagîhîne gelê meyê bindest. Ew avayî rêxistinîbûn tenê qeweta me perçe dike.

Îro ji ber zor û zilma dagîrkerên Kurdistanê bi sedhezaran kurd ji Kurdistanê dûr ketine û li welatên Evropayê û yên din dijîn. Gava em dibêjin, em kurd in û kurd netewek in; ma ne pêwîst e ku em li gor esasê netewetiyê xwe rêxistinî bikin? Yanê, kurdên ku ji çar perçên Kurdistanê hatine welatên Evropayê û li bajarên Evropayê bi hevre dijîn, bên cem hevudu û pirsên xwe bi hevre hal bikin, çanda xwe ya bindest bi hevre geş bikin, zaravayên hev fem bikin; ya herî girîng, nîşanê cîhanê bidin ku herçend dijmin welatê me perçe kiribe jî, em netewekin û vaye em yekin û ji bo ku welatê xwe rizgar bikin, em bi hevre kar dikin. Bêgoman tu kes nikare bêje, ku ev reng xebat ne baş e. Gelek dibêjin, ev reng xebat baş e, lê zehmet e. Rast e, zehmet e; lê belê xebat ji bo karê zehmet divê. Ji karê rehet re xebateke xurt ne pêwîst e.

Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê, piştî guhartina avayiya xwe di vî warî de gavên gelek mezin pêşde avêtin. Di rapora xebata Federasyonê ya sala 1987-an de -ku di vê hejmara Berbangê de tê weşandin- baş tê xuya kirin ku Federasyon êdî bûye sazûmaneke kurdiye netewî û demokratîk.

www.arsivakurdi.org

## Avayiya Federasyonê

Îro di bin baskên Federasyonê de ji herçar perçên Kurdistanê, ji Anadoliyê û ji Lubnanê nêzîkî çar hezar kurd civiyane. 24 komelên Federasyonê di 22 belediyên Swêdê de hene. Ji bakûrê Swêdê, bajarê Umeåyê bigir, heta başûrê Swêdê, bajarê Lundê (2000 km) kurdan xwe di bin baskên Federasyonê de rêxistinî kirine. Di gelek komelên Federasyonê de seksiyonên ciwanan -ku tenê bi karûbarê ciwanan mijûl dibin- hene û wan seksiyonan çend meh berê Yekîtiya Ciwanên Kurd Li Swêdê sazkirin. Dîsa di gelek komelên endam de seksiyonên jinan hene ku ew jî tenê bi pirsa jinên kurd mijûl dibin. Yek ji endamên Federasyonê, Komela Jinên Demokratên Kurdistanê ye. Çend komelên Federasyonê bi hevkariya kes û hêzên swêdî komîtayên piştgiriya Kurdistanê sazkirine û ji bo bîrûraya giştî ji rewşa Kurdistanê agehdar bikin, dixebitin.

Her komeleyê Federasyonê, di mintiqa xwe de bi pirsa kurdan yên civakî û çandî mijûl dibin. Ji bo pêşdebirin û nasandina çanda kurdî dixebitin. Ji bo zarok û ciwanên kurd xebat dikin. Alîkariya birayên xwe yên penaber ku nû tên bajarê wan, dikin. Tekîliyên wan bi maqaman re û bi rêxistinên civakî re başin. Ji bo nasandina rewşa Kurdistanê xebateke hêja dikin. Gava Federasyon aksiyoneke siyasî bike, ev aksiyon bi riya komelên endam li hemû Swêdê xwe nîşan dide. Ya herî baş jî ev e; kurmanc û soran û kelhur û lor û zaza, hemû kurdên ku ji mintiqeyên Kurdistanê cuda hatine Swêdê û zaravayên têvel yên kurdî qise dikin, di komelan de bi hevre dixebitin û zaravayên hevudu fêr dibin. Ev îmkaniyata ku dijmin li welatê me ji destê me girtiye, li Swêdê em bi kêfxweşî bikartînin.
Wek hemû rêxistinên biyanî û rêxistinên civakî yên Swêdê, Federasyona kurdan jî ji dewleta Swêdê li gor xebata xwe û li gor jimara endamên xwe alîkariya aborî digre. Herweha Komelên Federasyonê jî ji belediyên xwe alîkariyê digrin.

## Kêmasiyên Federasyonê

Îro li Swêdê dora 10 hezar kurd dijîn. Lê tenê nêzî çar hezar ji wan di bin baskên Federasyonê de civiyane. Bêgoman ev kêmasiyeke berbiçav e. Lê gava meriv behsa kêmasiyên Federasyonê bike, nabe ku ev yeka ji hebûna kurdên li Swêdê cûda bê fikirîn. Swêdê welatekî weha ye ku gelek rewşenbîrên kurd, siyasetvanên kurd têde civiyane. Bes jimara wan di nava Federasyonê de gelekî kême. Ev yeka kêmasiyeke mezine. Ji bo ku Federason ji ya îro xurtir bibe; karibe hemû kurdên li Swêdê di bin baskên xwe de bicivîne, pirsên wan hal bike, zarok û ciwanên kurd bi ruheke welatperwerî fêr bike û bigihîne da ku ew sibêhî xizmeta neteweyê xwe bikin, çanda kurdî pêş de bibe û bide nasandin, zimanê kurdî pêşde bibe, rewşa Kurdistanê bi bîrûraya giştî bide nasandin û piştgiriya hêzên pêşverû û demokrat bigre, divê siyasetvanên kurd û rewşênbîrên kurd di nav xebata Federasyonê de bi xurtî cîhê xwe bigrin.

Rola rewşenbîran di karûbarê civakî de gelekî mezin e. Xebata ku Federasyon îro dike, vaye li berçava ye. Heta îro rewşenbîrekî kurd nehatiye û negotiye; ev karê ku Federasyon dike ne baş e û ne pêwîst e. Wê gavê meriv pirs dike; gelo sedemê beşdarnebûna rewşenbîrên kurd di karê Federasyonê de çiye? Ma civandina kurdan li welatên Evropayê û alîkarîkirina wan ne karekî girîng û pêwîst e? Em dibînin, ku di komeleyên biyanî yên gelên din de, profesorên wan, zanayên wan bi hezkirin dixebitin. Dibe ku zanayên me, rewşenbîrên me karê komeleyetî piçûk dibînin? Eger em gelê xwe rêxistinî nekin, bi pirsên wan mijûl nebin, kî wê vê karê bike? Ma bê vê yekê em dikarin welatê xwe rizgar bikin? Hêvî ev e ku rewşenbîrên kurd li xeribiyê gelê xwe tenê nehêlin, wan rêxistinî bikin û piştgiriyeke xurt li dervayê welêt ji bo tevgera rizgarîxwaz pêkbînin.

Îro li Swêdê li dervayê Federasyonê gelek komelên ser bi siysetan hene. Di destûra hemûyan de jî dinivîse; temsîlkirina kurdan, alîkarîkirina wan di warê civakî û çandî de, piştgiriya Kurdistanê, fêrkirina zarokên kurd bi zimanê zikmakî, pêşdebirina ziman û çanda kurdî û hwd. Baş e, ma îro pêwîstî di civata Swêdê de ji bo van armancan bi komeleyên ser bi siyaset heye? Ewên ku bîryara guhartina avayiya Federasyonê dabû, ev komele bûn. Vaye, wek di rapora Federasyonê de diyare, kurd ji çar perçên Kurdistanê gîhane hev û bi hev re dixwazin derdê miletê xwe derman bikin. Ma eger em hemû wek bira ji bo eynî armancê kar bikin, ne baştire? Em hemû dibêjin yekîtî û gelê kurd jî li benda yekîtiyekê ye. Di warê demokratîk de jî tu sedem tune ne ku em nikaribin yekîtiyan pêk bînin. Yanê em hemû dixwazin ku zimanê kurdî pêşde biçe, çanda kurdî ya bindest geş bibe, zarokên kurdî bi zimanê xwe fêr bibin û piştgiryeke xurt ji bo tevgera rizgarîxwaz pêk bê. Wê çaxê emê çima di warê demokratîk de xwe cuda rêxistinî bikin? Pir vekiriye ku feda miletê kurd di bi hevre rêxistinîbûnê de ye.

## Hêviyên pêşerojê

Xebatên Federasyonê yên du salên dawî nîşan dide ku kurd amedene ku bi hevre karbikin. Ji bo ku ev xebat xurtir bibe, divê siyasetvan û rewşenbîrên kurd di xebata civakî û demokratîk de amede bibin. Divê em hewl bidin ku li dervayê welêt sazûmanên netewî pêk bînin.
Wek nimûne; divê rêxistineke giştî yên civanên kurd hebe, rêxistineke giştî yên xwendevanên kurd hebe, rêxistineke giştî ji bo jinên kurd hebe, programeke netewî ji bo zarokên kurd pêk bê, yekîtiyeke nivîskarên kurd divê, zanayên kurd divê zanistiya xwe ji bo neteweyê xwe rêxistinî bikin, hunermendên kurd divê bi riya rêxistiniyê hunera kurdî pêşde bibin... Van daxwazan meriv dikare dirêj bike; lê bi kurtî meriv dikare bêje di her warê civatê de divê em kurd xwe rêxistinî bikin. Bê vê yekê em nikarin bighên doz û daxwazê.
Îro li welatên Evropayê nîv mîlyon kurd dijîn. Eger em karibin ji %10-î wan rêxistinî bikin, ev qewata dikare şoreşa li Kurdistanê ji her aliyê ve fînanse bike.
Hêvî ev e, ku Federasyon di xebata xwe ya pêşerojê de li ser van pirsan bêtir û xurtir bisekine. Serketin ji bo kongra 8-em.

www.arsivakurd.org

# Federasyon rêxistina hemû kurdan e

**Keya Îzol**

Paş avabûna Federasyonê heta îro nêzîkî 9 sal derbas bûn. Di nav van 9 salan de gelek bûyer derbas bûn. Hin ji van, bûyerên negatîf bû ku pir caran di warê pêşveçûna xebata Federsayonê de rolên xwe yên nebaş lîst. Carna nezanî ku bingehên van temayulan pêk dihanî, di pêşiya pêşveçûna sazûmanbûna Federasyonê de bû astengên mezin. Lê îro ne pêwîst te ku em behsa guftiguhên rabûrdî bikin. Herçend zirar û nebaşiyên wan temayulan li ser me hemûyan tesîreke xirab berda be jî, ev ji bo me gelekan bûn dersên (tecrûbên) bingehîn. Îro rewş hatiye guhartin. Hem ji aliyê wan temayulên ku li jor tê behskirin, hem jî ji aliyê rûniştîbûna Federasyonê ve. Êdî, tu kes yan tu temayûl nikare pêşiya sazûmanbûna Federasyonê bigrin. Ji ber ku, her kurdekî li Swêdê cîwar, kêm zêde xwe paydarê xebatên Federasyonê dizanin. Ew, xwestin û daxwazên xwe, çi di Berbangê de be, çi di organên Federasyonê de be, û çi ji derva be, diyar dikin. Dixwazin tesîr li ser xebatê bikin û xwedî li Federasyonê derdikevin. Ji xwe, sazûmanbûn, di vê manayê de girîng e. Ku hemû Kurd vê rêxistina me ya demokratîk ku di eynê dem de ji bo hemû mirovên Kurd ji her perçên Kurdistanê, herweha ji her babet bîr û baweriyên têvel re bûye platformeke giştî. Ev tenê bi serê xwe, ji bo me kurdan qezenciyeke gelekî girîng e.

Îro rewşa Federasyonê çi ye? Çawa em dikarin vê xebata hêja û pêwîst hîn baştir bikin? Ez bawer im pirsên girîng ku di rojevê de ye, ew in.

Jî bo ku em baştirîn bikaribin bersivên van pirsan bidin, divê em li xebatên ku heta îro çêbûne, binêrîn. Nemaze di salên dawî de.

Ez bawer im gelek caran rêxistinek wek Federasyon, ku bi hemû aliyan ve temsîlê hemû kurdên Swêdê dike, li hember mercîyên Swêdiyan bûye zimanê hemû Kurdan, di bin barekî giran de ye jî. Herçiqas Federasyon wek rêxistin bi fonksiyonekî siyasî nikaribe ji bin van baran rabe jî, carna mecbûr dimîne rolekî wisa jî hilgire li ser milên xwe. Sebebên vê yekê helbet gelek in. Lê îro li Swêdê ev rastiyek e, ku Federasyon carnan mecbûr dimîne ku ji aliyê temsîl ve rolekî siyasî bilîze. Ez bi xwe ku ji destpêk heta îro di nav xebatên Federasyonê de beşdar û ji nêzîk ve naskirî me, dibînim ku ev rola Federasyonê her diçe xurtir dibe, ji xwe re bingeh çêdike. Ev ne tenê sala dawiyê yan ji çend salên dawiyê weha bû, lê belê, heta îro, heta hîn ji destpêkê ve weha bû.

Helbet ev yeka, aliyên xwe yên positîf û negatîfê di nav xwe de diparêze. Kesek yan jî hêzek ne berpirsiyarê vê yekê ye. Ji bo vê yekê em nikarin di vî warî de, rexne ji bo kesî bînin. Ev, ji xususiyeta rewşa gelê Kurd tê. Divê em hewl bidin ku ev pirsgirêka di pêşeroj de zêdetir zelal bibe, sînorên xebata Federasyonê ji bo me hemûyan baştir vekirî û dîyar bibe.

Gava em bi tevayî li xebata Federasyonê dinêrin, em dikarin bi hêsanî bibêjin ku her rojên ku diçin, xebat baştir dimeşe, Federasyon ber bi fonksiyonên xwe yên esasî gavên di cî de diavêje, sînorên karûbar her diçe hîn zelaltir dibe. Ev ji bo me mizgîneke baş e. Lê, Federasyon li gor salên pêşiyê di van waran de hêztir xwanê bike jî, em tu car ji bîr nekin ku em hîn di destpêkê de ne. Îro ne mumkîn e ku em Federasyonê wek rêxistineke sedî sed rûniştî, sazûmanbûyî, ji her aliyan ve têkûz, bidin nasandin. Hîn gelek kêmasiyên wê hene û divê em hemû bi hev re van kêmasiyan çareser bikin, helbet li gor destûr û prensîbên Federasyonê ku heta îro ji me bûye rêber.

## Bi dîtina min îro van kêmasîyên jêrîn di rojevê de ne:

-Ji aliyê qadro ve, rewşa Federasyonê gelek xirab e. Di bin baskên Federasyonê de herçend gelek mirovên me yên jêhatî, pisbor û zana hebin jî, di warê karûbarên rojane de ji van hevalan baş îstîfade naye kirin. Îro çarçova xebatê ewçend fireh bûye ku bi kêmanî 7-10 kesên qadro divê xwe bidin ber van xebatan da ku bi hev re bikaribin ji bin vê barê derkevin. Xebata Federasyonê tenê bi çend kesan nameşe, gava weha be, mirovên me di bin van karên giran de tên pelçiqandin, carek din hew dixwazin xwe bidin ber kar. Herweha, encama xebatê ji aliyê kalîtê ve jî qelstir û tengtir dibe. Divê berpirsiyariya xebatên Federasyonê li ser gelek mirov û Komelan be ku, ji aliyê naverok û temsîl ve jî hîn baştir û firehtir bibe.

## -Ji aliyê endamên ku dikevin organên Federasyonê:

Heval û nunerên ku ji bo karûbarên salekî, di Komîta Kargêr, Komîta Giştî û Redaksiyona Berbangê de cî digrin û li Kongrê tên hilbijartin, divê biryarên xwe dabin ku bi rastî dê bikaribin di hemû karûbarên ku ji wan tê xwestin, de beşdar bibin û herweha di vî warî de wek qadro mirovên kêrhatî ne. Dîsan divê bizanibin ku, ev herçend berpirsiyariyeke girîng û hêja be jî, ji gelek alîyan ve xebateke giran e jî. Divê ji bo vê yekê hazir bin. Wekîdin, hersal hin heval dikevin organên Federasyonê, lê mixabin vatiniyên xwe nînin cî. Encama vê yekê, barê hin hevalên din zêdetir dike, em dîsa vedigerin ser "sîstema" xwe ya kevn, ku tenê çend heval di bi hemû karan de dimîne. Ev, rê nade ku qadroyên nû jî xwe bigînin û pêş de bikaribin alîkariya Federasyonê bikin.

Wekîdin, divê em hemû Kurdên li Swêdê cîwar, çi di organan de cî girtî, çi ne di organan de, bi xurtî xwedî li Federasyonê derkevin, hewl bidin da ku rêxistina me wek sazûmanekî modern, bibe malê hemû kesên Kurd li Swêdê.

www.arsivakurd.org

# Ba hemûman le çiwarçêwey Fidrasyon da bibîne qolêk

Hesenî Seyfî Qazî

Cêy sipas û pêzanîne ke kak Keya Îzol berpirsî govarî "BERBANG" daway le hemû endamanî komîtey giştî kirdiwe ke be boney nizîkbûnewey kongirey salaney Fidrasyon bîr û ray xoyan sebaret be kar û rêbazî em rêkxiraweye bihênne gorê. Ewa minîş le xwarewe be kurtî û be wirdî gelaley çend bocûnêk pêşkeş dekem û kurte pêşniyarêkiş le gel ew kurdaney ta êsta le derewey Fidrasyon mawenetewe dehênme gorê.

1- Fidrasyon le nêwan dû kongirey xoy da hengawî başî nawetewe û tiwanîwye jimareyekî zortir le kurdekan le çiywarçêwey komelekan da le dewrî xoy ko katewe. Le biwarî ferhengî û hunerî da le qeder tiwana û deretanî xoy karî kirdiwe (bo wêne pekhênanî korî honrawe xwêndinewê bo mamosta Şêrkoy Bêkes le çend şaran û rêkxistinî pêşbirkêy helperkêy kurdî). Fidrasyon le pêwendî le gel dezgay karbedest û destelatdarî cor be corî Siwêd le caran çalaktir biwe, û le pêwendî nêwkoyî kurdekan da tiwanîwye ta radeyek le çiwarçêwey tengeberî nawçeyi xoy derbaz ka û be giştî hengawî berew ewe nawe ke bibête qisewêj û niwênerî parêzerî maf û qazancî kurdekanî daniştûy Siwêd. Dîyare le hendê rûwewe Fidrasyon neytiwanîwe bew corey ke pêwîste helsûrê û erkî xoy raperênê, ewîş sebaret be meseley penaberan, barî komelayetî jinan û mindalanî Kurd lem wilate û herweha şêwey pêweçaran be hebûnî dû elfupîtke le zimanî kurdî da.

Bew hîwayey ke be dem seqamgîrbûnî Fidrasyonewe ew erkaneş berebere nişûryan lê bixurê û ziyadtir serinciyan bidrêtê.

2- Zurbey layengiran, endamanî ew rêkxirawaney ke xoyan ser be yek le rêkxirawe yan partiye siyasiyekanî Kurdîstan dadenên û le Siwêd hen bedaxewe ta êştaş bocûnêkî rûnyan le ser Fidrasyon niye û ew lêk girdbûneweye be bûnewerêkî cîwê le xoyan dadenên û be şêweyekî mîkanîkî le nêw xoyan û Fidrasyon da hêlkêşî deken be bocûn û tegeyştinî mîn Fidrasyon bo ewe damezrawe û kar deka ke bitiwanê kurdekanî daniştêy Siwêd bê leber çawgirtinî bestiranewe û nebestiranewey siyasî û şêwey bocûn û îdeolojî û fikrî yan le nêw xoy da ko katewe û maf û qazancî kurdekan le Siwêd biparêzê û bitiwanê barî jiyanî komelayetî û ferhengiyan lem wilate baştir bika.

Bûnî Fidrasyon û helkişan û dakişanî, cilonayetî hels û kewtî rastewxo be helûmercî çonyetî barî komelayetî û siyasî kurdistanewe girê nedrawe. Fidrasyon tenê detwanê û boy heye be şêweyekî narastewxo erk û webalî ser milî xoy le hast helûmerc û xebatî gelî Kurd le nêwxoy wilat raperênê. Bo wêne eger Fidrasyon deretanî hebê û gişt ew kurdaney lêy dezanin be dengiyewe bên boy delwê rêgay baştir bo ew mindalaney le Siwêd gewre debin û pêdegen bidozêtewe û yarmetiyan pêbika bo ewey rişe û bineçekey xoyan le bîr neken û le paşeroj da bibne sermayey fikrî û hêzî însanî pispor û lêzên bo Kurdistan.

3- Tecrûbey 13 salî rabirdû le erêpa nîşanî dawe le ber barî waqî Kurdistan wate dabeşkiranî wilatî kurdan û ew rastiyey ke her kertêkî gelî Kurd be ciwê xebatî siyasî yan nîzamî xoy berêwe deba, kobûnewey hemû kurdekan le ser binemay pilatformêkî siyasî muşterekî siyasî dest nada û her core îtilafêkî ke le nawber layengiran û rêkxirawekanî dû yan çend beşî Kurdistan bo karî "dêmokratî" pêk hatibê diway maweyek çet dekarî dekewê û eger zor xoşbîn bîn dekrê bilêyn her rêkxirawêk yan yek dû rekxirawî wa hebûn ke nêwî komele "dêmokratî" yekeyan parastibê û be görey kêş û qursaîyan ewanî dîkeyan be dûy bocûn û siyasetî xo da rakêşawe.

4- Le çiwarçêwey girdbûneweyekî wek Fidrasyon da ke îtilafekî siyasî niye, belkû erkî serekî leserkirdinewe û parastinî maf û qazancî hemû kurdekanî daniştûy Siwêde helî ewe heye hemû kurd cêybêtewe û parastinî maf û qazancî endaman û layengiranî rêkxirawe siyasyekanî kurdistanîşî wek însanî Kurdtêda reng bidatewe.

Ême eger êsta 15 qolman lêk halandibê û herrojeş qolman lêbêtewe bo ewey baskî dîke le yek bestîn, eger waqêbîn bîn le binçîneda demar û girêy qolman yeke û çendayetî bo niye, ewîş KURD bûnmane, nek kirmanc û soran û toran û êran. Lêreda be hîç kilûwecê mebest ewe niye ke çaw le barî waqî wilat dabipoşrê û xudaî nexwaste barî ciyawazî çinayetî û boçûnî dûr le yekî îdeolojî û lêkdanewey car car dij be yek û dijlehevî siyasî û şerî dujminî be riwalet ciyawaz bişardirêt ewe. Mebest kurt û kirmancî eweye: Le çiwarçêwey meydanêkî wek Fidrasyon da ke amancî alûgor kirdinî barî komelayetî û siyasî kurdistan niye û erkî berpa kirdinî şorişî komelayetî û siyasî leber dem da niye, helî eme heye helgiranî hemû core îdeolojîyek û layengiranî hemû rêkxirawekanî Kurdistan be bê rêzper û îstîsna cê bigrin tenya û tenya bew mercey lew rastiye têbigen ke le çiwarçêweyek da le gel kurdekanî dîke da kar deken ke ser be rêkxirawî wan niye belam be giştî belanî kemewe qazancî endamekanî xoyanî le wilatekî wek Siwêd da têda reng dedatewe. Rêkxirawe sîyasiye kurdiyekanî ke le Siwêd hen mafîxoyane çonî bebaş dezanin bo bergirî le mafî gelî kurd le nêw wilat yek bigrin, belam erkêkî dîkeşyan heye ewîş beşdarî çalakane le karî rêkxirawêk daye ke bo parastinî maf, qazanc û bedengewehatînî kurdekanî daniştûy Siwêd hewil deda. Ew base zorî be bereweye û Kurd kutenî ew hewîre zor aw deba, ke hîwadarim bibête dinederî bas û dime teqe lem bareyewe û ziyadtir çî bikrêtewe.

www.arsivakurd.org

# RAPORA XEBATA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊDÊ JI BO KONGRA 8-EM (13-14.2.1988)

## Civîna Komîta Giştî û Komîta Kargêr yên pêşîn

Komîta Giştî civîna xwe ya yekem di roja 21.2.1987-an de li dar xist. Di civînê de heval Hanefî Celeplî wek serokê Federasyonê hate hilbijartin û endamên Komîta Giştî pêşniyarên xwe yên ji bo programa xebatê ya Federasyonê û pîrozkirina cejna Newrozê pêşkêşî Komîta Kargêr kirin.

Komîta Karger jî civîna xwe ya yekem, di roja 21.2.1987 an de li dar xist. Di civînê de, vatini di nav Komîta Kargêr de hate parve kirin. Ji bo sekreterê Federasyonê û ji bo berpirsyariya Berbangê heval Keya Îzol, ji bo sekreterê malî yê Federasyonê heval Dîcle Kizil hatin hilbijartin.

Di civîna Komîta Kargêr ya duemîn de jî heval Cemîl wek sekreterê ciwanan û berpirsyarê têkîliya bi Komelên endam re hate hilbijartin. Heval Dr. Cimşîd Heyderî jî wek berpirsyarê Federasyonê ji bo semîneran hate hilbajartin. Her weha di civîna duemînde, ji serok, sekreter û sekreterê malî ya Federasyonê, sekreteriyatek hate damezrandin, ku karibin di karûbarê acîl de biryaran bidin.

## Berbang

Komîta Kargêr di civîna xwe ya 1 û 2 an de li ser karûbarên Berbangê û Redaksiyona Berbangê sekinî. Di civîna yekem de heval Keya ji bo berpirsiyariya kovarê hat hilbijartin. Biryar hat sendin ku Redaksiyon wek berê bimîne, lê heçî mecal hebe hevalekî din tevî Redaksiyona kevn bibe.

Redaksiyonê civîna xwe ya yekem di roja 21.3.1987-an de çêkir. Di civînê de Reşo Zîlan, Mihemed Bekir, J. Kurdo, Reşîd Simo, Keya Îzol û Hanefî Celeplî beşdar bûn. Li ser pirsên Berbangê û li ser firebûna redaksiyonê hat axaftin. Redaksiyon wek berê qebûl bû. Ji bo firehbûna wê vî gavê hevalên beşdar pêwistî nedîtin. Heval R. Zîlan bi pêşniyara hemû havalan wek serek redaktor hat hilbijartin.

Herweha endamê K. K. heval Cimşîd Heyderî jî bi pêşniyara K. G. piştî hejmara Berbangê ya 2/87 di redaksiyona Berbangê de cîh girt.

Redaksiyonê di civînên xwe yên pêşin de plana hemû hejmarên Berbangê ya salekî çêkir. Li gor vê yekê, hejmara yekem giranî da xebat û xeberên kongra 7-em. Hejmara duwemîn bi giranî li ser 1-ê Gulanê û Cejna Newrozê bû. Hejmara sêyemîn di destpêka havîna 1987-an de de derket û bi giranî li ser rewşa Kurdistana Başûr û Kampanya Alîkariyê ji bo Kurdistana Başûr bû. Herweha di vê hejmarê de hevpeyvînek bi wezîrê byaniyan Georg Andersson re hate belavkirin. Hejmara çaremîn di destpêka payîzê de derket û bi giranî li ser xelat girtina şairê kurd Şêrko Bêkes û li ser beşdariya Federasyonê di Festîvala Aştiyê ya Skandînavyayê bû. Bi dû vê hejmarê, dîsa bi biryara redaksiyonê hejmareke xas li ser xebat û jiyana zanayê hêja Îsmaîl Beşikçi derket. Hejmarên şeşemîn û heftemîn ku di dawiya 87-an de derketin, bi giştî li ser xebatên ku Federasyonê kiribûn bû: wek musabaqa sporê di nav zarok û ciwanên kurd de, semînera li ser kurdan li Eskilstunayê û meşa 12-yê îlonê. Piştî serê sala 1988-an hejmara yekem ku derket, bi giranî behsa dmezrandina Yekîtiya Ciwanên Kurd Li Swêdê û xebera musabaqa folklora kurdî li Stockholmê kir.

Heta kongra 8-em biryara redaksiyonê heye ku ku bi kêmanî 2 hejmarên din jî derbiçe. Yek ji van wê li ser 50 saliya serhildana Dersîmê bibe. Di ya dinê de jî wê rapora xebata Federasyonê ya salane û dîtinên endamên organên Federasyonê li ser rewşa Federasyonê bête weşandin.

www.arsivakurdi.org

Wek me li jor jî bahs kir, Berbang gelek caran di wextê xwe de derneket. Herweha ji aliyê rastnivîsîn û şaşiyên çapê ve jî hin caran bi kêmasî derketin. Em van kêmasiyên xwe bi awakî dilvekirî pêşkêşî kongra 8-em dikin û hêvî dikin ku Berbang piştî kongrê êdî ji van kêmasî û şaşiyên weha xwe xilas bike.

## Nameyeke spasî ji bo beşdarên Kongra 7-em

Piştî kongra 7-em, Komita Kargêr ji bo hemû mêvan û rêxistinên ku di kongrê de beşdar bûbûn, an jî brûsk şandibûn, nameke spasdariye şand.

## Karkerên nûh

Federasyonê, bi alîkariya aborî ji aliyê Komîta Kar ya Wîlayêtê (Länsarbetsnämnden) du karkerên nûh girtin. Ji % 90-î maaşê karkeran ji aliyê Komîta Kar ya Wîlayetê de wek alîkarî hate girtin. Ji % 10 ji aliyê Federasyonê hate dayin. Herweha heval Hanefî ji meha 9-an heta meha 12-an (sê meh) bi maaş kar kir. Maaşê heval Hanefî ji aliyê belediya Stokholmê de hate dayîn. Bi vê rengê endamê Komîta Kargêr heval Cimşîd jî di 20-î meha 9-an dest bi kar kir û ewê heta sê mehî din jî karê xwe bidomîne.

## Destûra Federasyonê

Destûra Federasyonê, tevî guhartinên kongra 7-em ji nûve hazir bû û bi herdu zaravayên kurdî, kurmanciya bakûr û kurmanciya başûr û bi zimanê swêdî wek broşûrek hate çapkirin. Bi vê awayê Federasyon cara yekemîn destûra xwe bi rêkûpêkî weşand. Ev destûr li hemû endamên organên Federasyonê û komelên endamên Federasyonê hate belavkirin.

# CIVÎNÊN BI MEQAMÊN SWÊDÊ RE.

## Civînek bi Komîta Rewşa Zarokan (Barnmiljörådet) re:

Di 26-ê Adarê de, Federasyonê bi (Barnmiljörådet) Komîta Rewşa zarokan re civînek çêkir. Di civînê de li ser rewşa zarokên Kurd agehdarî hate dayin û hate xwestin ku Barnmiljörådet bi zimanê Kurdî jî materyelên agahdariyê belav bike. Herweha li ser rewşa zarokên kurd di dibistanên Swêdê de hate sekinîn. Nunerên Barnmiljorådetê razîbûna xwe ji agahderiyên Federasyonê diyar kirin û dane kivşê wekî ewê li ser pirsa zarokên Kurd bisekinin.

Di civînê de serokê Federasyonê heval Hanefî û serokê Yekîtiya Mamosteyên Kurd heval Mustafa beşdar bûn.

## Civînek bi ABF re

Di 4-ê Adarêde, serok û sekreterê Federasyonê li gel berpirsyarên ABF-Stokholmê civînek çêkirin û di civînêde li ser hevkariya Federasyonê û komelên wê bi ABF ê re hate sekinin. Federasyonê broşûreke ABF-ê li ser xebata wê tercumeyî Kurdî kir. Dîsa hate axaftin wekî li bajarên Swêde Federason û ABF bi hevra li ser rewşa kurdan semîneran amade bikin. Piştî vê civînê çend carên din Federasyonê û ABF-ê li gel hev civîn çêkirin. Heval Dîcle û heval

Cemîl di civînan de beşdar bûn. Îro di nabeyna Federasyonê û ABF-ê de hevkariyeke xurt heye. Bo nimûne: Musabaqa Folklora Kurdî, di 20.12.1987-an de bi hevkariya Federasyonê û ABF-ê pêk hat.

## Çend civîn bi hukumeta Swêdê re

Sekreterê dewleta Swêdê, Jonas Widgren di Koma Netewa de kareke nuh girt û bi vê munasebetê civînek çêkir. Federasyona me jî hate dawet kirinê civînê. Ser navê Federasyonê, serokê Federasyonê destek gul û nameke spasiyê ji bo hevkeriya borî pêşkêş kir.

Di roja 7-ê Gulanê de, li ser vexwandina wezîrê Biyaniyan Georgê Andersson, Sekreteriyata Federasyonê û sekreterê pirsa ciwanan heval Cemîl di civînekê de beşdar bûn.

Civîn, berdewema civîna Federasyonê bi hukumetê re ya di roja 2.1.1987-an bû. Li ser rewşa kurdan li Swêde hate sekinîn. Hukumatê xwest bizanibe, ku kurd piştî spekulasyonên ku li ser wan bi girêdayî kuştina Olof Palme hatibû kirin, xwe çawa his dikin. Nunerên Federasyonê diyar kirin wekî, tirs û şika kurdan kêm be jî hatiye sekinandin. Niha rewşa kurda baştire ji demekê berê. Herweha di civînê de rewşa multeciyên kurda jî hate bahskirin.

Çawa tê zanîn, li Swêdê gelek grûpên penaber dijîn. Gava ku rewş li welatê grûpeke penaber tê guhartin û demokrasî vedigere wî welatî, hin penaber dixwazin vegerin welatê xwe. Di rewşeke weha de ji bo ku hukumeta Swêdê bikare alîkariya wan penaberan bike, lêkolînekê dike. Ji bo vê yekê hukumeta Swêdê bi rêxistinên biyaniyan re, grûp bi grûp, çend civîn çêkirin. Di civîna ku Federasyon tê de beşdar bû, serokê Federasyonê ev dîtin pêş de anîn.

* Di nav grûpa kurdan de du kategorî hene; karker û penaber.
* Îro ji bo kurdan vegera welêt, ji ber rewşa li Kurdistanê heyî, ne aktuel e.
* Eger hat, ku vegera kurdan aktuel bû, divê hukumet ji aliyê aborî de alîkariya ewên ku dixwazin vegerin, bike.
* Divê hukumet îmkanan amede bike da ku ewên dixwazin vegerin, berî vegera xwe fêrî pêşeyekî bibin.
* Divê hukumet îmkanan amede bike, da ku ewên vedigerin, bikarin bi hevkariya kargehên Swêdê di branşa xwe de "paketeke kargehsaziyê" bi xwe re bibin welatê xwe.
* Divê ewên ku vedigerin, mafê xwe yê teqawidiyê yê li Swêdê, li welatê xwe jî bin, bikarin werbigirin.
* Divê hukumeta Swêdê di platformên navnetewî de ji bo doza kurdî ya biheq li dijî rejîmên zordar û kolonyalîst gavên fireh biavêje. Bo nimûne, Swêd dikare ji bona serbestbûna zimanê kurdî însiyatîveke navnetewî bigire. Ev kar û daxwazeke konkret e û dê li cîhanê jî gelek piştevan bibîne.
* Divê hukumet ji bo kurdên ku li Swêdê dimînin lê venagerin welêt, hinek xizmetan pêşkêş bike; Bo nimûne, ji bo pêşdebirina ziman û çanda kurdî merkezekê saz bike.

Nûnerên hukumetê ev daxwazên me li ba xwe nivîsîn û diyar kirin, ku dê li ser wan rabiwestin. Di rojên pêş de divê Federasyon li ser vê pisê mijûl bibe.

## Civîna Nordiska Rådet (Meclîsa Skandînavya)

Di rojên 22-24-ê Nîsanê de, Nordiska Rådet li ser pirsa multeci û mûhaciran semînereke 3 rojî hazir kirin. Di civînê de Federasyon jî amade bû û tevî kar û

www.arsivakurdi.org

barê grûpî bû.
Di civîna ku gelek nunerên parlementên welatên Skandînavya û nunerên Koma Netevan amade bûbûn, serokê Federasyonê bi gelek kesan re têkîlî danî û bala wan li ser pirsa kurdî kişand.

## Civînek bi Komela Mudafa Medenî (Civilförsvar) re

Di roja 24-ê Adarê de, li bajarê Jönköpingê civînek li ser mudafa medenî (civilförsvar) bi rêxistinên biyanî re hate amade kirin. Li ser navê Federasyonê heval Şoreş Zîrek di civînêda amade bû. Babeta civînê li ser beşdarbûna biyaniyan di mudafa gelerî ya Swêdê de bû.

## Kar û barên înformasyonê

Piştî kongra 7-em, ji gelek cî û kesan daxwaz hat ku li ser kurdan informasyonê bigrin. Ji dehan kesan re înformasyon hate şandin. Li bajarên Stefantorp, Göteborg, Östersund, Söderhamn, Jönköping, Stokholm, Umeå, Linköping, ji dibistan û belediyanre dîa bild hatin şandin.

Di roja 28-ê Nisanê li bajarê Västeråsê, ji bo zarokên dibistanê du nunerên Federasyonê heval Dîcle û heval Hanefî li ser rewşa Kurdistanê informsyon dan.

Li Bajarê Stokholmê jî, di rojên 6.5.1987 û 3.11.1987-an de serokê Federasyonê ji bo karkerên Daîra Civakî (Sosyal Kontoret) roj û nîvekî li ser rewşa kurd û Kurdistanê ders da.

## Civîn bi komelên endam re

Komîta Kargêr piştî kongra 7-em sê civîn bi komeleyên endam re çêkir. Di civînan de, hemû komelan di derbarey karûbarên xwe informasyon dan bo Komota Kargêr. Herwisa Komîta Kargêr jî di derhaqa xebatên Federasyonê de informasyon dan komelan. Divabû ku di hundirê salekî de bi kêmanî pênc civîn bi komelan re bihata kirin. Lê ji ber tengasiya wext û aborî me karîbû sê civînan pêk bînin.



## 1 Gulan

Komelên endamên Federasyonê tevî endamên xwe ve îsal li bajarên ku tê de rûdinin, bi xurtî di meşên 1-ê Gulanê de beşdar bûn û bandrolên li dijî hukumaten dagîrker bilind kirin. Belavoka ku Federasyona me hazir kiribû bi hezaran li xelqê Swêdê hat belavkirinê.

Li bajarê Stockholmê jî Federasyon di meşa VPK de beşdar bû. VPK, rê da ku Federasyon di civîna 1-ê Gulanê de axaftinekê bike. Di axaftina Federasyonê de rewşa gelê Kurd û êrîşên dagîrkerên Kurdistanê hate bahskirin.Piştî axaftina Federasyonê Koma Govend dîlanên kurdî pêşanî bi hezaran beşdarên meşê kir.

## Meşa protestoyê li dijî Tirkiyê (7.3.1987)

Wek tê zanîn rejîma Turkiyê bi 30 Jêtên leşkerî ve, di roja 4.3.1987-an de êrîşeke giran bir ser Kurdistana Iraqê. 9 gundên kurdî bombebaran kirin. Ew êrîşa çaran bû di nav du salên dawî de. Li ser vê êrîşa Tirkiyê: Federasyona me belawokek bi

www.arsivakurdi.org



zimanê Swêdî eynî rojê de derxist û êrîşa hov protesto kir. Belavok seranserê Swêdê hat belav kirin. Ew belavok ji hemû rêxistinên siyasî û civakî û her weha jî hemû sefaretên ku li Swêdê de hene, hate şandin.

Di roja 7.3.1987-an de jî Federasyonê meşeke protestoyê li dij sefareta Tirkiye amade kir. Di meşê de gelek rêxistinên Kurdistanî û pêşverûyên Tirk, Ereb û Sûryanî beşdar bûn. Gelek rêxistinên siyasî û demokratîk binê teksta protestoyê îmza kirin.

Parlamenterê Partiya Karkerên Sosyal Demokrat Abukat Hans Göran Franck û parlementê Partiya Komunist ya Çep Oswald Söderqvist yek axiftin kirin. Paşê jî axaftinek serokê Federasyonê kir. Radyoya Swêdê di meşê de beşdar bû û bi serokê Federasyonê re hevpeyvîn çê kir. Roja dinê jî rojnameyên mezin yên Swêde Svenska Dagbladet û Dagens Nyheter qala meşê kirin cî dane axaftinên parlametan û berprsiyarê Federasyonê.

Di meşê protestoyê de 250 kes beşdar bûn. Li pêş sefareta Tirkiye tekstê protestoyê hat xwendin, slogan hatin avêtin û srûda millî Ey Reqîb hate xwendin.

Belavok dîsa ji aliya komelên endamên Federasyonê li bajarên Uppsala, Sundsvall, Söderhamn, Bollnas, Hudiksvall û Göteborgê hat zêdekirin û belavkirin.



## Sersala kuştina Olof Palme

Di 28-ê meha Sibatê de, ji bo bîranîna sersala kuştina Olof Palme, Partiya Sosyaldemokratan tevgereke mezin pêkanîn. Federasyonê bi nameyeke Kurdên Swêdê û komelên endam li ser vê bûyerê agahdar kir û xwest ku hemû kurd li bajarên xwe di meşan de amede bibin. Komîta Kargêrî Federasyonê bi nîvroyê li ser gora Palme de beşdar bû û çelengek bi navê Federasyonê danî.

Herwisa, li ser navê Federasyonê nameyekî bîranînê, ji bo malbata Palme, ji partiya Sosyaldemokratan û ji hûkûmeta Swêdê re hata şandin.

Di eynî rojê de gelek kurd jî di meşa bîranînê de cih girtin. Federasyonê li ser vî rojê belavokek ji bo weşanên giştî jî belav kir.

## Civînek bi Daîra mihaciran re (19-20.3.1987) (Civîna Stora referensgruppen)

Heval Keya li ser navê Federasyonê beşdarî civînê bû. Ev civîn bi destê SIV (Invandrarverk) çêdibe û salê carekî ye. Nûnerên hemû Federasyonên biyaniya di vî civîna de beşdar dibin.

Civîna îsal li ser bazara kar (arbetsmarknaden) bû. Temsîlkarên Arbetsförmedling, AMU, AMI, LO û her wisa ji Invandrarbyrå û Socialförvaltining jî nûner hebûn. Ji aliyê kardîtînê de rewşa biyaniyan hat muneqaşe kirin. Pêşniyaz û daxwazên rexistinên biyaniyan hat pêşkeşkirin. Herwisa li ser rewşên Federasyonên biyaniya hat sekinandin. Civîn 2 roj ajot.

## Federasyonê daxwaza radyoya kurdî kir

Li Swêdê, bi gelek zimanên biyanî weşanên radyo û televîzyonê hene. Li gor mezinbûna grûpên biyanî û rewşa wan, radyo û televîzyona Swêdê programan

www.arsivakurdi.org

diweşîne. Heta niha ji bo grûpa kurdan, herçendî ew yek ji grûpên mezin jî tê hesab kirin, tu weşan nehatine kirin.

Di roja 27-ê tebaxê de serok û sekreterê Federasyonê, heval Hanefî û heval Keya di gel berpirsiyarên radyo û televîzyonê civînek çêkirin û daxwaza grûpa kurdan ya programên radyo û televîzyonê bi zimanê kurdî kirin. Di civînê de bi dûrûdirêjahî li ser rewşa kurdan û pêwîstiya wan bi programên radyo û televîzyonê hate rawestin.

Di dawiya civînê de berpirsyarên radyo û televîzyonê diyar kirin, ku ew di vî warî de îqna bûn ku ji grûpa kurdan re hebûna programên kurdî di radyo û televîzyonê de pir girîng e. Lê ji ber sedemên teknîkî û rêxistinî nikarin berî serê salê biryar bidin. Herweha xwastin ku li dora serê salê Federasyon careke din bi wan re civînekê çê bike.

## Newroz




Cejna Newrozê îsal li gelek bajarên Swêdê hat pîroz kirin. Piraniya komelên endamên Federasyonê li bajarên xwe Newrozê pîroz kirin. Li Stockholm, Uppsala, Sundsvall, Bollnäs, Eskulstuna, Karlskoga, Söderhamn, Göteborg, Lund, Jönköping û li gelek bajarên din jî Newroz bi awakî tevayî hat pîroz kirin. Plankirina şeva Stockholmê piştî kongra 7-em destpêkiribû. Beriya Kongreyê Komîtekî Newrozê hatibû tesbît kirin. Lê li pey kongreyê du hevalên vî Komîtayê dest ji vatiniya xwe berdan. Lewra di bin berpirsyariya heval Keya komîteke nû ava bû. Komîta nû ji 7 kesan pêk hat û nunerên Komelên derûdora Stockholmê di vî komîtêyê de beşdar bûn.

Ji bo programa Stocholm û Uppsaleyê Ciwan Haco, Delal, Rênas, Koma Govend, Koma Jinan û Koma Alan Botan hat dawet kirin. Wekî din jî bi danistandina Federasyonê Koma Govend hat şandin bo Newrozên Karlskoga, Sundsvall, Söderhamn, Upsala, Eskilstuna, Bollnäs. Di şeva Newroza Stockholmê de nêzîkî 1000 kes beşdar bûn. Şev ji aliyê dûzen û programê bi rêkûpêk bû.

## Civîna Enstîtuta Kurd li Parîsê li ser zimanê kurdî

Instîtuta Kurd Li Parisê, di meha dawiya Nîsanê de konferansek li ser zîmanê kurdî û pirsên zîmanê kurdî pêk anî. Konferans li bajarê Katalonya, Barselonayê pêk hat. Ji bo vî civînê ji Berbangê nunerekî davetî civînê kiribûn. Redaksiyona Berbangê biryar da ku kak Reşo Zîlan li ser navê Berbangê di civînê de beşdar bibe. Xebata ku di civînê de hate kirin, di Berbangê de hate weşandin.

## Semînerek ji bo xebatkarên belediyan

Di rojên 8 û 9-ê cotmehê de, li bajarê Eskîlstunayê semînereke du rojî li ser pirsa kurdî û rewşa penaberên kurd bi hevkariya Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê, Daîra Mihaciran ya Dewletê û belediya Eskilstuna hate amede kirin.

Ji bihara 87-an, Federasyonê ji Daîra Mihaciran daxwaz kiribû ku bi hev re semînerekê li ser pirsa kurdî ji bo xebatkarên belediyên Swêdê amede bikin. Ji ber ku di van salên dawî de gelek penaberên kurd hatibûn Swêdê û di belediyên ku heta niha ji kurdan re ne nas bûn rûdiniştin. Federasyonê pêwîst dît ku xebatkarên van belediyan di derbarê pirsa kurdî de bibin xwedî agehdarî.

Daîra Mihaciran ev daxwaza Federasyonê di cîh de dît û xwestin ku belediyeke

Swêdê jî di amedekirina semînerê de beşdar bibe. Me bi hev re belediya Eskilstuna ji bo vî karê munasib dît û wan jî ev kara qebûl kirin. Ji bo amedekirina semînerê ji her alîkî bi kesekî re dan û standin çêbû û komîtek hate damezrandin û vê komîtê plankirina semînerê da ser milê xwe.

Piştî xebateke hêja ji aliyê komîtê de, semîner di rojên 8 û 9-ê cotmehê de li qesra Sundbyholmê, -avahiyek ji sedsala 16-an de maye- li Eskilstuna pêk hat. Di semînerê de 35 kes; nunerên 13 belediyan, hukumatê, Înstîtuta Materyalê Xwendinê ya Dewletê, Daîra Mihaciran û Federasyon beşdar bûn.

Roja yekemîn:
Rewşa rojane li Kurdistanê -ji aliyê Hanefî Celeplî, serokê Federasyonê.
Di vê xalê de li ser rewşa herçar perçên kurdistanê ya civakî, aborî û bi taybetî jî li ser rewşa siyasî -zor û zilma ku li ser xelkê kurd tê kirin hate sekinîn. Herweha zehmetiyên ku penaberên kurd dikişînin, gava ku ew mecbûr dimînin ji Kurdistanê derkevin, hate bahskirin.

Kurd di weşanên giştî ya Swêdê de -ji aliyê Alar Kuutmann, xebatkarê belediya Eskilstuna.
Di vê xalê de li ser spekulasyonên ku di weşanên giştî ya Swêdê de bi helkeftina kuştina Olof Palme li ser kurdan hatibû kirin, hate sekinîn. Hate diyarkirin ku neheqiyeke mezin li kurdan hate kirin.

Dîtina kurdan li dij spekulasyonên weşanên giştî -ji aliyê Emer Şêxmûs, lêkolînevanê kurd li Zanîngeha Stokholmê.
Di vê xalê de li ser tewra dewletên dagîrkerên Kurdistanê li hember kurdan, bi taybetî li dervayî welêt hate sekinîn. Erîşên ku van dewletan li hember kurdan kirine -kuştin û gef û gur- bi cîh û dem hate bahskirin. Herweha li ser tesîra spekulasyonên weşanên giştî yên ku bi girêdayî kuştina Olof Palme ve girêdayîneli ser kurdan, hate sekinîn.

Piştî van xalan, xebata grûpî çêbû. Babeta xebata grûpî ev bû: Di belediyan de mirov çi karî ji bo kurdan dikare bike? Di pênc grûpan de ev pirsa hate munaqeşekirin û bi dû re vê munaqaşa ha di civîna mezin de berdewam kir. Amedekirina rojên agehdariyê li ser pirsa kurdî di belediyan de yek ji xalên munaqaşeyê bû.

Hatina malbatên penaberan -ji aliyê Kauko Holopainen, xebatkarê Daîra mihaciran û Dîcle Kizil, sekreterê malî yê Federasyonê.
Li ser vê pirsê, berê Kauko Holopainên li ser karê bîrokratîk agahdarî da, wekî meriv çawa muracet dike ji bo anîna malbata xwe û qanûnên Swêdê di vî warî de çine û di praktîkê de çawa dixebite. Dûre Dicle Kizil li ser zehmetî û muşkuleyên ku malbatên penaberên kurd dikişînin, agahdarî da. Hate diyarkirin ku gelek caran malbatên kurd rîskên mezin didine berçavên xwe ji bo ku karibin ji welatê xwe derkevin.

Bi van babetan dawiya roja yekemîn hat. Li gor programa semînerê wê êvarê kultûra kurdî bihata pêşkêş kirin. Li ser vexwandina Federasyonê, dengbêjên kurd yên bi navûdeng, Şivan û Gulistan di xwarina êvarê de beşdar bûn û stranên kurdî pêşkêşî mêvanan kirin.

Roja duwemîn:
Xebatên ji bo zimanê kurdî li Swêdê -ji aliyê Sîv Nordell, nûnera Înstîtuta Materyalên Xwendinê ya Dewletê.
Di vê xalê de Sîv Nordell, behsa xizmetên ku ji aliyê dewleta Swêdê ve ji bo zimanê kurdî hatine kirin, kir. Herweha li ser giringiya pêşdebirina zimanê kurdî sekinî.

www.arsivakurdi.org

Rewşa zimanê kurdî li walêt, pirsa tercuman û mamosteyên kurd li Swêdê -ji aliyê Keya Îzol, sekreterê Federasyonê.

Di vê xalê de li ser zimanê kurdî û zaravayên wê, tesîra qedexebûna zimanê kurdî li Kurdistanê di pêşdeçûna zarokên kurd de, xwendina mamostetiyê ji bo kurdan li Swêdê û xebatên ku ji bo tercumanên kurd hatine kirin, hate bahskirin.

Jiyana rêxistiniya kurdan li Swêdê -ji aliyê Hanefî Celeplî.

Kurd kengî, ji ber çi sedeman û ji kîjan perçên Kurdistanê hatine Swêdê, xebata wan ya rêxistinî kengî destpêkiriye û di çi qonaxann re derbasbûye, Federasyona kurdî çi wextî sazbûye û çi karî dike? Li ser van babetan hate axaftin.

Xebata Komela Kulturî Kurdistanê Li Göteborgê -ji aliyê Xalit Salih.

Nûnerê komela Göteborg li ser karûbarê komelê agehdarî da. Li ser hevkariya komelê û belediya Göteborgê hate sekinîn.

Dîtina belediyekê li ser hevkariyê -ji aliyê Gudrun Molander, nunerê belediya Sundsvalê.

Di vê xalê de, li ser pêwîstî û girîngbûna hevkariya komelan û belediyan hate axaftin. Hate diyarkirin ku xebata komelan karê belediyan hesantir dike. Divê her belediyek bi xurtî alîkariya komelan bike. Bi van babetan jî dawiya semînerê hat. Di van du rojan de, beşdarên semînerê bi awakî aktîv munaqeşe kirin û di saeta dawî de razîbûna xwe diyarkirin. Di lokala semînerê de, pêşandanek jî ji destkerên kurdî û sûretên ji Kurdistanê hat raxistin.

Belediyên ku di semînerê de beşdarbûn, ev in: Bollnäs, Eskilstuna, Falköping, Huddinge, Karlstad, Katrineholm, Lindesberg, Linköping, Skövde, Sundsvall, Umeå, Västervik, û Östersund. Nunerên Komela Kulturî Kurdistan Li Göteborgê û Komela Kulturî Kurd Li Başûra Swêdê jî li ser vexwandina Federasyonê di semînerê de beşdarbûn.



## Di roja 12-ê Îlonê de cunta faşîst hate protesto kirin

Wek hersal, îsal jî Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê û hêzên demokrat û pêşverû yên Kurdistanê û Tirkiyê di roja 12.9.1987-an de hatina cunta faşîst ser hukum li Tirkiyê bi hev re protestokirin. Ji bo karûbarên praktîk komîtek hate damezrandin. Çend roj berî 12-ê îlonê afîş û belavok li bajarê Stockholmê hate belavkirin; rewşa gelê Kurd û gelê Tirk, êrîşên cunta faşîst li ser wan ji awira giştî ya Swêdê re hate eşkere kirin. Herweha broşurek jî hate çap kirin û ji rojname û hawîrên siyasî re hate şandin.

Roja 12-ê îlonê serê sibêhî, delegasyonek li ser navê rêxistinên ku protesto dikirin, çelengeke reş li ber deriyê balyozxana Tirkiyê ya li Stokholmê danîn. Bi nîvro, saet 12-an de jî bi sedan kesên demokrat û pêşverû li meydana Sergelstorgê li bajarê Stokholmê civiyan û bandrolên li sloganên li dijî cunta ve faşîst bilind kirin. Di civînê de axaftin li ser navê komîtê bi kurdî, tirkî û swêdî hate kirin. Herweha nunerê Partiya Çep ya Komûnîst (VPK), endamê komîta kargêr ya partiyê Birgitta Rundberg axaftinek kir û piştgiriya xwe bi gelê kurd û gelê tirk nîşan da.

Bi dû re, beşdarên civînê bandrolên protestoyê di destan de ber bi Kungsträdgårdenê meşiyan. Li Kungsträdgårdenê -parkeke li bajarê Stokholmê- programa kulturî li dijî cunta faşîst dest pê kir. Serokê Yekîtiya Nivîskarên Swêdê, Peter Curman û şairê kurd yê bi navûdeng, Şêrko Bêkes bi helbestên xwe ve piştgiriyên xwe bi gelên kurd û tirk nîşan dan û cunta faşîst protesto kirin. Sê stranbêjên swêdî bi navûdeng jî bi stranên xwe yên gelêrî ve piştgiriyên xwe nîşan

www.arsivakurdi.org



dan. Yek ji xalên programê jî folklora kurdî bû. Komên Govend û Şengalê jî bi dîlanên kurdî beşdarî civîna protestoyê bûn. Roja dinê rojnameyên swêdî di rûpelên xwe de cîh dan protestoya li dijî cunta faşîst li Tirkiyê. Di civîna protestoyê de li dor heftsed kes beşdar bûn.

Îsal, komelên endamên Federasyonê jî di bajarên xwe de cunta faşîst di roja 12-ê îlonê de protesto kirin. Federasyonê, berî 12-ê îlonê afîş û belavok hazir kirin û ji komeleyên xwe yên derveyî Stokholmê re şandin. Ew belavok û afîş li bajarên Sundsvall, Bollnäs, Alfta, Uppsala, Jönköping, Falköping, Trollhättan, Göteborg, Lund û Malmö bi giştî hatin belav kirin. Li bajarên Uppsala, Bollnäs, Göteborg û Malmöyê meşên protestoyê jî pêk hatin. Radyo û rojnameyên van bajaran cîh dan meşên protestoyê.

## Musabaqa sporê di nav zarok û ciwanan de

Federasyonê di roja 4.10.1987-an de, li bajarê Stokholmê musabaqayeke sporê di nav zarok û ciwanên kurd de li dar xist. Nêzîkî 150 zarok û ciwanên Kurd, ji heremên têvel yên Stockholmê beşdarî vê musabaqeyê bûn; di beşên fûtbol, pînpong, Volleybol û sporên serbest de hatin hember hev. Her weha hin dêûbavên kurd jî di vê rojê de wek temaşeger hatibûn musabaqê. Li Swêdê, ev cara pêşîn bû ku çalakiyeke weha ji bo zarok û ciwanên kurd amade dibû. Hemû zarok û ciwan ku di van musabaqan de beşdar bûbûn, madalya, kûpa yan ji diyariyeke din wergirtin. Piştî xilasbûna hemû musabaqeyan, hemû kesên beşdar daxwaziyên xwe yên ji bo xebatake weha diyar kirin û xwastin ku Federasyon çend çalakiyên weha di pêşerojê de amade bike.




## Hefta Dostaniyê

Di sala 1987-an de wezîrê biyaniyan Georg Andersson pêşniyarek ji hemû swêdî û biyaniyan re kir ku hefta 21-an (18-24 gulan) wek "Hefta Dostaniyê" bê pîroz kirin, ku dostanî û hevkarî di nabeyna swêdî û biyaniyan de xurtir bibe. Di vê heftê de swêdî û biyaniyan hevûdu vexwendin malên xwe û rêxistinên swêdî û biyaniyan jî bi vê helkeftinê gelek karûbarên kultûrî li dar xistin. Federasyona me jî di 21-ê gulanê de bi helkeftina "Hefta Dostanî" di navça Stokholmê de, li Sergelstorgê ji saet 17.00-an heta saet 19.00-an dîlanên kurdî pêşkêşî xelkê kirin. Koma Govend, Koma Şengal û Koma Komela Jinan bi dîlanên hêla Diyarbekrê, Vanê û Hekariyê bala bi hezaran kesan kişandin. Li ser navê Federasyonê bandroleke mezin bi nivîsa "Dostanî, Hevaltî, Piştgirî" bi zimanê swêdî û kurdî hate dalaqandin.

Ji bo sala 1988-an jî biryar hatiye girtin ku "Hefta Dostaniyê" bê li dar xistin. Ji bo vê karê ji niha de xebat tê kirin. Federasyona me jî di karûbarê amedekirinê de beşdar e. Ser navê Federasyonê heval Keya di civînan de beşdar dibe.

## Civîna Meclîsa Biyaniyan

Meclîsa Biyaniyan, di bin serokatiya wezîrê biyaniyan Georgê Andersson de, ji berpirsyarên federasyonên biyaniyan pêk tê. Di salekî de sê-çar caran dicive û li ser pirsên biyaniyan yên rojane disekine. Rêxistinên biyaniyan daxwaz û dîtinên xwe di van civînan de pêşkêşî hukûmeta Swêdê dike. Herweha hukûmeta Swêdê jî, dîtinên rêxistinên biyanî li ser polîtîka xwe ya biyaniyan digre. Carna jî, ew meclîs ji sê-çar salan carekî tevî rêxistin û meqamên Swêdê dicive û li ser pirsên girîng yên biyaniyan disekine.

www.arsivakurdi.org

Îsal di 22-23-ê gulanê de, Meclîsa Biyaniyan civîna xwe ya xebatê li bajarê wezîrê biyaniyan Georgê Andersson, Lycksele, bi 103 nûneran; nûnerên federasyonên biyanî, rêxistinên swêdî û meqamên Swêdê li dar xist. Civînê li ser ev her sê pirsên girîng munaqeşe kir.

Beşdarbûna biyaniyan di prosesa demokratîk de:

1- Meriv çawa dikare bi hevra berpirsyariyê bigre ji bo ku statuya pirsên biyaniyan bête bilind kirin? Hempayên diyar û nediyar.

2- Beşdarbûna biyaniyan di karûbarên belediyeyî û dewletî de çawa dikare fireh bibe? Hempayên diyar û nediyar.

3- Biyanî çawa dikarin di rêxistinên civakî de xwedî giranî bibin. Hempayên diyar û nediyar.

Pirsên nesla duhemîn:

1- Meriv çawa dikare şexsiyeta û rewşa ciwanên biyanî di civata Swêdê de bi hevkariya ciwanên swêdî xurtir bike.

2- Meriv çawa dikare îmkanên baştir bide ciwanên biyanî ku karibin bi hêsanî di bazara kar de kar bigrin.

3- Civata Swêdê çawa dikare ji îmkanên nesla duhemîn fêde bibîne; wekî ji tecrubeyên wan yên kultûrî û ji duzimanîbûna wan?

Pirsên teqawidên biyanî:

1- Di derbarê rewşa teqawidên biyanî em çi dizanin?

2- Meriv çawa dikare ku ji îmkanên teqawidên biyaniyan fêde bibîne?

3- Meriv çi dikare bike ku teqawidên biyanî ji tenêmayînê rizgar bike?

4- Meriv çawa dikare di warê nezanîna zimanê swêdî de alîkariya teqawidên biyanî bike?

5- Ji bo ku ferqa di nav neslan de bête rakirin, çi pêwîst e?

Munaqeşa her pirsekî bi axaftina nûnerên rêxistinên biyanî û meqamên Swêdê dest pê kir. Herweha her pirs di grûpên xebatêde hatin munaqeşe kirin û her grûpekî li ser pirsan pêşniyarên konkret di roja dawî de pêşkêşî civînê kirin.

Li ser navê Federasyonê, heval Hanefî û heval Cemîl beşdar bûn. Her weha heval Hanefî di komîta amedekirina civîne de jî cîh gitibû.




## Kampanya alîkariyê ji bo Kurdistana Başûr

Di destpêka meha hezîranê de, Federasyona Komelên Kurdistanê li Swedê, ji bo Kurdistana başûr dest bi "Kampanya Alikariyê" kir. Wek tê zanîn, ji 15-ê nîsanê û bi vir de, rijîma faşîst ya Îraqê li hember gelê Kurd li Kurdistana başûr dest bi bikaranîna çekên kimyayî kiriye. Bi dû vê pêşdehatinê bi hezaran mirovên kurd hatine kuştin û birîndar kirin. Komîta Kargêr ya Federasyonê ji van rastiyan hereket kir û biryara destpêkirina kampanyayê da:

Ji alîkî ve ev xebateke tabiî ye, ku diva bû Federasyon wê bîne cîh. Ji aliyekî din ve jî, divê Federasyon bi vî awayî bikaribe endamên xwe di xebatekî wisan girîng de aktîf seferber bike. Bi germî bikaribe rastiya rewşa gelê me hem di nav kurdan û hem jî di awira giştî ya cihanê de biparêze.

Hîn di destpêka kampanyê de ji hemû komelên endam yên li Swedê nûçeyên piştgirî û yarmetiyê hatin. Hemû komelên me yên endamên Federasyonê di heremên xwe de piştgiriya vê kampanyê, bi berhevkirina pere, kinc, kon, derman û hwd ve kirin. Herwisan dilxwazên Federasyonê wek kes jî alikariyên xwe yên berbiçav şandin.

www.arsivakurdi.org

Di destpêka kampanya alîkariyê de, komeleyên endamên Federasyonê yên li derûdorên bajarê Stockholmê, bi dirêjahiya hefteyekê li navça bajêr bi kompere alîkarî berhev kirin. Herweha di eynî rojan de nêzîkî 10.000 belavok jî li ser rewşa Kurdistanê hatin belav kirin.

Ji bilî vê, Federasyonê bi nameke resmî ve doza alîkariyê ji hemû rêxistinên civakî, siyasî û mirovperwer yên Swêdê kir. Ev name, ji nêzîkî 150 rêxistinên têvel re hat şandin. Herweha ev kampanya di Festîvala Aştiyê ya Îskandînavyayê de jî, ku di navbera rojên 24-28-ê meha hezîranê li Stockholmê hatibû li dar xistin, hat domandin.

Kampanya alîkariyê heta serê sala 1988-an hate domkirin. Di dawiya Kampanyayê de 10 hezar kilo kinc û 21.197 kron hate komkirin. Me ev alîkarî teslîmî komîta hevkariya rêxistinên Kurdistana Başûr kir. Lê pir mixabin, ji ber tunebûna rê, nunerên rêxistinên Kurdistana Başûr nikarîbûn kincên ku hatibûn komkirin bişînin Kurdistanê. Ev cil ji aliyê Komela Kurd li Sundsvallê hatibûn komkirinê.



## Festîvala aştî ya Îskandînavyayê

Di 24-28 ê meha Hezîranê de festîvaleke navnetewî ya aştiyê li bajarê Stockholmê pêk hat.

Federasyonê û endamê wê, Komela Kurd Li Stokholmê jî, wek gelek rêxistinên swêdî û biyanî, di vê festîvalê de beşdar bûn. Nêzîkî 200 rêxistinên têvel di haziriya vê festîvlê de kar hildabûn ser milên xwe. Herwisan zêdetirî 200 rêxistinên swêdî û biyaniyan jî ji bo propagande û xebatên rêxistinên xwe cîh girtibûn. Federasyona me jî di beşa navnetewî de konek danî. Di cîhê Federasyonê de xwarinên kurdî ji bo mêvanan hat pêşkêş kirin. Herweha ji bo nasandan û propagandakirina pirsa kurdî jî gelek xebatên piralî û hêja hatin kirin.

Festîvalê hem li ser rewşa niha ya Kurdistanê û hem jî li ser rewşa penaberên biyaniyan de debat li dar xistin. Di herdu panelan de jî li ser navê Federasyonê sekreterê Federasyonê heval K Îzol bîr û baweriyên Federasyonê ji bo guhdar û mêvanan dan diyar kirin. Di van panelan de gelek kesên swêdî û biyanî beşdar bûn û pirsiyarên xwe yên li ser pirsa kurdî ji nûnerê Federasyonê pirsîn.

Herwisan, li sê cîhên curbecur dîlanên kurdî ji mêvanên Festîvalê re hatin pêşkêş kirin. Grûpa folklorê ya Koma Komela Jinên Demokrat yên Kurdistanê û Koma Şengal bi dîlanên ji derûdora Diyarbekir û Hekariyê bala bi hezaran mêvanên ku hatibûn Festîvalê kişandin.

Di dawiya programa folklorê de tevî mêvanên beşdar govendên kurdî hatin girtin û bi hezaran kes bi awakî baldar temaşyî govendan kirin. Di festîvalê de ji bo kampanya alîkariya Kurdistana Başûr jî, ku nû dest pê kiribû, xebatine berbiçav hatin kirin

Ji serî heta dawiya festîvalê, endamên Komela Kurd Li Stokholmê bi xurtî di hemû karûbarên festîvalê de beşdar bûn.

## Semînerek ji aliyê zanaya hêja Joyce Blau

Havîna 1987-an kurdzana hêja Joyce Blau bi serdan hatibû Swêdê. Wê serîk da Federasyona me jî. Berpirsiyarên Federasyonê di derheqa karûbarên Federasyonê de enformasyon dan wê û herweha di derheqa kar û barên zanaya

www.arsivakurdi.org



hêja de jî jê agehdarî wergirtin.

Li ser daxwaza Federasyonê jî, di roja 18.07.1987-an de Joyce Blau semînerek amade kir. Babeta semînerê, zaravayê kurdî yê lûrî bû. Di semînerê de bi qasî 70 kesî beşdar bûn. Beşdarên semînerê li ser zaravayê lûrî gelek agehî û enformasyonên giranbiha wergirtin.

Joyce Blau axaftina xwe bi zimanê îngilîzî kir û kak Hesen Qazî jî axaftina wê wergerande kurdî.

## Festîvala Furuvîkê

Her havîn li bajarê Furuvîkê, "Festîvala Stranan" tê lidarxistin. Stranvanên bi navûdeng, ji hemû cîhanê tên tevî vê festîvalê dibin. Herweha neteweyên têvel bi stran û dîlanên xwe ve beşdarî festîvalê dibin. Kurdên li Swêdê cara pêşîn, par di Festîvala Furuvîkê de beşdarî kirin.

Îsal jî, wek par bi xebat û haziriya hêja ya Komela Kurd Li Bollnäsê kurdan beşdariya festîvalê kirin. Cîhê festîvalê de, komelê pêşandanek ji destkirên kurdî nîşan da. Xwarina kurdî jî di nav beşdarên festîvalê de hate belav kirin. Bi alîkariya Federasyonê jî Koma Govend, di festîvalê de beşdar bû û dîlanên kurdî pişanî mêvanan dan. Herweha Koma Zarokên kurd ji Bollnäsê jî dîlanên kurdî pêşanî mêvanan dan.



## Musabaqa Folklora Kurdî -Stockholm 1987

Di 20-ê Kanûna 1987-an de li Stokholmê Musabaqa Foklora Kurdî çêbû. Nêzî 1300 Kurd û Swêdî di vê şeva musabeqeyê de beşdar bûn.

Federsayonê sê-çar mehan haziriya vê musabeqê kir; di Berbangê de û her weha bi name û afîşan, da diyarkirin. 10 grûpên folklorê muracaatî Federasyonê kirin ku ewê beşdarî musabeqê bibin. Grûpên ku muracatî Federasyjonê Kiribûn ev in: Koma Komela Jinên Demokratên Kurdistanê, Koma Sîpan, Koma Dîlan, Koma Şengal, Koma Sulav, Koma Govend, Koma Henderan, Koma Ararat, Koma Zarokan ya Komela Kurd Li Bollnäsê, Koma Komela Kultûrî Kurdistan Li Göteborgê. Lê Koma Şengal, Koma Araratê û Koma Komela Göteborgê di musabaqê de nikarîbûn beşdar bibin.

Piştî ku musabeqeya folklorê hate diyarkirin, Federasyonê ji bo juriya musabeqeyê 7 kes helbijartin, ji van 7 kesen 2 Swêdî û 5 jî Kurd bûn. Di jurîyê de ev kes hebûn: Owe Ronström, Elvor Underdal, Mihemed, Ferhad, Bêrîvan, Nedîm, M. Lewendî. Piştî civîna xwe ya yekemîn jurîyê qaîdeyên musabeqeyê û yên puandayinê di nav xwe de tesbît kirin û bi nameyeke resmî ji hemû grûpan re şandin. Emer Şêxmûs jî taqdîmvaniya şevê girte ser milên xwe.

Ji bo sê komên folklorê xelat hate dayîn. Ji bo dereca yekemîn ku Koma Govendê girt; 5000 kron, ji bo dereca duwemîn ku Koma Dîlanê girt; 3000 kron û ji bo derca sêhemîn ku Koma Komela Jinên Demokratên Kurdistanê girtin; 1000 kron hate dayîn. Herweha Koma Zarokan ya Komela Kurd Li Bollnäsê xelata juriyê; qupayek girt. Hemû komên din jî ji bo ku di musabaqê de beşdar bûne, yek qupa girtin. Hozanên kurd Şivan û Gulistan jî di şevê de bi stranên kurdî beşdar bûn.

www.arsivakurdi.org

## KOMELÊN ENDAM YÊN NÛ PIŞTÎ KONGRA 7-EM

Komîta Kargêr di civîna xwe ya duwemîn de li ser pirsa komelên nû dûrûdirêj sekinî. Hate kivşkirin ku di gelek belediyên Swêdê de penaberên kurd dijîn, lê ne xwediyê komelekî ne, an jî komelek sazkirine, lê ne endamê Federasyonê ne. Pêwîst bû ku bi penaberên kurd re di belediyên têvel yên Swêdê de têkîlî bête danîn û ji bo wan komele bên sazkirin. Herweha ew komelên ku hîn nebûbûn endamê Federasyonê, pêre têkîlî bihata danîn da ku bibin endamê Federasyonê.

Ji bo vî karê Komîta Kargêr heval Cemîl wek berpirsyarê danûstandina bi komelan re hilbijart.

### Komela Kultûrî Kurdistan li Jönköpingê

Di roja 5.4.1987-an de kongra xwe li darxistin. Li ser navê Federasyonê heval Cemîl, heval Wirya û heval Fuad beşdarbûn. Di kongrê de biryar bi temamê dengan hate girtin ku Komela Kultûrî Kurd Li Jönköpingê bibe endamê Federasyonê.

### Komela Kultûrî Kurd Li Xwarû Swêdê -Lund

Li ser navê Federasyonê, heval Cimşîd, heval Fuad û heval Wirya di kongra komelê de beşdarbûn. Kongrê bi temamê dengan biryar da ku Komela Kultûrî Kurd Li Xarû Swêdê bibe endamê Federasyonê.

### Komela Kultûrî Kurdistan Li Trollhättan

Di roja 7.6.1987-an de heval Hanefî, heval Fuad û heval Wirya beşdarê civîna Komelê bûn û civînê bi temamê dengan biryar da ku Komela Kultûrî Kurdistan Li Trollhättanê bibe endamê Federasyonê.

### Komela Kultûrî Kurd Li Falköpingê

Li ser navê Federasyonê di roja 30.9.1987-an heval Hemîd Berzan beşdarî civîna Komelê kir. Civînê bi temamê dengan biryar dan ku Komela Kurd Li Falkäpingê bibe endamê Federasyonê.

### Komela Kurd Li Alfta

Alfta belediyeke Swêdê nêzîkî bajarê Bollnäs e. Berê kurdên ku li Alftayê rûdinin, endamên Komela Kurd Li Bollnäsê bûn. Di civîna Komela Kurd Li Bollnäsê di meha 6-em 1987-an de ku heval Dicle li ser navê Federasyonê beşdar bû, hemû endamên komelê biryar girtin ku kurdên ku li Alftayê rûdinin, ji xwe re komelekî nû saz bikin. Di roja 27.6.1987-an de Komela Kurd Li Alftayê saz bû û kongrê biryar da ku Komele bibe Endamê Federasyonê. Di civîna Komîta Kargêrî Federasyonê ya di roja 24.10.1987-an de muracata Komela Kurd Li Alftayê ji bo endametiya Federasyonê hate qebûl kirin.

### Komela Kurd Li Örebroyê

Di roja 11.8.1987-an de heval Cemîl li ser navê Federasyonê di Kongra Komelê de beşdar bû. Kongrê bi hemû endamên xwe ve biryar girt ku bibe endamê Federasyonê.

www.arsivakurdi.org

## Komela Kurd Li Eskilstuna

Di roja 19.12.1987-an de heval Hanefî li ser navê Federasyonê di kongra Komelê de beşdar bû. Kongrê bi temamê endamên xwe ve biryar dan ku bibin endamê Federasyonê.

## Komela Kurd Li Östersundê, Komela Kurd Li Vesteråsê û Komela Demokrat a Kurd Li Umeåyê

Di civîna xwe ya di ya di roja 17.10.1987-an de Komîta Giştî vatinî da heval Hesen Qazî ku li çend bajarên Swêdê de têkilî li gel komelên kurd dayne û agehdarî li ser Federasyonê bide da ku ew komelên ku ne endamê Federasyonê ne, bibin endamê Federasyonê.

Heval Hesen li bajarên Vesteråsê, Östersundê û Umeåyê li gel komelên kurd civîn çêkirin û li ser Federasyonê agehdarî dan. Hersê komelan jî; Komela Kurd Li Vesteråsê, Komela Kurd Li Östersundê û Komela Demokrat a Kurd Li Umeåyê biryar dan ku bibin endamê Federasyonê.

## Komela Kurd Li Norrköpingê

Di meha hezîranê de heval Dîcle di civîna Komela Kurd Li Norrköpingê de beşdar bû. Lê civînê biryar da ku nebin endamê Federasyonê. Piştî serê salê Komelê li gel Federasyonê kontakt danî û diyar kirin ku ew amedene ku bibin endamê Federasyonê. Komîta Giştî di civîna xwe ya dawî de biryar da ku Komela Kurd Li Norrköpingê bibe endamê Federasyonê.

Bi vê awayê piştî kongra 7-em yanzde komelên nû bûn endamê Federasyonê.

## Civînek bi Koma Nivîskarên Swêdê re

Di roja 29.9.1987-an de Federasyonê civînek li gel Koma nivîskarên Swêdê çêkir. Di civînê de nûnerên Federasyonê ji Koma Nivîskaran xwestin wekî ew înîsyatîveke navnetewî ji bo serbestbûna zimanê kurdî bigrin. Rewşa kurdan li herçar perşên Kurdistanê hate îzah kirin.

Herweha Federasyonê li ser rewşa zanayê hêja Îsmaîl Beşikçi malûmat dan nûnerên koma nivîskaran. Hate xwestin ku ew alaqayekê nêzîk nîşanê Îsmaîl Beşikçi bidin.

Nunerên Koma Nivîskaran bi balkêşî guhdariya daxwazên Federasyonê kirin û diyar kirin ku ewê vê pirsê bi rêxistina nivîskarên Skandînavyayê re ders bikin da ku karibin xebatekî dest pê bikin.

Ser navê Koma Nivîskaran, serok Peter Curman û şêwirmanê wan yê hûqûqê û li ser navê Federasyonê jî heval Cimşîd û heval Hanefî beşdar bûn.

## Civînek bi dibistana mezinan (Vuxenskolan) re

Di rojên 2 û 3.10.1987-an de, li ser navê Federasyonê heval Cemîl û heval Keya di civîna Vuxenskolan de, ku hersal pêktê, beşdarbûn. Civîn li ser rewşa biyaniyan û

www.arsivakurdi.org

neheqiyên ku li wan dibe sekinî.

Di civînê de wezîra biyaniyan ya kevn, Karin Andersson û berpirsyarê jihevveqatandinê (dikrimineringsombudsmannen) Peter Nobel beşdar bûn û dîtinên xwe li ser neheqiyên ku li biyaniyan dibin, diyar kirin.

## Civînek bi berpirsyarê programa TV ya biyaniyan -Mozaik re

Di roja 3.11.1987-an de nunerên Federasyonê heval Keya û heval Hanefî li gel berpirsyarê programa TV ya biyaniyan civînekê de beşdarbûn. Di civînê de daxwaza programên TV bi kurdî hate kirin. Hate diyarkirin ku pêwîstiya kurdên li Swêdê bi programên TV girîng e û di vir de rewşa kurdan hate îzah kirin.

Nunerê TV diyar kir ku wek destpêk ew niha amede ne ku carna programên bi kurdî çêbikin, lê ji bo weşandinên daîmî niha ne amedene, eger îmkaniyet peyda bibe ewê bifikrin.

## Çend civîn bi Meclîsa Wîlayeta Stokholmê re

Heta niha tekîliyên Federasyonê bi Meclîsa Wîlayeta Stokholmê re pêşde nehatibû. Di roja 9.10.1987-an de heval Cimşîd û heval Hanefî bi sekreterê biyaniyan ya Meclîsê re civînek çêkirin. Di civînê de behsa karûbarê Federasyonê hate kirin. Herweha Sekreterê biyaniyan jî behsa xebata meclîsê, bi taybetî jî ji bo biyaniyan kir.

Di vê civînê de li ser çen hevkariyan jî hate axaftin. Yek ji xebatên ku hate kirin ew bû ku Federasyonê înformasyoneke bi kurdî (dîawêne û qasetê deng) li ser meclîsê pir kir û li komelên xwe di bajarê Stokholmê de belav kir da ku endamên xwe ji xizmetên Meclîsê agehdar bikin.

Sê civînên din jî di rojên 27.10.1987, 19.11.1987 û 14.12.1987-an de pêkhatin. Di van civînan de jî li ser nexweşiya AIDS-ê û alîkariya ku Meclîs dide komelên biyaniyan hate sekinîn. Heval Nebî Xoce û heval Hanefî beşdarî van civînan bûn.

## Civînek bi Îdara daîra Civakî (Social Styrelsen) re

Di meha 11-an 1987-an de civînek du rojî li ser nexweşiya AIDS-ê jî bi Social Styrelsen re pêk hat. Di civînê de hemû Federasyonên biyanî û nunerên hukumeta Swêdê beşdar bûn. Babeta civînê ew bû ku Federasyonên biyanî û maqamên swêdî çawa dikarin bi hevre kar bikin ku biyaniyan ji tehlûkeyên vê nexweşiyê agehdar bikin. Li ser navê Federasyonê heval Dicle di civînê de beşdar bû.

## Semînerek li Göteborgê û semînerek jî li Uppsalayê

Endamê Komîta Kargêr heval Cimşîd Heyderî di roja 14.3.1987-an de li Uppsalayê li ser daxwaza Komela Kurdistanê semînerek li ser dîroka rojnamegeriya kurdî da endamên komelê.

Di roja 16.1.1988-an jî heval Cimşîd semînerek li ser zanayê kurd Aladdîn Secadî da endamên Komela Kûltûrî Kurdistan li Göteborgê.

www.arsivakurdi.org

## Şevek ji bo beşdarên konferansa penaberan

Di rojên 14 û 15.10.1987-an de konferenseke Skandînavyayî li ser rewşa penaberan li bajarê Stokholmê pêkhat. Ji gelek belediyên welatên Skandînavya 800 nûner di vê konferansê de beşdar bûn.

Federasyonê di roja 14.10.1987-an de ji bo beşdarên vê konferensê şevek amede kir. Di şevê de Koma Govend dîlanên kurdî pêşkêşî mêvanan kirin. Komela Kurd Li Järfällayê jî xwarina kurdî hazirkirin. Di şevê de nêzîkî 100 mêvan beşdarbûn û ji şevê gelekî razî man.

## Li Kitêbxana Rinkebyê civînek bi Şêrko Bêkes re

Şairê kurd Şêrko Bêkes, di sala 1987-an de xelata Tuxolskî, ya Penkluba Swêdê girtibû. Bi vê munasebetê Kitêbxana Rinkebyê ji Federasyonê daxwaz kir ku li cem wan bi Şêrko Bêkes re civînekê amede bike.

Di roja 3.10.1987-an de ew civîn pêk hat. Di civînê de Şêrko Bêkes helbestên xwe xwendin. Xebatkarekî kitêbxanê jî helbestên Şêrko bi Swêdî xwendin.




## Civînek bi Komela Xwedîkarên Swêdê (SAF) re

SAF her sal ji bo cîhên kar yên piçûk re semîneran li ser babetên têvel amede dike. Çawa tê zanîn li Federasyonê çar karker dixebitin û Federasyon jî tê hesab kirin wek cîhekî kar.

Di roja 15.10.1987-an de heval Dîcle û heval Hanefî di civîna SAF de beşdar bûn. Babeta civînê pirsa karkeran ya sîgorte yê bû.

## Civînek bi sendîqaya karkeran re

Di roja 18.9.1987-an de Federasyonê nûnereke sendîqaya karkerên Federasyonê vexwande civînekî. Di civînê de karkerên Federasyonê û heval Cimşîd û heval Hanefî beşdar bûn. Li ser maf û berpirsiyariyên karkeran li hember Federasyonê û maf û berpirsiyariyên Federasyonê li hember karkeran hate axaftin.

## Yekîtiya Ciwanên Kurd Li Swêdê hate damezrandin

Piştî ku Federasyonê di kongra xwe ya 6-emîn de (6,7-4-1986) awayiya xwe guherand, Komîta kargêr di programa xwe ya xebatê de cîh da avakirina Yekîtiya Ciwanên Kurd Li Swêdê. Ji bo vê karê sekreterek di Komîta Kargêr de hate hilbijartin. Heval Bettal ku wek sekreterê ciwanan hate hilbijartin, ji ciwanên kurd -endamên komelên Federasyonê- komîteke awerte saz kir û komîtê dest bi karê amedekirina Yekîtiya Ciwanên Kurd Li Swêdê kir. Ev xebata piştî kongra 7-emîn (12,13,14-2-1987) ji aliyê heval Cemîl, sekreterê pirsa ciwanan yê nû ve hate domandin.

Di roja 6.11.1987-an de kongra yekemîn ya Yekîtiya Ciwanên Kurd Li Swêdê li bajarê Stokholmê civiya. Di kongrê de 25 nûnerên ciwanên kurd ji bajarên têvel yên Swêdê beşdarbûn û kongreke bi rêkûpêk li darxistin.

www.arsivakurdi.org

## Xebat ji bo penaberên kurd

Ew du salin wekî Federasyon di programa xwe ya xebatê de cîh daye alîkariya penaberên kurd. Di vê warî de Federasyonê gelek xebatên berbiçav kirine. Lê dîsa jî gelek kêmasî ji aliyê Federasyonê de çêbûne. Ev kêmasî bêtir di pirsa kadroyan de xwe nîşan daye. Herçend çend car biryar hate girtin ku Federasyon di kampên multeciyan de serdanan bike û têkîliyê li gel penaberên kurd dayne, ev yek bi firehî çênebû.

Lê maqamên Swêdê re (hukumeta Swêdê, daîra mihaciran, Xeça Sor belediyên Swêdê) û komîsyona Koma Netewan ya penaberan re gelek têkîlî hatiye danîn û di danûstandinên bi van maqaman re de rewşa penaberên kurd hatiye îzah kirin.

Piştî kongra 7-em heval Bekir sê meh (adar, nîsan û gulan) di Federasyonê de xebitî. Di heftê de du rojan bi pirsa tekakesan re mijûl bû û têkîliyên pêwîst ji bo halkirina pirsa penaberan, bi maqaman re danîn.

Di destpêka payîzê de jî heval Hanefî sê mahan di Federasyonê de bi maaş karkir. Di van sê mahan de penaberên kurd dikarîbûn herroj têkîliyê li gel Federasyonê daynin û ji bo halkirina problemên xwe alîkariyê bixwazin. Bi alîkariya Federasyonê gelek penaberên kurd problemên xwe halkirin.

Federasyonê di çend rewşan de destê xwe yê alîkariyê ji bo penaberên kurd dirêjî dervayê Swêdê jî kir. Bo nimûne: Payiza 87-an de komek penaberên kurd ji Kurdistana Başûr hatin Fînlandiya. Piştî ku agehdariya Federasyonê ji rewşa wan çêbû, têkîlî li gel maqamên Fînlandiya danî û daxwaz kir ku cîh bidin penaberên kurd. Herweha komek penaberên kurd jî li Polonyayê ji aliyê polîsê Polonya de hatibûn sekinandin, gava wan dixwastin bên Swêdê. Dîsa Federasyonê bi riya sefarata Polonya li Stockholmê ji hukumeta Polonya daxwaz kir ku penaberên kurd neşînin Iraqê. Li ser daxwaza Federasyonê ji komîsyona penaberan ya Koma Netewan jî ew penaberên kurd hatin Swêdê li li Swêd bi cî bûn.

## Civînek bi komîsyona penaberan ya Koma Netewan

Wek tê zanîn, gelek penaberên kurd ji Kurdistana Îranê û Iraqê li Turkiyê di bin berpirsiyariya Koma Netewan de hene. Malûmat hatin ji bo Federasyonê wekî Polîsê tirk teda li penaberên kurd dike û çend ji wan jî teslîmê Îran û Iraqê kirine. Herweha karkerekî Koma Netewan alîkariya penaberên kurd nekiriye. Li ser van malûmatan Federasyonê têkîlî li gel komîsyona penaberan ya Koma Netewan danî û civînek daxwaz kir. Di civînê de heval Cimşîd û heval Dîcle li ser navê Federasyonê beşdar bûn û daxwaz kirin ku Koma Netewan mudaxaleyê meselê bike.

## Komîta Hevkariya Komelên Federasyonê Li Stockholmê

Di wîlayetê Stokholmê de heft komeleyên Federasyonê hene. Ji bo ku karûbarê ku komeleyên endam li bajarê Stokholmê bête koordîne kirin û hevkariyeke xurt di nav wan de hebe bi înîsyatîva Federasyonê Komîta Hevkariya Komelên Federasyonê Li Stokholmê bi beşdariya wan komelan hate damezrandin. Ev komîte wê herweha ji wîlayeta Stokholmê alîkariyeke salene berbiçav bigre.

## Grûpa referensê ji bo zimanê kurdî

Bi beşdarbûna çend hevalên endamê Federasyonê û bi daxwaza beşê ziman û înformasyonê ya Daîra Karûbarê Biyaniyan (SIV) di roja 17.12.1987-an de grûpeke referensê ji bo zimanê kurdî hate sazkirin. Ev grûpa wê di warê

www.arsivakurdi.org

hazirkirina materyalê agehdariyê bi zimanê kurdî bi Daîra Karûbarê Biyaniyan re hevkariyê bike.

## Panêlek li ser rewşa kurdan li Swêdê

Di roja 22.11.1987-an de Federasyonê li taxa Stokholmê Akalayê panêlek li ser rewşa kurdan li Swêdê amede kir. Hemû nûnerên rêxistinên kurdistanî û serokên Federasyonê û berpirsyarên Berbangê yên kevn û rewşenbîrên kurd hatin vexwandin.

Babeta panêlê ew bû: rewşa kurdan li Swêdê çiye û meriv çi dikare bi hevre ji bo kurdan bike, da ku rewşa wan baştir be. Herweha dîtin û rexne li ser xebata Federasyonê di vî warî de.

Du hefte berî civînê ji hemû xwendîyan re name hate şandin. Hinek rêxistina bersîv dan ku ew nikarin di civînê de beşdar bin, hinekan bersîv dan ku ew dikarin beşdar bin û hinek rêxistinan jî qet bersîv nedan. Serokên Federasyonê û berpirsyarên Berbangê yên kevn, dervayê hevalekî hemû beşdarî civînê bûn. Herweha nêzî pêncî rewşenbîrên kurd jî di civînê de cîhê xwe girtin.

Di civînê de, sê nûnerên Komîta Hevkariya Rêxistinên Siyasî Yên Kurdistanî beşdarî kirin û li ser navê rêxistinên endamên Komîtê diyar kirin ku ew ji ber ew sedeman ne amedene ku beşdarî civînê bikin:
*Divabû ku Federasyon civîneke weha piştî kongra 7-em bikira.
*Federasyonê ji Komîta Hevkariyê re dawetname neşandiye.
Ew rêxistinên endamê Komîta Hevkariyê ku bersîv dabûn û diyarkiribûn ku ewê beşdarî civînê bikin, vê gavê gotin em rîayetê biryara komîtê dikin û lewra jî ne li ser navê rêxistina xwe, lê wek şexis dixwazin biaxivin.

Civînê saet 13.00 destpêkir û divabû ku saet 18.00 biqede. Lê ji ber ku gelek mêvanan xwestin biaxivin, civîn di saet 19.00-an de qediya.

Bi giştî civîn pozîtîv bû, beşdarên civînê bi rexne û pêşniyarên xwe ve atmosfereke cîddî dane civînê û herweha daxwaz hate kirin ku civînek weha pêwîstê lê bi formeke din.

## Civînek bi Daîra Biyaniyan re

Di roja 5.2.1988-an de li ser vexwandina Dîra Biyaniyan, Komîta Kargêrî Federasyonê di civînekê de beşdar bû. Civîn ji du beşan pêk hatibû. Di beşa yekemîn de nêzîkî 50 xebatkarên Daîra Biyaniyan ji beşên têvel ya Daîrê beşdar bûn û nûnerên Federasyonê li ser karûbarê Fwederasyonê û rewşa kurdan li Swêdê malûmat dan beşdaran û herweha pirsên wan bersîv kirin.

Di beşê civînê ya duwemîn de civîn di nav nunerên Federasyonê û beşa tevgera gelerî (Folkrörelsesektionen) de pêk hat. Di civînê de li ser xebata beşê malûmat hat dayin û herweha li ser hevkariya Federasyonê û Daîra Biyaniyan hate sekinîn.

## Semînerek ji aliyê Daîra Biyaniyan

Di rojên 27-28.1.1988-an de Daîra Biyaniyan li ser metoda xebata di rêxistinên demokratîk de semînerek li dar xist. Di semînêrê de bêtir li ser karûbarên malî hate sekinîn. Di semînera ku rojek berdewam bû, li ser navê Federasyonû sekreterê malî heval Dîcle û nûnerê Yekîtiya Ciwanên Kurd xwûşka Nevîn beşdar bûn.

www.arsivakurd.org

# RAPORA ABORÎ YA

# FEDERASYONA KOMELÊN

# KURDISTANÊ LI SWÊDÊ

# 1987

## Ji bo Kongra 8 em
## (13-14.2.1988)

**HATIN:**

| | |
|---|---|
| **ALÎKARÎ** | **742.158.41** |
| Ji Daîra Biyaniyan (SIV) | 393.008.00 |
| Ji bo meaşê karkeran (Läns) | 306.230.00 |
| Alikarî ji bo aşitiyê (UD) | 10.000.00 |
| Ji kampanya alikariya Kurdistana Başûr | 21.197.00 |
| Ji derên din (ABF û LANDSTINGET) | 11.723.00 |
| **JI ŞEVAN** | **32.995.00** |
| Ji şeva Tensta (14.10.1987) | 6.760.00 |
| Ji şeva Musebaqa Folklorê li Solnahallen | 26.235.00 |
| **JI FIROTIN, FOTOKOPI, DATA uhw.** | **18.865.72** |
| **HEQÊ ENDAMETIYA KOMELÊN ENDAM** | **12.160.00** |
| **JI ABONETIYA BERBANGÊ** | **11.022.00** |
| **JI DERÊN DIN** | **345.00** |
| **YEKÛN** | **817.546.00** |

www.arsivakurdi.org

ÇÛYIN

| | |
|---|---|
| **MEAşÊ KARKERAN** | **327.735.80** |
| **LOKAL** | **131.227.11** |
| Kirê | 115.020.00 |
| Embar | 5.034.00 |
| Sigorte | 1.114.00 |
| Elektrik | 4.306.70 |
| Mesrefên din | 5.752.30 |
| **CIVÎN Û ŞEV** | **101.500.25** |
| Meşa 12 Îlonê | 1.310.00 |
| Kongra 7 em | 2.834.00 |
| Newroz | 8.666.00 |
| Musebaqa sporê | 3.733.00 |
| Hefta Dostaniyê | 2.900.00 |
| Civin û konferans û wekîdin | 31.700.75 |
| Musabaqa Folklorê | 50.356.50 |
| **INVENTARIER** | **54.271.00** |
| Projektor | 650.00 |
| Mobilya | 4.604.00 |
| Data | 10.123.00 |
| Textilo | 3.000.00 |
| Laser | 31.086.00 |
| Diabilder | 4.808.00 |
| **BERBANG** | **54.664.20** |
| **QIRTASİYE** | **39.133.80** |
| **MESREFÊN ÇUYIN Û HATINÊ** | **35.233.99** |
| Kongra 7-em | 8.430.00 |
| Civînên Komîta Giştî û Komelan | 18.222.99 |
| Civînên resmî û konferans | 8.581.00 |
| **ALÎKARÎ** | **30.835.00** |
| Alîkariya Kurdistana Başûr | 21.197.00 |
| Alîkarî li gor biryara Kongra 7-em | 9.638.00 |
| **TELEFON Û POSTE** | **29.590.99** |
| Telefon | 10.633.80 |
| Poste | 18.95719 |
| **LEASING (FOTOKOPÎ)** | **11.774.73** |
| **TIŞTÊN DIN** | **150.00** |
| **YEKÛN** | **816.116.87** |
| **QASE** | **93:7.96** |
| **POSTGIRO** | **491.34** |
| **YEKÛN** | **817.546.13** |

www.arsivakurdi.org

**چوون.(خەرج و سەرف)**

٣٢٧, ٧٣٥, ٨٠ مانگانەی کریکارانی فیدراسیۆن ٣٢٧ ٧٣٥ ٨٠

٥٤, ٢٧١, ٠٠٠ ـ کرینی کەرستەی چاپ

ـ پرۆژێکتەری دیافیلم(بۆ پیشاندانی سلاید) ٦٥٠

ـ کتێبخانە موبیل ٤,٦٠٤

ـ داتەکۆمپیووتەر ١٠, ١٢٣

ـ تایپ (مەکینەی نووسین) ٣, ٠٠٠

ـ دەزگای لازەر بۆ چاپ ٢١,٠٨٦

ـ دیافیلم(زیّدە کردنی سلایدات لەسەر کوردستان ٤, ٨٠٨

١١, ٢٢٧, ١٣١ کرێی بارەگای فیدراسیۆن و عەمباری کەل وپەل تامیین کردنی کەرستەیفیدراسیۆن و هەقی کەهرەبا ( ئەلیکتریك)

ـ کرێی بارەگا ١١٥,٠٢٠

ـ کرێی عەمبار ٥,٠٣٤

ـ تامیین کردن ١,١١٤

کەهرەبا ٤,٣٠٦,٧٠

ـ شتومەکی تر ٠٠ ٥,٧٥٢,٣٠

١١, ٧٧٤, ٧٣ کرێی فۆتۆکۆپی ١١, ٧٧٤, ٧٣

٣٩, ١٣٣, ٨ کاغزی فۆتۆکۆپی وقەلەم و ورەوالەی تر ٣٩,١٣٣, ٨

٢٩,٥٩٠, ٩٩ تەلیفۆن وپۆست

ـ تەلیفۆن ١٠,٦٢٣,٨٠

ـ پۆست وپوول ١٨,٩٥٧,١٩

**سەفەر**

پارەی ریگای هاتووچوونی ئەندامانیئەندامانی کومیتەی کارگێرو گشتی وچاودێرو ونوێنەرانی کۆمەلەکانی ئەندام بۆ بەشداری کردن لە کۆنگرە وکۆبونەوەکان٠

٣٥, ٢٢٣, ٩٩

ـ هەقی ریگای نوێنەرانی کۆنگرەی ٧.م ٨,٤٣٠

ـ هاتوو چوی ئەندامانیئەندامانی ك٠ك وك٠گ

بەشداری کردنیان لە کۆبونەوەکاندا ١٨,٢٢٢, ٩٩

پارەی ریگای کۆنفرەنس وسیمینارەکان ٨,٥٨١

**یارمەتی** ٣٠, ٨٣٥ یارمەتی کوردستانی باشوور ودەست گرتنی کۆمەلەکانی ئەندام

ـ کەمپانیای هاوکاری کوردستانی باشوور ٢١, ١٩٧

ـ دەست گرتنی کۆمەلەکان ٩, ٦٣٨

**بەربانگ** ٥٤, ٦٦٤, ٢ چاپکردنی بەربانگ ٥٤, ٦٦٤, ٢

**ئاهەنگ وجەژن و خۆپیشاندان**

١٠١, ٥٠٠, ٢٥

ـ خۆپیشاندانی ١٢ ئەیلوول ١, ٣١٠

ـ کۆنگرەی ٧-م /٨٧ ٢, ٨٣٤

ـ چەپکە گوول وبەشداریکردنی تازی پالمە ٩٤٥

ـ ئاهەنگی نەورۆز /٨٧ ٨,٦٦٦

ـ کرینی کەرەسەی پیشآنگا ١, ٠٠٠

ـ پیشبرکیی وەرزش ٣, ٧٣٣

ـ پیشبرکیی فۆلکلۆری ١٩٨٧ ٥٠,٣٥٦,٥٠

ـ دەف و زوورنا ٢,٩٠٠

ـ هەقی گۆرانی بێژو وکۆبەوەکانی کۆمیتەیگشتی وکارگێر

٢٩, ٧٥٥, ٧٥

١٥٠ شتی تر

ـ لە پۆست گیرو قاسە ٣٠, ١٤٢٩ ماوەتەوە ٠ ئەو پارەیە دەخرێتە سەر چوون ٠

چوون ـ ٨١٧, ٥٤٦, ١٧

هاتن ـ ٨١٧, ٥٤٦, ١٧

www.arsivakurdi.org

یارمەتی خۆیان رەوانەی فیدراسیۆن کرد.ـ هەروەها بە سەدان کوردی هێژا لە سوێد دەستی یارمەتی و هەستی پشتگیری ئەو کامپانیایەی نیشان دا.

لەسەرتای دەست پێکردنی کامپانیاکە کۆمەڵەکانی ئەندامی فیدراسیۆن لە ستۆکهۆلم، بۆ ماوەی هەفتەیەک لە شوێنە گشتیەکان و گۆڕەپان و شەقامەکان پارەیان کۆکردەوە و لە هەمان کاتدا نێزیکەی دەهەزار دانە بەیان بڵاوکرایەوە لەسەر باری کوردستان. جگە لە فیدراسیۆن نامەیەکی رەسمی ئاراستەی هەموو رێکخراوە کۆمەڵایەتی و سیاسی و مرۆڤایەتی سوێدی کرد. ئەو نامەیە بۆ (١٥٠) رێکخراو رەوانە کرا.

لە کاتی فێستیڤاڵی ئاشتی وڵاتانی ئەسکەندناڤیا کە لە رۆژانی ٢٤ـ٢٨ی حوزەیران (یونی) کە لە ستۆکهۆلم کرایەوە، کامپانیاکە بەردەوام بوو.
کامپانیای هاوکاری تا سەری سالی ١٩٨٨ بەردەوام بوو٠ لە ئەنجام دا ١٠ تۆن جل و بەرگ و ٤١،١٩٧ هەزار کۆ کرۆن کۆکرایەوە ٠ ئەو یارمەتی یە تەسلیمی کۆمیتەی هاوکاری رێکخراوەسیاسیەکانی کوردستانی باشوور کرا٠ بەلام ئەوەی جێگای داخە ،ئەو جل وبەرگانەی کۆ کرابوونەوە ،رێکخراوەسیاسیەکانی کوردستانی باشوور بۆیان نەکرا بۆ کوردستانی رەوانەبکەن ٠ ئەو کەل وپەلا- نە لە لایەن کۆمەلەی سونسڤالەوە کوکراوە تەوە ٠

## راپۆرتــی دارایــی بـۆ کۆنـگـرەی هـەشـتـەمی فیدراسیۆن

**داهـــــات**

**ــــــــ دەست گرتن و یارمەتی ئابووری وداهاتی چالاکیەکانی فیدراسیۆن ٠**

دەست گرتن(یارمەتی)

| | | |
|---|---|---|
| | ٧٤٢, ١٥٨, ٤١ کرۆن | |
| ــ ئیدارەی بیانی | | ٣٩٣, ٠٠٨ |
| ــ ئەنجومەنی کاری دەولەتی | | ٣٠٦, ٢٣٠ |
| ــ وزارەتی دەرەوە بۆ فیستیڤالی ئاشتی | | ١٠, ٠٠٠ |
| ــ کەمپانیای هاوکاری کوردستانی باشوور | | ٢١ , ١٩٧ |
| ــ قازانجی چالاکیەکانی فیدراسیۆن | | ١١, ٧٢٣ |
| | | ٧٤٢, ١٥٨, ٤١ |
| ـ لە چالاکیەکان | | |
| | ٩٩٥ ، ٣٢ کرۆن | |
| ــ ئاهەنگی پێشبرکێی فۆلکلۆری | | ٢٦, ٢٣٥ |
| ــ ئاهەنگی شەوی تێنستا | | ٦, ٧٦٠ |
| | | ٣٢،٩٩٥ |
| داهاتی فرۆتـــن | | |
| | ١٨, ٨٦٥, ٧٢ | ١٨, ٨٦٥, ٧٢ |
| ـ هەقی ئەندامەتی کۆمەلەکانی فیدراسیۆن | | |
| | ١٢, ١٦٠ | ١٢, ١٦٠ |
| ــ ئابوونەی بەربانگ | | |
| | ١١,٠ ٢٢, ٤ | ١١,٠ ٢٢, ٤ |
| داهاتی هەمە جۆرە | | |
| | ٣٤٥ | ٣٤٥ |
| کۆی داهاتی ساڵانەی فیدراسیۆن لە نێوان دوو کۆنگرە دا : | | ٨١٧, ٥٤٦, ١٧ کرۆن |

**پێ دەکرێ • لەو بارەیەوە چ رەخنە و بۆچوون هەیە •**
فیدراسیۆن بەر لە دوو هەفتە بە نامە ئاگاداری رێکخرا-وەکانی سیاسی وکەسانی تری کرد •هەندێ وەرامیان داوە کە بەشداری دەکەن،هەندیکی تر بۆیان ناکرێ، ئەوانی تر هەر بێ دەنگ بوون •
سەرۆك و بەرپرسیارە کۆنەکانی فیدراسیۆن وبەربانگ جگەلە یەکێك هەموو ئامادەوبەشداریان کرد • هەروەها نزیکەی ٥٠ روناکبیری کورد بەشداربوون ،بەلام سەر نوینەری کۆمیتەی هاوکاری رێکخراوەسیاسیەکانی کوردستان ، رایان گەیاند کە ناتوانن بەشداری بکەن لەبەر چەند هۆیەك :
**- دەبوایە فیدراسیۆن ئەو کۆبونەوەی ،دوای کۆنگرەی ٧ پێك هینا بایە •**
**- فیدراسیۆن کۆمیتەی هاوکاری بانگ نەکردوە(وەك کۆمیتە)•** هەندێ رێکخراویسیاسی کەبریاریان دابوو بەشداری بکەن،رایان گەیاند کە بریاری کۆمیتەی هاوکاری راچاو دەکەن ،بە لام بەناوی شەخسی قسەدەکەن• کۆبونەوە کە دەبوایە لە کاتژمێر ١٣ تا ١٨ بخایەنی ، بە لام لەسەر داخوازیبەشداران ساعەتێك زیاد کرا ،تا سەعات ١٩ بەردەوام بوو •
کۆبونەوەکە بە جۆرێکیگشتی سەرکەوتوو بوو،چەند رەخنەو پێشنیاریش کرا بۆ رێکخستنی کۆبونەوەی وا،بە لام بە شێوەیەکی باشتر •

**کۆنفرەنسی ریفیزۆری ئیدارەی بیانی**

لە رۆژانی (٧، ٦/ ٤/ ١٩٨٨ئیدارەی بیانی کۆنفرەنسێکی گرت بۆ ریفیزۆرانی ئابووری فیدراسیۆنی بیانیان • بە ناوی ڤیدراسیۆنی ئێمە هەڤالان نەڤین ودجلە بەشداریان لە کۆنفرەنسەکەدا کرد •

**کۆبونەوەیەك لە گەل کاربەدەستانی ئیدارەی بیانی**

لە رۆژی ٥/ ٤ / ١٩٨٨ ئەندامانی کۆمیتەی کارگێری فیدراسیۆن هەڤالان : **حەنەفی ،کەیا،دجلە وجەمشید و جەمیل کۆبونەوەیەکیان لەگەل کاربەدەستانی دەزگا جۆراو** جۆرەکانی ئیدارەی بیانیان کرد لەشاری **نۆرشۆپینگ** •
لە کاتژمێری ٩،٣٠ - ١١ ئەندامانی کۆمیتەی کارگێر باسی کوردلە سوێد وبارودۆخی کوردستان و کیشەی پەنابەرانی کوردیان کرد ،هەروەهاباسی گیرگرفتی کوردی سوێدیان کرد لە بواری خویندن وکارکردن ومەسەلەی ئافرەت و لاو وزارۆك • هەروەها لەسەر خەباتی فیدراسیۆن گفتو گۆ کرا • لە کۆبونەوەکە نزیکەی ٥٠ کەس ئامادەبوون •

هەروەها دوای نیوەرۆ لە کاتژمێری ١٣ تا ١٧ کۆبونەوە-یەکی تایبەتی کرا لە گەل بەشی بزووتنەوەی میللی ئیدارەی ناوبراو دا • هەردوو بە دوورودرێژی لەچۆنیەتی هاوکاری وچارەسەرکردنیکیشەی پەنابەرانی کورد ،زۆر شتی تریش باس کرا •

## کامپانی هاوکاری و یارمەتی بۆ کوردستانی باشوور

لە سەرەتای مانگی حوزەیران دا، فیدراسیۆنی کۆمەلە کوردستانی یەکان لە سوێد کامپانی هاوکاری و یارمەتی بۆ کوردستانی باشوری دەستپێکرد.
هەر وەک دەزانرێ لە ١٥ی نیسانەوە رژێمی فاشیستی عیراق دەستی کردووە بە بەکارهێنانی چەکی کیمیاوی دژی گەلی کورد لە کوردستانی باشور، ئەوەش بووە هۆی کوشتن و بریندارکردنی سەدان مرۆڤ
کۆمیتەی کارگێری فیدراسیۆنی کۆمەلە کوردستانی یەکان لە سوێد کە بریاری کامپانیای هاوکاری و یارمەتی بۆ کوردستانی باشوور وەرگرت، ئەو راستی یەی سەرەوەی لەبەر چاوگرت. بێگومان ئەوە خەباتێکی سروشتی فیدراسیۆنە پێویستە پێی هەلسێ، لە لایەکی تریش ئەندامەکانی خۆی بە چالاکی بخاتە کار لە بارودۆخێکی وا دا. بە گەرمی رووداوەکە و لەکاتی خۆیدا ئەو بارەی گەلەکەمان پێیدا تێدەپەرێ بە کورد و رای گشتی جیهان رابگەیێنێ.
لەوانەیە فیدراسیۆن لەو کامپانیایەدا نەتوانێ یارمەتییەکی مەزن وەدەست بخا، بەلام سوودی ئێمە وەک نەتەوەیەک لەوەدایە، هەردەم ئامادەین بۆ یارمەتی و هاوکاری گەلەکەمان.
مەهێلن رووداو سارد بێتەوە! لەو کاتەی ئێمە بەو کامپانیایە هەلستاین، گرنگی ئەو بارەمان لەبەر چاو گرتبوو. لەو بروایەدا بووین کە کۆمەلەکانی ئەندام و خەلک لەو چالاکیەدا پشتگیریمان دەکەن، هەر واش دەرچوو.
لەگەل دەستپێکردنی ئەو کەمپانیایە، هەموو کۆمەلەکانی ئەندام پشتگیری و یارمەتی خۆی پیشان دا و هەر یەکەش لە ناوچەی خۆیدا چالاکی دەستپێکرد بۆ کۆکردنەوەی پارە، جلوبەرگ، خێوەت، دەرمان ئەندامان و دۆستانی فیدراسیۆن

www.arsivakurdi.org

کاربەدەستانی کۆمەلەی نەتەوە یەکگرتووەکان لە تورکیا هاریکاری پەنابەری کورد ناکەن • فیدراسیۆن پێوەندی لەگەل کۆمیسیونی پەنابەرانی کۆمەلەی ناوبراو کـــردو داوای کۆبونەوەیەکی بە پەلەی کرد لەگەلیانا • لەو کۆبونەوەیەدا لەسەر ناوی فیدراسیون هەڤالان جەمشید و دجلە بەشداریان کرد وداوایان لە نوێنەری کۆمەلەی نەتەوەیەکگرتووەکان کرد ، خۆیان بکەن بە خاوەن مەسەلەکە ویارمەتی کورد بدەن •

## پێشبرکێی وەرزش

فیدراسیۆن لە رۆژی ٤ / ١ /١٩٨٧ پێشبرکێی یەکی وەرزشی لە شاری ستۆکهۆلم رێکخست لە نێـــوان منال و لاوانی کورد دا،نزیکەی ١٥٠ زاروك ولاو ی کوردلە ناوچە جیاوازەکانی ستۆکـــهۆلم بەشداریان تێدا کرد • لە سەرەتا دا تۆپ تۆپێنێ (فوتبۆل ،پینگ پونگ ،ڤەلـــی بۆل، ) • یاری سەبەست کرا • هەندێ باوك ودایکـــــی منالەکان بۆ تەماشای پێشبرکێ کە هاتبوون • ئەوە جاری یەکەمە لە سوێد چالاکی وا بۆ زاروکان رێك دەخرێ • بەشدارانی پێشبرکێ هەموو بە میدالیاو کاس ودیـــاری هەمە جۆرە خەلات کران •لە کۆتاییدا بەشداران پێشنیاریان کرد ،کە فیدراسیۆن لە دوا. رۆژیشدا چالاکی وا بـــۆ زارۆکان ئامادە بکا •

## کۆمەلەی هاوکاری نێوان کۆمەلەکانی فیدراسیۆن لـــــە پـــارێزگـــای ستۆکهـــۆلم

لە پارێزگای ستۆکهۆلم دا، ٧کۆمەلەی ئەندامی فیدراسیون هەیـــە • بۆ راپەراندنی کاروباری کۆمەلەکانی ئەندام لـە ستۆکهۆلم و دەوروبەری و بە هێز کردنی هاوکاری نێوانیان فیدراسیۆن دەستپێشخەری دامەزراندنی ئەو کۆمیتەیەی کرد • دەبێ ئەو کۆمیتەیە یارمەتی سالانەی پارێزگـــای ستۆکهۆلم لە بەر چاو بگرێ •

## گـروپی راوێژ بۆ زمانی کورد

بەشی زمان و راگەیاندن لە دایرەی بیانی لە رۆژی ١٧/١٢ گروپێکی راوێژکاری دامەزراند بۆ هاوکاری کردن لە باری ئامادە کردنی کەرەسەی راگەیەیاندن بەکوردی• لــــەو گروپەدا چەند هەڤآلێکی ئەندامی فیدراسیون بەشداری دەکەن •

## نـارەزایی بەرامبەر جونتای فاشستی تــــورکیـــا لە رۆژی ١ ئەیلوولــــــدا

ئەو ساليش وەك سالانی تر،فیدراسیۆنی کۆمەلەکانـی کوردستانی لە سوێد لە گەل هێزە دیموکرات وپێشکـــەوتنخوازی کوردستان و تورکیا لە رۆژی ١/ ٩/ ٨٧ پێکەوە خۆپیشاندانی نارەزاییان رێکخست• بۆ راپەراندنـی ئەو کارە ،کۆمیتەیەك پێکهێندرا• چەند رۆژێك بـــەر ائەیلوول ئەفیش و بەیانامە لە شاری ستۆکهـۆلـــم بلاوکرایەوە • بارو دۆخی گەلی کورد و تورك و هێرشـی جونتای فاشست بۆ رای گشتی سوێد روون کرایەوە • هەروەها بەرەشوورێك چاپکرا و بۆ رۆژنامەو هێزەسیاسیەکان رەوانەکرا •

سەر لە بەیانی رۆژی ١ ئەیوول نوێنەرانی رێکخەرانی نارەزاییەکە دروشمێکی بەرەش نووسراویان لە بەردەم بالیوزخانەی تورکیا دانە •

لە کاتژمێری ١٢ ،سەدانکەسی دیموکرات وپێشکەوتنخواز لە مەیدانی سێرگس تۆری لە شاری ستۆکهۆلم کۆبونەوە لەگەل دروشمی دژی جونتای فاشست و سلۆگانی بێزاری و نارەزایی کۆبونەوە دەست پێ کرا• لە کۆبونەوەکەدا وتارێك بە زمانی کوردی ،تورکی و سوێدی خوێندرایەوە• هەروەها نوێنەری پارتی چەپی کۆمونیستی سوید وئەندامی کۆمیتەی کارگێری ئەو پارتە بریگیتە روندبیرین وتاریکی داو پشت گیری لە خەباتی گەلانی کورد و تورك کـــرد • پاشان کۆبوەکان روویان کردە باخچەی شا ولە وێندەرێ پرۆگرامیکی کولتووری پێشکەش کرا• پێتەر گرومان سەرۆکی نووسەرانی سوێد وشاعیری بەناوبانگی کورد شێرکۆبێکەس بە هەلبەستی دژ بە فاشیزم بەشداریان تێدا کرد ،هەروەها سێ گۆرانی بێژی سوێدی و کۆما گۆڤەند وشەنگـا ل ـی فۆلکلۆری کوردی لە پرۆگرامەکەدا بەشداربوون •

لە خۆپیشاندانەکەدا نزیکەی ٢٠٠کەس بەشداربوون• لـە رۆژی دواییدا رۆژنامەکانی سوێد باسی خۆپیشاندانەکەیان بلاوکردەوە •

## کـــۆبونەوەیەك لەسەر باری کورد لـە ســوێـد

لە رۆژی ٢٢/١١/١٩٨٧ فیدراسیۆن کۆبونەوەیەکی لـــــە شاری ستۆکهۆلم لە ئاکـــالا لە سەر باری کورد پێکهێنا• فیدراسیون بە نامە ئاگاداری هەموو رێکخراوە سیاسیەکانی کوردستان و سەروکە کۆنەکانی فیدراسیون وبەرپرسیارەکانی گۆڤاری بەربانگ ـی پێشی و روناکبیرانی کورد کرد • بابەتی باسەکان ئەوە بوون :

**باری کورد لە سوێد لە چی دایە؟ بۆ باشتر کردنی چیمان**

www.arsivakurdi.org

کورد لە یارفەلا خواردنی کوردی پێشکەش مێوانان کرد. لە شەوکە ١٠٠ مێوان ئامادەبوون ورەزامەندیان پیشان دابەرامبەر رێکخەرانی ئاهەنگ .

**شاعیری کورد شێرکۆ بێکەس لە کۆڕێکدا**

کتێبخانەی رینکەبیی بە هاریکاری فیدراسیۆن کۆڕیکی بۆ شاعیری کوردو وەرگری خەلاتی تۆخۆلسکی کاك شێرکۆ بیکەس لە رۆژی ٨٧/١٠/٣ رێکخست. لە کۆڕە کەدا کاك شێرکۆ چەند پارچە شیعری خۆی خوێندەوە، پاشان یەکێك لەکارگوزەرانی کتێبخانەی ناوبراو ،هەندێ لەو شیعرانەی بە سوێدی خوێندەوە.

**کۆبونەوەیەك بە کۆمەڵەی خوێندکارانی سوێد /ساف/**

هەر وەك ئاشکرایە ساف هەموو ساڵێك سیمیناریك رێك دەخا بۆ ئەو دەزگا بچوکانەی کارکەریان کەمە. جا لەبەر ئەوەی چوار کریکار لە فیدراسیۆن کار دەکەن ئەویش بەو جۆرە دەزگایە دەژمێردرێ . لە رۆژی ١٩٨٧/١٠/١٥ هەڤال دجلە بەشداری ئەو سیمینارەی کرد ،کە تەرخان کرابوو ،بۆکیشەی کریکاریزگورتی.

**کۆبونەوەیەك لەگەل سەندیکای کرێکاران**

لە رۆژی ١٩٨٧/٩/١٨ نوێنەری سەندیکای کریکارانی فیدراسیۆن دەگەل فیدراسیون کۆبونەوەیەکی کرد لە بارەی ماف و بەرپرسیاری کریکاران لە هەمبەر فید- راسیۆن وبە پێچەوانەش . لە کۆبونەوەکەدا کریکارانی فیدراسیۆن وهەڤالان حەنەفی و جـ مشید بەشداریان کرد.

**یەکێتی لاوانی کورد لە سوێد دامەزرا**

دوای کۆنگرەی شەشەمی فیدراسیۆن لە ٢٦ / ٤ /٩٨٦ و ئەو گۆرانەی بەسەر فیدراسیۆن هات،کۆمیتەی کارگێر لە پرۆگرامی کاروبار دا ،خالیکی تایبەتی لە بارەی دامەزراندنی یەکێتی لاوان چەسپاند. بۆ ئەو مەبەستەش هەڤال بەتال بە سکرتێری لاوان هەلبژاردرا و کۆمیتەیەکی لە لاوانی کۆمەلەکانی ئەندام هەلبژارد. کۆمیتە کەوتە کار کردن بۆ دامەزراندنی یەکێتی ،دوای کۆنگرەی ٧م(١٢، ١٣، ٨٧/٢/١٤ ئەو کارە درێژەی پێدرا و هەڤال جەمیلبە سکرتێری بەرپرسیاری لاوان هەلبژاردرا . لە رۆژی ١٩٨٧/١١/٦ کۆنگرەی یەکەمی یەکێتی لاوان کورد لەستۆکهۆلم بەسترا ،بە ئامادە بوونی ٢٥ نوێنەر لاوانی کورد لە سوێد. کۆنگرە بەریکوپیکیوسەر کەوتووانە تەواو بوو .

**هاریکاری پەنابەرانی کورد**

لە دوو ساڵەی دواییدا ،فیدراسیۆن هاریکاری پەنابەرانی کوردی خستوەتە نێو پروگرامی رۆژانەی خۆی . لەم بوارەدا خەباتی فیدراسیۆن لەبەر چاوە . بەلام لەگەل ئەوشدا کەم کادری تەگەرەیە .زۆرجار فیدراسیۆن بریاری وەرگرتووە سەر لە ئۆردوگای پەنابەرانی کورد بدات، وپیوەندیان لە گەلا خورت بکا ،بەلام وەك پێویست ئەو ئەرکەی بە جێ نەگەیاندوە . لەم باریەوە لە رادە- بەدەر پێوەندی بە هێزە لەگەل دەزگاکانی سوێدی (**حکومەتی سوێد،بەرپوەبەرایەتی دەزگای موهاجیرەکان، خاچی سور،شارەوانیەکانی سوێد**) وهەروەها کومیسیونی پەنابەرانی کۆمەلەی نەتەوەیەکگرتووەکانبۆ یارمەتی دانی پەنابەران وروونکردنەوەی باری پەنابەرانی کورد . پشتی کۆنگرەی ٧ـم هەڤال بەکر بۆ سێ مانگ(ئادار ،نیسان و گولان)لە فیدراسیۆن دا ،کاری پەنابەرانی لەسەر شان بوو، هەفتەی دوو جار (رۆژ) بەو کارە خەریك بووە. لەسەرەتای پایزەوە هەڤال حەنەفی بۆ ماوەی سێ مانگ بە مووچە لە فیدراسیۆن کاری دەکرد، فیدراسیۆن گەلەك کارو کیشەی پەنابەرانی چار کردوە و رایپەراندوە . فیدراسیۆن دەستی یارمەتی بۆ پەنابەران درێژکردوە ،نەك تەنیا لە سوێد ،بەلکو لەدەرەوەی سوێدیش بۆ نموونە:

لە پایزی ١٩٨٧ ژمارەیەك پەنابەری کورد لە کوردستانی باشوور گەیشتنە **فینلەندە** و دوای ئەوەی فیدراسیۆن ئاگادارکرا، پێوەندی گرت لەگەل کاربەدەستانی فینلەندە وداوای پەنابەرەکان جێ بەجێ کرا . هەروەها ژمارەیەکی تر لە پەنابەری کورد دەیانویست بگەنە سوێد، بەلام لە لایەن پۆلیسی لاهستان(پولونیا ) دەست بەسەر کرابوون. دیسان فیدراسیون پیوەندی گرت لە گەل بالیوزخانەی پۆلۆنیا لە ستۆکهۆلم داوای کرد ئەو پەنابەرانە بۆ عیراق نەگەرێننەوە. لەسەر داخوازی فیدراسیۆن کۆمیسیونی پەنابەرانی کۆمەلەی نەتەوەیەکگرتووەکان لە سوێد بە هانە- یان هات و لە سوێد وەرگیران .

**کۆبونەوەیەك بە کۆمیسیونی پەنابەرانی کۆمەلەی نەتەوەیەکگرتووەکان**

وەك دەزانری گەلەك پەنابەری کوردی کوردستانی عیراق و ئێران لە تورکیا دا چاوەرێی یارمەتین وخۆیان بە نوێنەرا- تی کۆمەلەی نەتەوەیەکگرتووەکان ناساندوە . ئەو دەنگ و باسەی بە فیدراسیۆن گەیشتبوو ،کە تورکیاهەندی پەنابەری کوردی تەسلیمی عیراق و ئیران کردوتەوە. هەروەها نوێنەری

دەخەنە بەر ریکخراوی نووسەرانی ئەسکەندیناڤیا بو ئەوەی چاکتر لیّی بکوّلنەوە و کاری بوّ بکەن ٠لە کوّبونەوەکەدا ،سەروکی کوّمەلەی نووسەرانی سوید پیتەر گورمان و راویژکەری قانوونی کوّمەلە ، لە لایەن فیدراسیوّنەوە هەڤالان جەمشید و حەنەفی بەشداریان کرد ٠

**کوّبونەوەیەك قوتابخانەی Vuxenskolan**

••••••••••••••••••••••••••••••••

لە روّژی ٢-٣/١٠/٩٨٧ لە کوّبونەوەی سالانەی Vuxenskolan دا نوینەرانی فیدراسیوّن هەڤالان جەمیل و کەمیا بەشداریان کرد ٠ کوّبونەوە- کە بوّ مەسەلەی بیانیان و ئەو ناهەقی‌یەی لیّان دەکریّ تەرخان کرابوو ٠ لە کوّبونەوەکەدا وەزیری کوّنی بیانی کارین ئەندرسوّن و بەرپرسیاری (dikrimineringsombudsmannen ) پیتەر نوّبل بەشداریانکرد و دیتنی خویان لەو بارەوە پیشکەش کرد ٠

**کوبونەوەیەك لە گەل بەرپرسیاری پروگرامی TV بیانیان - موّزاییك**

••••••••••••••••••••••••••••

لە روّژی ١٩٨٧/١١/٣ نوینەرانی فیدراسیوّن هەڤا- لان حەنەفی و کەمیا لە گەل بەرپرسیاری پروّگرامی موّزاییك کوّبونەوەکیان کرد ٠ داوایان کرد بەشی کوردیش لەو پروّگرامە (موزاییك)ە دا هەبیّ ٠ بە دورودریژی باسی باری کورد کرا و پیویستی وگرنگی ئەو جوّرە پروّگرامە نیشان درا ٠ نوّینەرانی ت٠ڤ وەك سەرەتا ئامادەییان نیشان دا هەندیّ جار پروّگرام بە کوردیش پیشکەش بکریّ،بەلام بـلاوکردنەوەی دایمی ئیستا لە توانا دانیە،گەر ئیمکانیەت رەخسا بیری لیّ دەکەنەوە ٠

**چەند کوّبونەوەیەك بە ئەنجومەنی پاریزگای ستوکهولم**

•••••••••••

تا ئیستا پیوەندی نیوان فیدراسیوّن و ئەنجومەنی پاریزگای ستوکهولم بەرەو پیش نە دەچوو ،بەلام لە روّژی ١٩٨٧/١٠/٩ هەڤالان حەنەفی و جەمشید لە گەل سکرتیری بیانیان لە ئەنجومەندا کوّبونەوە٠ لە کوّبونەوەکەدا باسی کاروباری فیدراسیوّن کرا - هەروەها سکرتیری ئەنجومەن باسی کاری خوّیانی کرد، لە کوّبونەوەکەدا باسی هاوکاری کرا لە چەند باریکەوە یەك لە وانە : فیدراسیوّن ئینفارمەسوّن( خەبەر ) بە کوردی بلاوبکاتەوە بەتایبەتی ( دیا فیلم" سلاید" و کاسیتی ڤیدیو ) گەر ئەنجومەن ئامادەی بکا و فیدراسیوّنیش ئامادەیە لە ریگای کوّمەلەکانی شاری ستوکهولم ،ئەندامەکانی خوّی بە کارگزاری ئەنجومەن بناسینی ٠

سیّ کوّبونەوە لە روّژانی ١٠/٢٧، ١١/١٩ و ٤ ٨٧/١٢/١ کرا لە بارەی نەخوشی ئایدز AIDS ویارمەتی ئەنجومەن بوّ کوّمەلەکانی بیانی ٠ لەو کوّبونەوانەدا هەڤالان حەنەفی ونەبی خوّجە بەشدار بوون ٠

**کوّبونەوەیەك لەگەل دایرەی بەریوەبەرایەتی کوّمەلایەتی "سوّسیال" SOCIAL Styrelsen**

••••••••••••••••••••••••••••••••

لە مانگی ١١-ی ١٩٨٧ کوّبونەیەکی دوو روّژی لە سەر نەخوشی ADIS بوّ بەریوە- بەرایەتی کوّمەلایەتی ریکخرا ٠ لە کوّبونەوەکەدا ، نوینەرانی فیدراسیوّنی بیانیاکانان وحکومەتی سوید بەشدار بوون ٠ بابەت و مەبەستی کوّبونەوەکە ئەوەبوو ، بە چ جوّریك دەکریّ فیدراسیوّنی بیانیان ودەزگای دەولەتی سوید هاریکاری بکەن بوّ وشیار کردنەوە وئاگاداری کردن لە مەترسی ئەو نەخوّشیە ٠ هەڤال دجلە بە ناوی فیدراسیون بەشداری لە کوّبونەوەکەدا کرد ٠

**دوو کور لە ئوپسالا و یوتوبوری**

ئەندامی کوّمیتەی کارگیری فیدراسیوّن هەڤال جەمشید حەیدەری ،لەسەر داخوازی کوّمەلەی کوردستان لە ئوپسالا لە روّژی ٨٧/٣/١٤ کوریکی لە سەر میژووی روّژنامەگەری کوردی گیرا ،هەروەها لەسەر داخوازی کوّمەلەی کولتووری کوردستان لە یوتوبوری لە ١٩٨٨/١/١٦ کوریکی لەسەر ژیان و بەرهەمەکانی زانای مەزنی کورد عەلادین سەجادی گیرا ٠

**شەویك بوّ بەشدارانی کوّنفرەنسی پەنابەران**

لە روّژانی ١٤و١٥ /٩٨٧/١٠ کوّنفرەنسی سکەندیناڤیا لە بەرەی پەنابەران لە شاری ستوکهولم بەسترا ٠ لە زوّربەی شارەوانیەکانی ولاتانی سکەندیناڤیا بەشداریان تیدا کردبوو ،ژمارەی نوینەران ٨٠٠ کەس بوو ٠ فیدراسیوّن بوّ بەشدارانی ئەو کوّنفرەنسە شەویکی کوردی ئامادەکرد ٠ لە ئاهەنگی ئەو شەوەدا کوّماکوّڤەند هەلپەرکیّی کوردی پیشکەش میوانان کرد ،هەروەها کوّمەلەی

www.arsivakurdi.org

**کۆمەڵەی کولتووری کوردستان لە ترۆڵهاتن**

..............................

**کۆمەڵە کۆبوونەوەی گشتی خۆی لە رۆژی ٦/٧ /٩٨٧** کرد و هەڤالان حەنەفی وفوئاد وحەمید بە ناوی فیدراسیون لە کۆبوونەوەکە دا بەشداریان کــرد. کۆبوەکان بە گشتی بریاریان دا بێنە نێو فیدرا- سیۆن.

**کۆمەڵەی کولتووری ڤالشوپینگ**

.....................

لە رۆژی ١٩٨٧/٩/٣٠ کۆمەڵە کۆبوونەوەیەکــی گشتی پێك هینا ،نوێنەری فیدراسیۆن هەڤــــال حەمید بارزان بەشداری تێدا کرد. ئەندامانـــی کۆمەڵە بە تەواوی دەنگ بریاریان دا ،بێنە نێــو فیدراسیۆن .

**کۆمـەڵەی کـورد لە ئالفتا**

.....................

ئەلفتا ، شاروچکەیەکە نێزیك شاری بۆلنێس ،ئەو کوردانەی لە ئالفتا دەژیان،پێشان ئەندامی کۆمە- لەی بۆلنێس بوون. لە کۆبوونەوەی کۆمەڵەی کورد لە بۆلنێس لە مانگی حوزەیران دا ،بە ئامادەبوونی نوێنەری فیدراسیۆن هەڤال دجلە ،بریاریان وەرگرت کە کوردەکانی ئالفتا کۆمەڵەی تایبەتی خۆیــان دامەزرێنن - لە رۆژی ٢٧/ ٦ /٩٨٧ کۆمەڵەی کورد لە ئالفتا دامەزرا ،هەر لەو رۆژەدا کۆنگرەی کۆمە- لە بە تەواوی دەنگ بریاری دا بێتە نێو فیدراسیۆن. کۆمیتەی کارگێر لە کۆبوونەوەی رۆژی ٢٤/١٠/٨٧ داوای کۆمەڵەی ئالفتای قەبول کردو بە ئەندام وەریگرت.

**کۆمەڵەی کورد لە ئۆریبرۆ**

.....................

کۆمەڵەی کورد لە ئۆریبرو کۆنگرەی خۆی لە رۆژی ١٩٨٧/١٢/١٩ گرتو لە کۆنگەدا بریاروەرگیرا کە بێتە ئەندامی فیدراسیۆن. بەناوی فیدراسیۆن هەڤال حەنەفی بەشداری کۆنگرەکەی کرد .

**کۆمـەڵەی کـورد لە ئیسکلستوونا**

.........................

لە رۆژی ٩٨٧/١٢/١٩ کۆنگرەی خۆیان گرت ولــە کۆنگرەکەیان هەڤال حەنەفی بە ناوی فیدراسیۆن بەشداری کرد. ئەندامانی کۆنگرەی کۆمەڵەیکورد لە ئیسکلستوونا بە تەواوی دەنگ بریاریان دا بێنە نێو فیدراسیۆن .

**کۆمەڵەی کولتووری کوردی لە خواروی سوێد- لـونـد**

...........................

لە کۆنگرەی ئەو کۆمەڵەیەدا ،بەناوی فیدراسیۆن هەڤالان: جەمشید ،وریا و فوئاد بەشداریان کرد. کۆنگرە بــە تەواوی دەنگەکان بریاری هاتنە فیدراسیۆنیان دا .

**کۆمەڵەی کورد لە ئۆستەرشۆن،کۆمەڵەی کــــــورد لە ڤیستەرۆس و کۆمەڵەی دیموکراتیکورد لەئومیۆ ...**

کۆمیتەی گشتی لەرۆژی ١٩٨٧/١٠/١٧ دا هەڤال حەسنی قازی راسپارد ،کە پێشتر پێوەندی لە گەل چەند کۆمەڵەی لەو شارانەدا هەبوو ، بە ناوی فیدراسیۆن پێوەندی بکا لە گەل ئەو کۆمەڵەنە وزانیاریان لەبارەی فیدراسیۆن پێرابگەینێ ورێنوێنان بکا بۆ بەشداری کردن لە فیدرا- سیۆن . هەڤال حەسنی قازی چەند کۆبوونەوەیەکی لە گەل کۆمەڵە، شارەکانی : ڤیستەرۆس، ئۆستەرشۆن وئومیۆکرد و بارو هەلویستی فیدارسیۆنی بۆ شێ کردنەوە،هەر ســێ کۆمەڵە بریاریان وەرگرت بینە ئەندامی فیدراسیۆن.

**کـۆمەڵەی کـورد لە نۆرشۆپینگ**

.........................

لە مانگی حوزەیران دا هەڤال دجلە بە ناوی فیدراسیۆن لە کۆبونەوەی کۆمەڵەی کورد لە نۆر شۆپینگ ئامادە بوو ، بەلام کۆبوونەوەکە بریاری دا نەیتە فیدراسیۆن. لە دوای سەری سالی تازە ،کۆمەڵەی کورد لە نۆر شۆپینگ پێوەندی گرت لە گەل فیدراسیۆن وئامادەیی خۆی نیشان دا بیێتە ئەندام لە فیدراسیۆن، کۆمیتەی گشتی لە کۆبوونەوەی ٩٨٨/١/٣٠ ،کۆمەڵەی نـۆرشۆپینگی **بە ئەندام وەرگرت.** بەو جۆرە،لە دوای کۆنگرەی ٧ـی فیدراسیۆن ١١ کۆمەڵەی نــوێ بوونە ئەندامی فیدراسیۆن .

**کۆبونەوەیەك لە گەل کۆمەڵەی نووسەرانی سـوێد**

..............................

لە رۆژی ١٩٨٧/٩/٢٩ فیدراسیۆن کۆبونەوەیەکی کرد لــە گەل کۆمەڵەی نووسەرانی سوێد. نوینەرانی فیدراسیۆن داوایان لە کۆمەڵەی نووسەرانی سوێد کرد کەدەســـت پێشخەریبکەن بۆ ئازادکردنی خویندرو نووسینی زمانی کوردی . بارودۆخی کورد و مەسەلەی کوردستان بـــــو دەزگانێونەتەویەکان روون بکەنەوە. هەروەها فیدراسیۆن لە بارەی زانای هێژا ئیسماعیل بەشکچی زانیاری پێشکەش بە کۆمەڵەی نووسەران کرد و داوای لێ کردن لە نزیکەوە پێوەندی بە د. ئسماعیل بەشکچی بگرن .

نوێنەرانی کۆمەڵەی نووسەرانی سوێد گویان لەداخوازیە- کانی فیدراسیۆنگرت و رایان گەیاند کە ئەو مەسەلەیە

www.arsivakurdi.org

## پێشبركێ، فـۆلكلـۆری كوردی

## ــ ستۆكهـۆلـــــــم ۱۹۸۷

له ۱۹۸۷/۱۲/۲۰ پێشبركێی فۆلكلۆری كوردی له ستۆكهۆلم كرا • لەو خۆپیشاندانە دا نزیكەی ۱۳۰۰ كورد و سوێدی ئامادە بوون • فیدراسیۆن سێ چوار مانگ خەریكی ئامادەكردنی ئەو پێشبركێ یە بوو، و به نامە و بلاوكردنەوەی ئەفیش و ئاگاداری لـــــە بەربانگ بە خەلك راگەیاندرا • بۆ بەشداری كردن لەو پێشبركێ یە ۱۵ گروپی فولكلۆری ئامادە بوونی خۆیان بە فیدراسیۆن راگەیاند • گروپەكانیش ئەوانە-ن : كۆما ژنان، سیپان ،دیلان، شەنگال، سۆلاف، گۆڤەنـــــد ،هەندەران ،ئارارات،كۆما یۆتۆبۆری • بەلام كۆما شەنگال وئارارات وكۆما كۆمەلەی یۆتۆ- بۆری بۆیان نەكرا بەشداری لە پێشبركێ یەكە بكەن• دوای ئەوەی رۆژو كاتی پێشبركێ دیار كرا ،فیدرا- سیۆن دەستەی ژووری(تحكیم)ی دەست نیشان كــــرد لە ۷ كەس ،لەوانە ۵ یان كورد بوون و ۲ سوێدی • ناوی دەستەی ژووری : ئۆوڤێ رونستروم، ئیڤـــــور ئۆندیردال، محەمەد ،فەرهاد ،بیریڤان، نەدیم و م• لەوەندی• ژووری لەكۆبونەوەی یەكەمی دا ،مەرج و پێوانی پێشبركییەكەی دیار كردو بە نآمە هەموو گرەپەكانی بە چۆنیەتی مەرجەكان ئاگادار كــــرد•

ئەركی پێشكەش كردنی پێشبركی خرایە ئەستۆی كاك عـومەر شێخموس • بۆ بەشدارانی پێشبركێ سێـــــێ خەلات دانرا بوو ،بەپێی زانایی وكۆ كردنەوەی زورترین خال دابەش كرا : خەلاتی یەكەم ۵۰۰۰ هەزار كرون بوو و كۆما گـۆڤەند وەریگرت، خەلاتی دووەم ۳۰۰۰ كرۆن بە كۆما دیلان بەخشرا ، خەلاتی سێیەم ۱۰۰۰ كرۆن بە كۆما كۆمەلەی ژنان بەخشرا • هەروەها كۆما زارۆكانی كۆمە- لەی بۆلنیێس كاسی تایبەتی پێ درا ، كۆماكانی تریش یەك و كاسێكیان درایێ • هونەرمەندان گولستـــــــان و شـــڤان بە گورانی كوردی بەشداریان كر،د وەك میێوان لە ئاهەنگە كەدا بەشدار بوون •

### فیستیڤالی فوورلیڤكا

«فیستیڤالی گۆرانی» هەموو هاوینێك له شاری فوورلیكا رێكدەخرێ. گۆرانی بێژی به ناوبانگ له هەموو جیهانەوە بەشداری دەكەن.

هەروەها میللەتانی تریش بە گۆرانی و دیلانی خۆیان بەشداریی تێدا دەكەن. كورد له سوێد، بۆ یەكەمجار سالی رابوردوو بەشداریی فیستیڤالی فوورلیڤكایان كرد. ئەمسالیش وەك پار كۆمەلەی كوردیی بۆلبەس بەشداریی فیستیڤالیان كرد، بە پێشانگای دەستكردی كوردی (چنین، دوورین .... هتد) و خواردەمەنیی كوردی بۆ میوانەكان پێشكەش كرا، هەروەها بەیارمەتی فیدراسیۆن، كۆما گۆڤەند و كۆما زارۆكی كوردی له بۆلنەس بە هەلپەركێ و گۆرانی بەشداریان كرد، كە سەرنجی میوانانی فیستیڤالی بۆ راكێشا.

### ئەو كۆمـەلانەی نوێ بە ئەندام وەرگیران

---

كۆمیتەی كارگێر لە كۆبوونەوەی دووەمی خۆیـدا بـــە دوورو درێژی لە باری كۆمەلەكانی نوێ دوا • بۆی دەركەوت كە زۆربەی شارەوانیەكانی سوێد كوردی لێ دەژین، لـــە هەندێ شارەوانی كۆمەلەی كوردی هەیە ،بەلام پێوەندی بە فیدراسیۆنەوە نیە ، یاخود لە هەندی شآرەوانی كورد هەن، بەلام كۆمەلەی تایبەتی خۆیان نیە • كۆمیتەی كارگێـــر بە پێویستی زانی پێوەندی بكا لەگەل كوردە ئاوارەكان لە هەر ناوچەیەك بن• بە تایبەتی ئەو كۆمەلەنەی لـــــە دەرەوەی فیدراسیۆن ماون و رێنوێنیان بكا ، بۆ ئەم مەبە- ستەش كاك جەمیل هەلبژاردرا بە بەرپرسیاری پێوەندی لە گەل كۆمەلەكان •

ئـــە و كۆمـەلانەی دوای كـۆنگـرەی "۷" بوونـــــــە ئەنـــدامـــی فیـدراسیـۆن •

---

### كۆمەلەی كولتووری كوردستان لە یون شۆپینگ

..............................

لە رۆژی ٤/٥ /۱۹۸۷ كۆنگرەی خۆیان گرت و هەڤالان جەمیل و وریـا و فــوئـاد بە ناوی فیدراسیۆن بەشداری كۆنگرەكەیان كرد • لەكۆنگرەدا بەتەواوی دەنگ بەشدا- ران بریاریان دا كۆمەلەكەیان ببێتە ئەندامی فیدراسیۆن•

www.arsivakurdi.org

کۆبونەوەی ئەنجومەنی بیانیان:

ئەنجومەنی بیانیان لە لێپرسیاری فیدراسیۆنی بیانیان بە سەرۆکایەتی وەزیری بیانیان گیۆرگی ئەندرسۆن پێک دێ، سالی سێ ـ چوار جار کۆدەبێتەوە بۆ لێدوان لە کێشەی رۆژانەی بیانیان.

رێکخراوی بیانیان لەو کۆبونەوانەدا داخواز و رامانی خۆیان بە حکومەتی سوێد رادەگەێنن، لە هەمان کاتیشدا حکومەتی سوێد بیروڕای ئەو رێکخراوانە وەردەگرێ لە بارەی سیاسەتی خۆی.

ئەنجومەنی لەنێوان سێ چوار سالْ جارێک لەگەلْ هەموو رێکخراوەکان کۆبونەوە رێک دەخا بۆ لێکۆلینەوە و لێدوان لەسەر مەسەلە گرنگەکانی بیانیان.

ئەم سالْ، لە ۲۲ـ۲۲ مانگی ئەیار (مای) ئەنجومەنی بیانیان کۆبونەوەی خۆی لە شاری «لوکسێلە» ـ شاری وەزیری بیانیان گیۆرگی ئەندرسۆن ـ بە بەشداری ۱۰۲ نوێنەرانی فیدراسیۆن و رێکخراوەـ کانی سوێدی و دەستگاکانی دی بەست.

لەم کۆبونەوەیەدا سێ مەسەلەی گرنگ باس کرا:

ـ بەشداربونی بیانیان لەپرۆسێسی دیموکراتیدا.

۱ـ چۆن مرۆڤ دەتوانێ بە هاوکاری بەرپرسیار بێ لە جێگرتن و سەنگ دانی مەسەلەی بیانیان. ئاشکرا و نائاشکرا.

۲ـ چۆن دەتوانرێ بە بەشداریی فراوانی بیانان لە کاروباری شاراوانی و دەولەتدا. ئاشکرا و نائاشکرا.

۲ـ بیانیان چۆن دەتوانن شوێنی خۆ بگرن لە رێکخراوەکانی کۆمەلایەتی سوێدیدا. ئاشکرا و نائاشکرا.

ـ مەسەلەی ئەوەی نوێ (نەسلی نوێ).

۱ـ چۆن مرۆڤ دەتوانێ کەسایەتی (شەخسیەت) و رەوشتی لاوانی بیانی لە کۆمەلگەی سوێددا بە لاوانی سوێدی بتەو تر بکا.

۲ـ مرۆڤ چۆن دەتوانێ دەرەتانێ بۆ لاوانی بیانی پێکبێنێ بۆ ئەوەی بە ئاسانی کار بدۆزنەوە.

۲ـ کۆمەلگەی سوێد چۆن دەتوانێ سوود لە ئەوەی نوێ (ئەو بیانیانەی لێرە پێدەگەن) و خاوەن خاوەن ئەزمونی کولتوری و زانینی دوو زمانن وەردەگرێ.

ـ مەسەلەی خانەنشین (تەقاویت) کردنی بیانی

۱ـ چی دەربارەی خانەنیشینی بیانیان دەزانین؟

۲ـ چۆن مرۆڤ سوود لە دەرەتانی خانەنیشینی بیانیان وەردەگرێ؟

۲ـ چۆن مرۆڤ دەتوانێ بیانی خانەنیشین لە تەنیایی رزگاربکا؟

٤ـ چۆن مرۆڤ دەتوانێ تارمەتی خانەنیشین کراوە بیانییەکان بکا، ئەگەر زمانی سوێدی نەزانن.

٥ـ چی پێویستە بکرێ بۆ لەنێوبردنی جیاوازی لە نێوان ئەوەی کۆن و نوێدا؟

هەر مەسەلەیەک لەو مەسەلانەی سەرەوە بەوتاری نوێنەرانی رێکخراوەکانی بیانی و لێکۆلینەوەی سوێدییەکان دەستی پێکرد. پاشان کاروبار دابەشکرا بەسەر چەند گروپێک. لە رۆژی کۆتاییدا کۆی پێشنیارە کۆنگرێتەکان پێشکەش بە کۆبونەوە کرا.

سیمینارێک لەلایەن زانای هێژا «جویس بلۆ»

لەم هاوینەدا کوردناسی هێژا «جویس بلۆ» بە سەردان هاتبووە ستۆکهۆلم. بە دەرفەتی زانی سەر لە فیدراسیۆنی کوردی بدا. لێپرسراوی فیدراسیۆن باسی کاروباری فیدراسیۆنی بۆ کرد وئەویش دەربارەی کارە زانیستییەکانی لەبواری کوردناسی بۆ لێپرسراوانی فیدراسیۆنی باسکرد.

لەسەر داخوازی فیدراسیۆن «جویس بلۆ» لە رۆژی ۱۸ـ۷ـ۱۹۸۷ کۆرێکی گێرا دەربارەی زاراوی لور لە زمانی کوردیدا. لەم کۆرەدا نیزیکەی (۷۰) کەس بەشداریان کرد، «جویس بلۆ» بە زمانی ئینگلیزی دەپەیڤا و کاک حەسەنی قازی وەری دەگێرایە سەر زارادی کرمانجد خواروو. ئاخافتنەکە لە لایەن فیدراسیۆنەوە تۆمارکراو و لە ژمارەکانی داهاتووی «بەربانگ» دا بلاودەکرێتەوە.

www.arsivakurdi.org

له کۆبوونەوەی تێگرایی‌یش دا بەردەوام بوو . یێك هێنانی ڕۆژی زانیاری سەبارەت بە کوردان لە کۆمۆنەکان دا یەك لە خاڵەکانی ئەو لێدوانە بوو . کاوکۆ هۆلۆپاینێن فەرمانبەری دەزگای کاروباری بیگانان و دجلە قزڵ ، سکرتێری ماڵی فێدراسیۆن لە سەر هاتنی کەس و کاری پەنابەران بۆ سوێد وتاریان پێشکەش کرد . لەو بارەیەوە کاوکۆ هۆلۆپاینێن لایەنی بیرۆکراتیکی ئەم بابەتەی شی کردەوە ، وەك چلۆنایەتی داوا کردنی هاتنی کەس و کاری پەنابەران و باری قانوونی ئەم کارە و شێوەی بەڕێوەچوونی لە پراتیك دا. بە دوای وی دا دجلە قزڵ سەبارەت بە دژواری و ئاستەنگی یەی کە خاو وخێزانی پەنابەرانی کورد تووشی دێن هاوبەشانی سێمیناری ئاگادارکرد . لەو وتارە دا شی کرایەوە کە زۆر جار بنەماڵەی کورد خۆیان دەخەنە بەر مەترسی یەکی زۆر بۆ ئەوەی بتوانن لە وڵات دەرکەون و بەکەس وکاری خۆیان شاد و شکور بن . بەم وتارانەی سەرەوە دەمەتەقەی ڕۆژی یەکەمی سێمینار دوایی‌یان هات . بە پێی بەرنامەی سێمینارەکە واداندرابوو کە ئێوارەی یەکەم ڕۆژی سێمینار فەرهەنگ و هونەری کوردی پێشکەشی ئامادەبوان بکرێ . جا بۆیە لە سەر داوای فێدراسیۆن ، دەنگبێژانی بە ناوبانگی کورد ، شڤان و گولستان لە شێوی ئێوارێ دا هاوبەش بوون و گۆرانی کوردیان بۆ میوانان گوت .

رۆژی دووهەم :

کاروخەبات بۆ زمانی کوردی لە سوێدێ ـ لە لایەن سیڤ نوردێل ، نوێنەری ئەنستیتۆی دەوڵەتی بۆ ئامادەکردنی کەرەستەی خوێندن و ئامۆزشی پێشکەش کرا . لەم بارەیەوە سیڤ نوردێل باسی ئەو خزمەت و دەستیاوی یەی کرد کە دەوڵەتی سوێدێ بۆزمانی کوردی کردوویە . ناوبراو گرنگی بەرەو پێش بردن و گەشەپێدانی ئەم ئەرکەی دووپاتە کردەوە . دۆخی زمانی کوردی لە وڵات ، کێشەی دیلمانج و مامۆستای کورد لە سوێدێ وتارێك بوو کە لە لایەن کەمیا ئیزۆل سکرتێری فێدراسیۆنێ پێشکەش کرا . لەو وتارە دا زمانی کوردی و زاراوەکانی ، شوێنی پاوان بوونی زمانی کوردی لە کوردستانێ لە سەر پێشوەچوونی منداڵانی کورد ، پەروەردە کردن و بارهێنانی مامۆستایان لە سوێدێ بۆ دەرس دادانی زمانی کوردی و ئەو خەبات و هەوڵانەی کە بۆ دیلمانجە کوردەکان دراوە هاتە بەر باس و لێکۆڵینەوە . کورتە مێژووی ڕێکخراوی کوردی لە سوێدێ لەلایەن حەنفی جەلەپلی پێشکەش کرا . لەو وتارە دا باس کرا کە کورد کەنگێ ، لەبەرچی و لە کامە پارچەی کوردستانەوە هاتوونە سوێدێ ؟ خەبات و تێکۆشانی ڕێکخراوەیی ئەوان کەنگێ دەستیپێکردووە و بە چ پلە و قوناخان دا تێپەڕیوە و فێدراسیۆنی کوردی کەنگێ ساز بووە و چی کردووە ؟ خەباتی کۆمەڵەی فەرهەنگی کوردستانێ لە یۆتەبۆری لە لایەن خالیدی سالح نوێنەری ئەو کۆمەڵەیە باسی لێوە کرا . ئەو لە وتاری خۆی دا باسی هاوکاری کۆمەڵەی فەرهەنگی کوردستانێ و کۆمۆنی یۆتەبۆری هێنایە گۆڕێ . بۆچوونی کۆمۆنێك لە سەر شێوەی هاوکاری لە گەڵ کۆمەڵە بیانی یەکان لە لایەن یای گودروون مۆلاندر نوێنەری کۆمۆنی سوندسڤال هاتە گۆڕێ . لەو وتارە دا سەبارەت بە گرینگ بوونی ئەو هاوکارییە تەئکید کرا . گودروون لە وتاری خۆی دا ئاشکرای کرد کە هاوکاری کۆمەڵە بیانی یەکان کار و ئەرکی کۆمۆنەکان هاسانتر دەکا و پێویستە هەموو کۆمۆنێك بە شێلگیری و پتەوی هاوکاری ئەم چەشنە کۆمەڵانە بکا . بەو بابەتانە سێمینار دوایی بە کاری خۆی دا . لەو دوو ڕۆژانە دا هاوبەشانی سێمینار چالاکانە لە دەمەتەقە و لێدوانەکان دا بەشدار بوون و لە کۆتایی کاری سێمینار دا ڕەزامەندی تەواوی خۆیان ڕاگەیاند . لە هۆڵی سێمینارەکە دا نوێنەگایەك لە کاری دەستی و چنراوی کوردستان و هەر وەها وێنە ڕێکخرابوو . ئەم کۆمۆنانە لە سێمینار دا بەشدار بوون : بۆلنیز ، ئێسکیلستوونا ، فالشۆپینگ ، هودینگێ ، کارلستاد ، کاترینە هۆلم ، لیندێسبەری ، لینشۆپینگ شۆڤدێ ، سوندسڤال ، ئومێئۆ ، ڤێسترڤیك و ئۆیسترشووند . هەر وەها نوێنەرانی کۆمەڵەی فەرهەنگی کوردستان لە یۆتەبۆری و کۆمەڵەی فەرهەنگی کورد لە باشووری سوێد لە سەر لێگێڕانەوە و بانگهێشتنی فێدراسیۆن لە سێمیناری دا هاوبەش بوون .

## سێمینارێك بۆ فەرمانبەرانی کۆمۆنان

لە ڕۆژانی ٨ و ٩ ی مانگی ئۆکتۆبەر دا ، لە شاری ئێسکیلستونا سێمینارێکی دوو ڕۆژی لە سەر مەسەلەی کورد و وەزعی پەنابەرانی کورد بە هاوکاری فێدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانی یەکان لە سوێدێ ، دەزگای کارو باری بێگانان و کۆمۆنی ئێسکیلستونا پێك هات . لە بەهاری ساڵی ٨٧ وە فێدراسیۆن داوای لە دەزگای کاروباری بێگانان کردبوو کە بەیەکەوە سێمینارێك لە سەر مەسەلەی کورد بۆ فەرمانبەرانی کۆمۆنەکانی سوێدێ ڕێك بخەن . چونکوو لەو ساڵانەی دوایی دا گەلێك پەنابەری کورد هاتوونە سوێدێ و لە کۆمۆنی ئەوتۆ نیشتەجێ بوونە کە ئاگادارێکی زۆریان سەبارەت بە کوردان نەبووە ، فێدراسیۆن بە پێویستی زانی کە فەرمانبەری ئەو جۆرە کۆمۆنانە سەبارەت بە مەسەلەی کورد زیادتر بزانن و ئاگادارییان هەبێ . دەزگای کاروباری بێگانان ئەم داوخوازەی فێدراسیۆنی بە جێ لێك دایەوە و وای بە باش زانی کە کۆمۆنێکی سوێدیش لە ئامادە کردنی سێمینارێکی ئەوتۆ دا هاوبەشی بکا . ئێمە و دەزگای کاروباری بێگانان بۆ ئەو مەبەستە کۆمۆنی ئێسکیلستونامان بە موناسیب زانی و ئەو کۆمۆنەش ئەم پێشنیارەی سەلماند . بۆ تەدارەکی سێمینارەکە لە هەر لایەنێکەوە کەسێك دیاری کرا و کۆمیتە یەك دامەزرا و ئەو کۆمیتەیە ڕێکخستنی سێمینارەکەی وە ئەستۆ گرت . دوای هەوڵ و تێکۆشانێکی باش لە لایەن کومیتەی ناوبراو ڕا سێمینارەکە لە ڕۆژانی ٨و ٩ی مانگی ئۆکتۆبەر لە ئێسکیلستونا لە کۆشکی سوندبی هۆڵم ــ ئەو کۆشکە لە سەدەی ١٦ هەم ساز کراوە ــ پێك هات . لە سێمیناری دا ٣٥ کەس هاوبەش بوون ، نوێنەری ١٣ کۆمۆنان ، نوێنەری حکومەت ، نوێنەری ئەنستیتوی دەوڵەتی بۆ ئامادە کردنی ماتریالی ئاموزشی ، و نوێنەرانی دەزگای کارو باری بێگانان .

ڕۆژی یەکەم :

<u>باری ئێستای کوردستان</u> ، ئەم باسە لە لایەن حەنەفی جەلەپلی ، سەرۆکی فێدراسیۆن هاتە گۆڕێ . حەنەفی لە وتاری خۆی دا چلۆنایەتی کۆمەڵایەتی ، ئابووری و بە تایبەتی باری سیاسی ــ ئەو زوڵم و زۆرەی کە لە گەلی کورد دەکرێ ــ لە هەر چوار پارچەی کوردستان شی کردەوە . هەر وەها باسی ئەو تەنگاسی و دژوارییەی کرد کە کاتێ پەنابەرەکوردەکان ناچار دەبن کوردستان بە جێ بهێڵن توشی دەبن . ئالار کوتمان فەرمانبەری کۆمۆنی ئێسکیلستونا لە سەر <u>کورد لە ئامرازی ڕاگەیاندنی گشتی سوێد دا</u> دوا . ئالار لە وتارەکەی خۆی دا باسی ئەو سپیکولاسیۆن و دردۆنگی یەی کرد کە لە ئامرازی ڕاگەیاندنی گشتی سوێد دا سەبارەت بە کوردان بڵاودەکراوە کاتێ هێنانە گۆڕی کارەساتی کوشتنی ئۆلۆف پالمێ . لێرە دا دیاری کرا کە لەم بارەیەوە کوردەکان ناهەقی یەکی زۆریان لێکرا . <u>بۆچوونی کوردان لە دژی سپیکولاسیۆن و لێ دردۆنگ بوونی ئامرازی ڕاگەیاندنی گشتی سوێد</u> لە لایەن هۆمەر شێخمووس لێکۆلەرەوە و توێژەری کورد لە زانستگەی ستۆکهۆڵم پێشکەش کرا . لەو وتارە دا سەبارەت بە بزووتنەوە و ئاکاری دەوڵەتە داگیرکەرەکانی کوردستانێ لە حاست کوردان ، بە تایبەتی لە دەرەوەی وڵات تەرکیز کرا . لە سەر ڕاونان و زەبرو زەنگی ئەو دەوڵەتانە ــ تیرۆر و بەندو بەست ــ دژی کوردان چ کاتێ ڕوویان داوە و لە کوێ کراون هاوبەشانی سێمینار ئاگادار کران . هۆمەر لە وتاری خۆی دا ئەو واهیمە و ترسەشی لێکاڵاکردەوە کە سپیکولاسیۆنی ئامرازی ڕاگەیاندنی گشتی سوێد بە بۆنەی کوژرانی ئۆلۆف پالمێوە لە نێو کوردان دا سازی کردبوو . دوای ئەو خاڵانە ، کاری گرووپی دەستپێکرد . بابەتی لێدوان و کاری گرووپی ئەمە بوو : لە کۆمۆنەکان دا پیاو دەتوانێ چ کارێك بۆ کوردان بکا ؟ ئەو سەر باسە لە پێنج گرووپ دا قسەی لێوەکرا و لێدوان و دەمەتەقە لەم بارەیەوە

www.arsivakurdi.org

نەوروز له کارلسکوگه، سوند سڤال، سۆدەرهامن، ئۆپسالا، ئیسکولستونە و بۆلنچس. دوای ئاهەنگی نەوروز، کۆمیتەی کارگێڕ هەندێ کەم و کورتی دەست نیشان کرد له ئاهەنگەکاندا.

له نەوروزی ستۆکهۆلمدا نزیکەی ۱۰۰۰ کەس بەشداری کرد

## بانگ کردنی «بەربانگ» لەلایەن «ئینستیتیوی پاریس»ەوە

ئینستیتیوی کوردی له کۆتایی نیسان کۆبوونەوە-یەکی بۆ زمانی کوردی پێک هێنابوو، بۆ ئەو مەبەستەش نوێنەری «بەربانگ» بانگ کرابوو.
دەستەی نووسەران بڕیاریاندا کە کاک رەشۆ زیلان بەناوی «بەربانگ»ەوە بەشداری کۆبوونەوەکە بکات.
کۆبوونەوەکە له کەتەلۆنە، پایتەختی بەرشلۆنە کرا بۆ ماوەی حەوت رۆژ. ئەو کارەی ئەنجام درابوو لە کۆبوونەوەکە لە «بەربانگ»دا بلاوکرایەوە.

## ئیستیڤالی ئاشتی ئەسکەندەناڤیا

له ٢٤- ٢٨ی مانگی حوزەیران (یونی) له شاری ستۆکهۆلم ئیستیڤالی ئاشتی جیهانی سازکرا. فیدراسیۆنی کۆمەلە کوردستانییەکان و کۆمەلەی کوردی له ستۆکهۆلم له تەک ڕێکخراوە-کانی سوێدی و بیانیان بەشداری تێدا کرا.
ئەرکی ڕێکخستنی ئیستیڤال و بەشداری له پرۆگرامەکان خرابووە ئەستۆی نێزیکەی دووسەد ڕێکخراوی بیانی و سوێدی هەمەجۆرە.
فیدراسیۆنی کوردیش شوێنی بۆ تەرخان کرابوو لە تەک ڕێکخراوەکانی نێونەتەوەییدا، لە خێوەتی فیدراسیۆندا، پێشکێش بە میوانان دەکرا و بەشداری چالاکی دیشی دەکرد، وەک کۆڕ و دەمەتەقێ و پروپاگەندە بۆ مەسەلەی کورد.
لە دوو کۆڕی ئیستیڤالدا فیدراسیۆن بەشداری دەمەتەقێی کرد لەسەر باری ئێستای کوردستان و ڕەوشتی پەنابەران. لەو دوو کۆڕەدا سکرتێری فیدراسیۆن هەڤاڵ «کەیا تیزۆل» بۆچوون و رامانی فیدراسیۆنی بە بەشدارانی کۆڕەکانی ڕاگەیاند. وەلامی پرسیاری زۆر کەسی بیانی و سوێدی دایەوە. هەروەها لە سێ جێدا گروپی، فۆلکلۆری و کۆما ژنانی دیموکراتی کوردستان و کۆما زەنگال هەلپەرکێ و دیلانی کوردیان پێشکێش کرد. هەلپەرکێ و دیلانی ناوچەی دیاربەکر و هەکاری سەرنجی میوانانی ئیستیڤالی ڕاکێشا و بە جۆرێک کە سەدان لە میوانەکان بەشداریان لە گۆرانی و هەلپەرکێی کوردیدا کرد.
ئەوەش دەبێ بگوترێ کە ئەندامانی کۆمەلەی کوردی ستۆکهۆلم لە هەموو ڕۆژانی ئیستیڤال بە چالاکی بەشداریی هەموو کارەکانیان کرد.

## هەفتەی دۆستایەتی

ئەمساڵ وەزیری بیانیان گیورگی ئاندرسۆن پێشنیاری سوێد و بیانیانی کرد کە هەفتەی ٢١ واتە ڕۆژی ١٨_٢٤ی ئایار بکرێتە هەفتەی دۆستایەتی، بۆ بەهێزکردنی دۆستایەتی لە نێوان سوێدی و بیانیان. لەو هەفتەیەدا ڕێکخراوەکانی سوێدی و بیانی بەهاوکاری و پێکەوە گەلێک جموجوولی کولتیری و کاروباریان پێکەوە کرد.
لە ڕۆژی ٢١ی ئایار، کاتژمێری ١٧_١٩ لە گۆڕەپانی سێرگلس تۆری لە ستۆکهۆلمدا، فیدراسیۆنی ئێمە بە بەشداری کۆما (تیپ) گۆڤەند، زەنگال و کۆمەلەی ژنان چەند هەلپە-ڕکێیەکی ناوچەی دیاربەکر و هەکاری و وانیان پێشکەش کرد، هەروەها لەو گۆڕەپانە دروشمێکی گەورە هەلواسرابوو بە دوو زمانی کوردی و سوێدی لە ژێر ناوی: «دۆستایەتی، هاوکاری و پشتگیری»

بۆ ساڵی ١٩٨٨ بڕیار وەرگیراوە کە هەفتەی دۆستایەتی ڕێکخرێت، بۆ ئەو مەبەستەش لە ئێستاوە دەست کراوە بە ئامادەکردن. فیدراسیۆنی ئێمەش بەشداری دەکا و هەڤاڵ کهیا لە کاروباری ئامادەکردن،بە ناوی فیدراسیون بەشدارە.

www.arsivakurdi.org

باران کردنی کوردستانی عێراق و چەوسانەوەی گەلی کورد.
رۆژنامە گەورەکانی سوێد ـ داگز نیوهێتەر و سفێنسکە داگ بلادت و رادیوی سوێد دەنگ و باسی ئەو خۆپیشاندانەیان بلاوکردەوە.
بەلام تەنها «٢٥٠» کەس لە خۆپیشاندانەکەدا بەشداریان کرد!

## یادی یەکەمی کوشتنی ئۆلوف پالمە

٢٨ی شوبات، سالێک تێدەپەڕی بەسەر کوشتنی سەرۆک وەزیرانی سوێد ئۆلوف پالمە. بەم بۆنەیە پارتی کرێکارانی سۆسیال ـ دیموکراتی لە هەموو سوێد خۆپیشاندانیان رێکخست.
فیدراسیۆن ئاگاداری هەموو کۆمەلەکانی ئەندامی کرد لەم بارەیەوە. لەبەیانی ٢٨ی شوبات کۆمیتەی کارگێڕ ونوێنەرانی کۆمەلەی ستۆکهۆلم باقەگولیان بردە سەر گۆڕی ئۆلوف پالمە و هەروەها ئێواریَ بەشداریان کرد لە خۆپیشاندانەکەیانیان و دوو نامەشیان بلاو کردەوە و رەوانە کرا بۆ خێزانی ئۆلوف پالمە و پارتی کرێکارانی سۆسیال دیموکرات.

## کۆبوونەوەی

(١٩ـ ٢٠ ئادار) Stora Referensgruppen

ئەو کۆبوونەوەیە هەموو سالێک لەلایەن دەزگای بێگانەکان ـ SIV پێک دەهێنریَ، بە بەشداری نوێنەری فیدراسیۆنی بێگانەکان بۆ لێکۆلینەوە لە سەر باری بێگانەکان.
کۆبوونەوەی ئەمسالَ بۆ بازاری کاری بێگانەکان تەرخان کرابوو. لەم کۆبوونەوەیەدا بەرپرسیاری LO, AMI, AMU, Arbetsförmedling هەروەها بیرۆی بێگانەکان Socialförvaltning بەشداریان کرد.
سکرتێری فیدراسیۆن هەڤال کەیا بە ناوی فیدراسیۆن بەشداری کۆبوونەوەکەی کرد.
گفتوگۆ و لێدوان لەسەر باری بێگانەکان کرا و چەند پرسیار و داخوازی فیدراسیۆنی بێگانەکان پێشکەش کرا. کۆبوونەوەکە دوو رۆژی خایاند.

## فیدراسیۆن داوای کردنەوەی رادیۆی کورد دەکا

پەخشی رادیۆ و تەلەفزیۆن لە سوێددا بە زۆر زمانی بێگانە بلاودەکرێتەوە، رادیۆ و تەلەفزیۆنی سوێد بە گوێرەی زۆریی گروپەکانی بیانی و رەوشتیان پرۆگرام ئامادە دەکا و بلاو دەکاتەوە.
تا ئێستا هەرچەند گروپی کوردی بە ژمارە زۆرن، بەلام هیچ پرۆگرامێکی تایبەتیمان بۆ تەرخان نەکراوە.
لە رۆژی ٨/٢٧دا لێ پرسیاوی فیدراسیۆن و بەرپرسیاری رادیۆ و تەلەفزیۆنی سوێد کۆبوونەوەیەکیان کرد، فیدراسیۆن لەم بارەیەوە داخوازی خۆی پێشکەش کرد. لەم چاوپێکەوتنەدا بە دوور و درێژی باسی کورد کرا لە سوێد و پێویستی دانانی پرۆگرامی رادیۆ و تەلەفزیۆن بە کوردی. لە کۆتایی چاوپێکەوتنەکەدا بە رپرسیاری رادیۆ و تەلەفزیۆنی سوێد ئەوەی

نیشاندا، کە ئەوان گەیشتوونەتە ئەو بڕوایە کە پرۆگرامی رادیۆ و تەلەفزیۆن بۆ گروپی کورد گرنگ و پێویستە. بەلام لەبەر هۆی تەکنیکی و رێکخستن بۆیان ناکریَ بەرلە سەری سالَ بڕیاری وەرگرن لەم بارەیەوە. هەروەها داوای لە فیدراسیۆن کرد بەر لەسەری سالَ جارێکی تریش کۆبوونەوە بکەن.

## . نەورۆز

ئەمسالَ جەژنی نەورۆز لە زۆربەی شارەکانی سوێد کرا وەک: ستۆکهۆلم، ئۆپسالا، سوندسڤال، بۆلنچس، ئیسکورلستونە، کارلسکرگە، سۆدەرهامن یۆتۆبۆری، لوند، یۆن شۆپینگ و لە هەندیَ شارۆچکەی تریش ئەو یادە بەپێی توانا کرا.
دوای کۆنگرەی حەوتەم لە ستۆکهۆلم دەست کرا بە خۆئامادە کردن بۆ یادی نەورۆز، هەرچەند کۆمیتەی نەورۆز پێش کۆنگرە دامەزرابوو، بەلام دوای کۆنگرە، دوو هەڤالَ وازیان لە کۆمیتەی نەورۆز هێنا، جا هەڤال کەیا راسپێردرا کە کۆمیتەیەکی نویَ بۆ ئەو مەبەستە دامەزرێنن.
کۆمیتەکە لە حەوت کەس پێک هاتبوو، نوێنەری کۆمەلەکانی دەوراوپشتی ستۆکهۆلم بەشداریان تێداکرد.
لە ئاهەنگی نەورۆز و پرۆگرامی نەورۆزدا لە ستۆکهۆلم و ئۆپسالا جوان حاجو، دەلال، رێناس، کۆمە گۆڤەند، کۆمە ژنان و کۆمە ئالان بۆتان بەشداریان کرد. هەروەها بەیارمەتی فیدراسیۆن کۆمە گۆڤەند بەشداری کرد لە ئاهەنگەکانی

www.arsivakurdi.org

پەرلمانتێری سکاندناڤیا و نوێنەرانی کۆمەڵەی نەتەوە یەکگرتووەکان ئامادەبوون.
سەرۆکی فیدراسیۆن پێوەندی لەگەڵ زۆربەیان گرت و سەرنجی بۆ مەسەی کورد راکێشان.

کۆبوونەوەیەک لەگەڵ کۆمەڵەی بەرگری مەدەنی

Civilförsvarförening

له رۆژی ٢٤/ئاداردا له یۆنشۆپینگ کۆبوونەوەیەک رێکخرا له نێوان کۆمەڵەکانی بێگانە و کۆمەڵەی بەرگری مەدەنی. نوێنەری فیدراسیۆن بەشداری ئەو کۆبوونەوەیەی کرد.
فیدراسیۆن و کۆمەڵەکانی بێگانە ئەو کۆبوونەوە و کارەیان پەسەندکرد.

کاروباری راگەیاندن

دوای کۆنگرەی حەوتەم لە زۆر کەس و لایەی سوێدیەوە داوای دەنگ و باسی کوردمان لێ کراوە. تا ئێستا داخوازی (١٠) دەکەس و لایەن

له شارەکان جێبەجێ کراوە وەک: Stefantorp, Söderhamn, Jönköping, Stockholm, Umeå Göteborg, Östersund,

بۆ قوتابخانە و شارەوانیەکان رەوانەکراوە.
ـ لە رۆژی ٢٨/نیسان لە شاری ئێستەرۆس سمینارێک لەسەر باری کوردستان بۆ قوتابیانی پۆلی شەش و حەوت رێکخراوە، لەو سمینارەدا دوو نوێنەری فیدراسیۆن بەشداریان کردووە و لەسەر باری منداڵانی کورد دواوون.
ـ له رۆژی ٥/٦ [١٩٨٧/١١/٣] لە شاری ستۆکهۆلم سەرۆکی فیدراسیۆن رۆژێک دەرزی وتوەتەوە بۆ کارگێڕ و کرێکارەکانی دەزگای سۆسیال لەسەر باری کوردستان.

کۆبوونەوەیەک لەگەڵ کۆمەڵەکانی ئەندامی فیدراسیۆن

لە رۆژی ١٩٨٧/٤/١٩ کۆمیتەی کارگێڕانی فیدراسیۆن کۆبوونەوەیەکی پێک هێنا لەگەڵ نوێنەرانی کۆمەڵەکانی ئەندام. هەردوولا ئاڵوگۆڕی دەنگ و باس و چالاکی خۆیان کرد. هەروەها لە بارەی خۆئامادەکردن بۆبەشداری کردن لە جێژنی نەیاردا. له ماوەی ساڵێکدا نزیکەی ٧ ـ ٥ جار کۆمیتەی کارگێڕ کۆبونەوەی لە کۆمەڵەکانی ئەندام کردووە .

یەکی ئایار

ئەمساڵ ئەندامانی کۆمەڵەکانی فیدراسیۆن بەچالاکی بەشداری جێژنی یەکی ئایاریان کردووە و دروشمی خۆیان بەرز کردۆتەوە دژی حکومەتە داگیرکەرەکان و بەیاننامەیان بڵاوکردۆتەوە. لە ستۆکهۆلم ئەندامانی فیدراسیۆن لە ژێر دروشمی فیدراسیۆن بەشداری یەکی ئەیاریان کرد لەتەک

پارتی چەپی کۆمونیستی سوێد VPK ، هەروەها نوێنەری فیدراسیۆن لە ئاهەنگی ئەیار وتارێکی خوێندەوە لەسەر باری گەلی کورد و هێرشە دڕندانەکەی دوژمن بۆسەر کوردستان، لەوتارەکەدا سەرنجی دیموکرات و پێشکەوتن خوازەکان راکێشراوە بۆ رووداوەکانی کوردستان و داواکراوە بێ دەنگ نەبن لە ئاستی هێرشەکانی بۆ سەر کورد دەکرێ. هەروەها ـ کۆمە گۆڤەند ـ بەشداری ئاهەنگی ئەیاری کرد بە پێشکەش کردنی شایی و هەڵپەڕکێی کوردی.

## خۆپیشاندان دژی رژێمی تورکیا

فڕۆکە سوپاییەکانی رژێمی تورکیا لە رۆژی ١٩٨٧/٢/٤ هێرشێکی دڕندانەی بردە سەر کوردستانی عێراق و نۆ گوندیان بۆمباباران کرد، فیدراسیۆن بەم بونەیەوە بەیاننامەیەکی بە زمانی سوێدی لە هەموو سوێد بڵاو کردەوە،
وێنەی بەیاننامەکەیان ناردووە بۆ هەموو رێکخراوە سیاسی و کۆمەڵایەتیەکان و سەفارەتی دەوڵەتە بێگانەکان لە سوێد. جگەلە ستۆکهۆلم لە شارەکانی سوندسڤال وسودەرهامن و بولنێس ،هۆدیکسڤآل ،نۆرێنلا یۆتوبوری ، وێنە کیش کراوبلاوکرایەوە

لە رۆژی ٩٨٧/٢/٧ فیدراسیۆن خۆپیشاندانێکی پرۆتێستی رێکخست دژی سەفارەتی تورکیا، کە ژمارەیەکی زۆر لە رێکخراوەکانی کوردستانی و پێشکەوتن خوازی تورک و عەرەب و سریانی بەشداریان تێدا کرد و هەروەها ئیمزای خۆیان خستە سەر بەیاننامەی پرۆتێست.
لە سەرەتای خۆپیشاندانەکەدا نوێنەری پەرلەمانی سوێد، سۆسیال دیموکرات هانی یۆران، نوێنەری پەرلەمانی سوێد ـ پارتی چەپی کۆمونیستی سوێد نۆسڤالد سۆدەرکڤیست و سەرۆکی فیدراسیۆن هەڤال حەنەفی جەلەپلی وتاریان خوێندەوە، رژێمی تورکیایان مەحکوم کرد سەبارەت بە بۆمبا

www.arsivakurdi.org

وەرگیرا ئە بۆ کوردی • هەروەها گفتەگۆ کرا لە سەر ئەوەی فیدراسیۆن و ABF هاوکاری بکەن بۆ گیرانی سیمینار لە سەر کورد لە شارەکانی سوید• دوای ئەو کۆبوونەوە ، فیدراسیۆن ABF چەند جاریکی تر پیکەوە کۆبوونەوە • هەڤالان جەمیل وکەیسا لەو کۆبوونەوانەدا بەشداریان دەکرد• ئێستا لە نێوان ABF وفیدراسیۆن دا هاوکاری بە هێزە• بۆ نموونە : پێشبرکێی فۆلکلۆری کوردی لە ١٩٨٧/١٢/٢٠ بە هاریکاری هەردوو لا ئامادەکرا •

## کۆبوونەوەیەک لەگەڵ حکومەتی سوید

بەبۆنەی گۆیزانەوەی سکرتێری دەولەت یۆناس ویدگرین بۆ کاریکی تازە لە کۆمەلی نەتەوە یەکگرتووەکان، کۆبوونەوەکە ساز کرا و فیدراسیۆنی ئیمەش بانگ کرابوو. سەرۆکی فیدراسیۆن بەناوی فیدراسیۆن دەستە گولێکی پێشکەش بە یۆناس ویدگرین کرد لەگەڵ سپاسنامەیەک بۆ هەلویست و هاوکاری ناوبراو لەگەڵ فیدراسیۆن.

ـ لە رۆژی «٧»ی گولان (ئەیار) لەسەر داخوازی وەزیری بێگانەکان گورکی ئەندرسۆن، سکرتاریەتی فیدراسیۆن بەشداری کۆبوونەوەکەیان کرد، کە بەردەوامی کۆبوونەوەی ١٩٨٧/١/٢ بوو لەگەڵ وەزیری ناوبراودا، لەسەر باری کورد لە سویدا. حکومەت ویستبووی بزانێ ئایا باری کوردەکان ئێستا لە چدایە، بەتایبەتی پیکۆلاتیۆنی کە کرا بەرامبەریان بەهۆی کوشتنی ئۆلوف پالمە.

نوێنەرانی فیدراسیۆن، وەزعەکەیان بۆ وەزیر شی کردەوە وهەروەها بەگشتی باسی باری پەناهەبدەی کورد کرا .

وەک ئاشکرایە ژمارەیەکی زۆر بیانی لە سویددا دەژین. گەر هەلێکی وا بڕەخسێ و گۆڕانێکی دیموکراسی لە ولاتی ئەو پەنابەرانەدا رووبدات، زۆربەیان بۆ ولاتی خۆیان دەگەڕێنەوە، لێرەدا پێویستە حکومەتی سوید دەستی یارمەتی بۆ ئەوانەی ئارەزوویان دەبێ بگەڕێنەوە ولاتی خۆیان درێژ بکا. بەم مەبەستەش حکومەتی سوید کۆبوونەوەی جیاجیا لەگەڵ نوێنەرانی ئەو گرووپانە رێک دەخا.

لەو کۆبوونەوەی کە نوێنەرانی فیدراسیۆن بەشداریان کردبوو، پێشنیاری خۆیان بەحکومەتی سوید پێشکەش کرد.

بارودۆخی کوردستان و سیاسەتی ئەو رژێمانەی کوردستانیان داگیر کردووە، ئەو هەلەی رێک نەخستووە بۆ پەنابەری کورد کە بگەڕێتەوە ولات. پەنجە بۆ ئەوەش راکێشراوە کە هاتنی کورد بۆ سوید دوو شێوەی هەیە. جۆرێکیان بۆ کارکردن روویان کردۆتە سوید، ئەوی تریان پەنابەری سیاسین.

جا تا ئەو بارە گونجاوە بۆ کار دەخولقێ بگەڕێتەوە ولاتەکەی، پێویستە حکومەتی سوید هاوکاری بکا بۆ فێرکردنی کورد کە لە سوید دەژین، پیشەی هەمەچەشنە بۆ دابین کردنی دوارۆژیان. هەروەها حکومەتی سوید پێویستە لە سیاسەتی نێونەتەوەیدا، هەنگاوی پشتگیری

مافی کورد هەلبنێ دژی زۆردار وکۆلۆنیالیستەکان، بۆ نموونە سوید دەتوانێ لە بارەی نێونەتەوەییدا دەست پێشخەربێت بۆ سەربەستی زمانی کوردی و داخوازی کۆنکرێت پێشکەش بکا و پشتگیری بۆ ئەو داخوازیانە مسۆگەر بکا.

پێویستە لەسەر حکومەتی سوید چەند جۆرە خزمەتێک پێشکەش بەو کوردانە بکا کە ناتوانن بگەڕێنەوە ولات، بۆ ئەو مەبەستەش مەلبەندێکی کولتووری بکاتەوە بۆ پێشکەوتنی زمان و کولتووری کوردی.

نوێنەرانی دەولەتی سوید، داخوازیفیدراسیۆنیان تۆمار کرد و بەلێنیاندا لێی بکۆلنەوە. لە دوارۆژیشدا فیدراسیۆن خەبات دەکا بۆ ئەو جۆرە مەسەلانە.

## ـ کۆبوونەوەی ئەنجومەنی سکاندیناڤیا

## Nordiska Rådet

لە رۆژانی ٢٢ـ٢٤ نیسان ئەنجومەنی سکاندیناڤیا سیمینارێکی سێ رۆژیی گێرا لەسەر مەسەلەی پەناهەندە و موهاجیرەکان. لەو کۆبوونەوەیەدا سەرۆکی فیدراسیۆن هەڤال حەنەنی بەشداری کرد. لەو سیمینارەدا ژمارەیەکی زۆر لە

www.arsivakurdi.org

بۆ کوردستانی باشوور لەو ژمارەیەدا رەنگی دایەوە، هەر لەو ژمارەیەشدا گفتو کۆیەک لە گەل وەزیری بیانیان گورگی ئەندرسۆن پیشکەش خوینەران کرا. ژمارەی "٤"م لە سەرەتای پایزدا بلاوکرایەوە، زۆربەی لاپەرەکانی بۆ وەرگرتنی خەلاتی تۆخۆلسکی بە شاعیر شیرکۆ بیکەس و بەشداری کردنی فیداسیۆن لە فیستیفالی ئاشتی ولاتانی ئەسکەیندناڤیا تەرخان کرابوو. ژمارەی "٥" ش بە بریاری دەستەی نووسەران ژمارەی تایبەتی بو لەسەر ژیان و خەباتی زانای هیژا د. ئیسماعیل بەشکچی. ژمارەی "٦" و "٧" تەرخان کرا بۆ چالاکیەکانی فیدراسیۆن وەک: پیشبرکیی وەرزش و لاوان و منالان و هەر وەها سمیناری ئیسکلستونا و خۆپیشاندانی ١٢ ئەیلوول. ئەو دوو ژمارەی دوایی لە کۆتایی سالی ١٩٨٧ دەرچوو. لە سالی ١٩٨٨ ژمارەی یەکەم دەرچوو، ئەوەش بۆ دەنگ و باسی پیشبرکیی فۆلکلۆری کوردی لە ستۆکهۆلم و بەستنی کۆنگرەی یەکیتی لاوانی کورد لە سوید تەرخان کرابوو. دەستەی نووسەران بریاری داوە، تا کۆنگرەی هەشتەمی فیدراسیۆن دوو ژمارەی تریش دەرکا، یەکیان تایبەت بیٚ بۆ یادی "٥٠" سالەی راپەرینی دیرسیم و ئەوی تریان بۆ راپۆرتی سالانەی کار و باری فیدراسیۆن و بۆ چوونی ئەندامەکانی ئۆرگانەکانی فیدراسیۆن لەسەر فیدراسیۆن تەرخان بکریٚ.

## سپاسنامە بۆ بەشدارانی کۆنگرەی "٧"م.

دوای کۆنگرەی حەوت کۆمیتەی کارگیر سپاسنامەی نارد بۆ هەمو میوان و ریکخراوەکانی بەشداری کۆنگرەیان کردبوو، جا چ بەهاتنیان یاخود بە نامە و بروسکە.

## کرێکاری نوێ

فیدراسیۆن بە هاوکاری ئابوری کۆمیتەی کاری دەولەتی( (Länsarbetsnämnden ) دوو کریکاری بۆ فیدراسیۆن کرد. ٩٠٪ موچەی ئەو دوو کریکارە لە لایەن کۆمیتەی کاری دەولەتی دەدری و ١٠٪ لە لایەن فیدراسیۆن. هەر وەها هەڤال حەنەفی بۆ ماوەی "٣" مانگ (٩ تا ١٢) کاری کرد موچەکەشی لە لایەن شارەوانی ستۆکهۆلم دەدرا، وەلە (١٩٨٧/٩/٢١-١٩٨٨/٣/٢٠) ئەندامی کۆمیتەی کاگیر هەڤال جەمشید کار دەکا لە فیدراسیۆن و موچەکەشی لە لایەن ( ) دەدریٚ.

## بەنارمە و پیڕەوی فیدراسیۆن

دوای ئەو گۆرانانەی لەسەر بەرنامە و پیرەو لە کۆنگرەی ٧ فیدراسیۆن کرا، بەرنامە و پیرەو بەهەردوو شیوەی زمانی کوردی و، زمانی سویدی چاپکراو بەسەر هەموو ئۆرگانەکانی فیدراسیۆن و کۆمەلەکانی ئەندامی بلاو کرایەوە.

## کۆبوونەوە لەگەلّ کاربەدەستانی سوێد

### کۆبوونەوە لەگەلّ ئەنجومەنی باری مندالآن (Barnmiljörådet)

لە رۆژی ٩٨٧/٢/٢٦ کۆبوونەوەیەک لەگەلّ ئەنجومەنی باری مندالآن کرا. لەو کۆبوونەوەیەدا لە بارەی چۆنیەتی باری مندالآنی کورد لەکوردستان و سوێد باسکرا و داواش کرا لە ئەنجومەن بە زمانی کوردی ئاگاداری و ماتریال بلآوبکاتەوە. هەروەها لەسەرباری مندالآنی کورد لەقوتابخانەکانی سوێد قسەکرا. ئەنجومەن گرنگیدا بەو زانیارانەی کە لەلایەن فیدراسیۆنەوە پێشکەش کرا و هەروها بەلێنیدا گرنگی بداتە باری مندالآنی کورد.

### کۆبوونەوە لە گەل ABF

لە رۆژی ١٩٨٧/٣/٤ سەرۆك و سکرتێری فیدراسیۆن کۆبوونەوەیەکیان لە گەل بەرپرسیاری ABF ی ستۆکهۆلم کرد لە بارەی هاوکاری نیێوان هەر دوو لا. فیدراسیۆن برەشووریکی لەسەر کاروبارەکانی ABF

www.arsivakurdi.org

# راپۆرتی فیدراسیۆنی کۆمەلەکانی کوردستان بۆ کۆنگرەی هەشتەم

## ١٣-١٤ شوباتی ١٩٨٨ ستۆکهۆلم

## کۆبونەوەکانی رابوردووی کۆمیتەی گشتی و کۆمیتەی کارگێر

کۆمیتەی گشتی فیدراسیۆن یەکەم کۆبونەوەی خۆی لە رۆژی ١٩٨٧/٢/٢١ کرد. لە کۆبونەوەکە دا هەڤال حەنەفی جەلەپلی بە سەرۆکی فیدراسیۆن هەلبژاردرا. هەروەها ئەندامانی کۆمیتەی گشتی پێشنیاری خۆیان بۆ پرۆگرامی کار و گێرانی جەژنی نەورۆز پێشکەش بە کۆمیتەی کارگێر کرد.

هەر لە رۆژی ١٩٨٧/٢/٢١ کۆمیتەی کارگێری یەکەم کۆبونەوەی کرد و لە کۆبونەوەکەدا کار لە نێو ئەندامانی کۆمیتەی کارگێر بەو جۆرە دابەش کرا. هەڤال کەیا ئێزۆل سکرتێری فیدراسیۆن و بەر پرسیاری گۆڤاری "بەربانگ" ، هەڤال دجلە کیزل سکرتێری ئابوری. لە کۆبونەوەی دووەمی کۆمیتەی کارگێردا هەڤال جەمیل بە سکرتێری لاوان و بەرپرسیاری پێوەندی لەگەل کۆمەلەکانی ئەندامی فیدراسیۆن هەلبژاردرا. وهەڤال د. جەمشید بەرپرسیاری کۆر و سیمینارە لە فیدراسیۆن هەلبژاردرا. هەر لەو کۆبونەوەیەشدا سکرتاریەت لە سەرۆک و سکرتێرو و سکرتێری ئابوری پێکهات بۆ راپەراندنی کاروباری بەپەلە.

## بەربانگ

کۆمیتەی کارگێر لە کۆبونەوەکانی ٢.١ دا لە سەر باری گۆڤاری بەربانگ دوا. لە کۆبونەوەی یەکەمی دا هەڤال کەیا بە بەرپرسیاری "بەربانگ" هەلبژاردرا واش بریاردرا کە دەستەی نووسەرانی بەربانگ وەک جاران بمینێ، بەلام گەر کرا فرەوانتر بکرێ .

دەستەی نووسەران کۆبونەوەی خۆی لە ١٩٨٧/٣/٢١ کرد لە کۆبونەوەکەدا هەڤالان: ر. زیلان، م. بەکر، ج. کوردۆ، ر. سمۆ و حەنەفی بەشدار بوون . لەسەر بەربانگ و پێویستی فرەوانکردنی دەستەی نووسەران دوان. دەستەی نووسەران وەک جاران مایەوە. دەستەی نووسەرانی کۆن فرەوانکردنی دەستەی نووسەرانیان بە پێویست نەزانی. هەڤال ر. زیلان لە لایان هەمو هەڤالانەوە بەسەر نووسەر هەلبژاردرا. لە ژمارەی "٣"ی بەربانگ وە، بە پێشنیاری کۆمیتەی گشتی هەڤال جەمشید حەیدەری خرا دەستەی نووسەرانی بەربانگ.

دەستەی نووسەران لە کۆبونەوەکانی خۆیدا، نەخشی هەمو ژمارەکانی سالێکی دانا. بۆ ئەو مەبەستەش ژمارەی یەکەمی تەرخان کرد بۆ دەنگ و باسی کۆنگرەی "٧"، ژمارەی دووەم بۆ جەژنی یەکی گولان و نەورۆز تەرخان کرد. ژمارەی سێیەم کە لە سەرەتای هاوین دەرجوو، باری کوردستانی باشوورو کەمپانیای هاوکاری

www.arsivakurdi.org

و بنەچەکەی خۆیان لە بیر نەکەن و لە پاشە
ڕۆژ دا ببنە سەرمایەی فکری و هێزی ئینسانی
پسپۆڕ و لێزان بۆ کوردستان .
٣- تەجروبەی ١٣ ساڵی ڕابردوو لە ئوروپا نیشانی
داوە لە بەر باری واقعی کوردستان ، واتە
دابەشکرانی ولاتی کوردان و ئەو ڕاستی یەی کە
هەر کەرتێکی گەلی کورد بە جوێ خەباتی سیاسی
یان نیزامی خۆی بەڕێوەدەبا ، کۆبوونەوەی هەموو
کوردەکان لە دەرەوە لە سەر بنەمای پلاتفۆرمێکی
موشتەرەکی سیاسی دەست ناداو هەر جۆرە
ئیتیلافێکی کە لەناو بەر لایەنگران و ڕێکخراوە
کانی دوو یان چەند بەشی کوردستان بۆ
کاری " دێموکراتی " پێك هاتبێ دوای ماوە یەك
چەت دەکاری کەوتووە و ئەگەر زۆر خۆشبین بین
دەکرێ بڵێین هەر ڕێکخراوێك یان یەك دوو
ڕێکخراوی واهەبوون کە نێوی کۆمەڵە" دێموکراتی"
یەکیانیان پاراستبێ و بەگوێرەی کێشر و قورسایی
یان ئەوانی دیکەیان بە دوای بۆچوون و سیاسەتی
خۆیدا ڕاکێشاوە .
٤- لە چوار چێوەی گردبوونەوەیەکی وەك فێدراسیۆن
دا کە ئیتیلافێکی سیاسی نییە ، بەڵکوو
ئەرکی سەرەکی لەسەر کردنەوە و پاراستنی
ماف و قازانجی هەموو کوردەکانی دانیشتووی
سوێدە هەڵی ئەوە هەیە هەموو کورد جێی
بێتەوە و پاراستنی ماف و قازانجی ئەندامان
و لایەنگرانی ڕێکخراوە سیاسی یەکانی کوردستانیشی
وەك ئینسانی کورد تێدا ڕەنگ بداتەوە .
ئێمە ئەمڕ ئێستا ١٥ قۆڵمان لێك هاڵاندبێ
و هەر ڕۆژەش قۆڵمان لێبێتەوە بۆئەوەی باسکی
دیکە لە یەك بەستین ئەگەر واقعبین بین لە
بنچینەدا دەمار و گرێی قۆڵمان یەکە
و چەندایەتی بۆ نییە ، ئەویش کورد بوونمانە
نەك کرمانج و سۆران و توران و ئێران .
لێرە دا بە هیچ کلومجێ مەبەست ئەوە نییە
کە چاو لە باری واقعی ولات داپۆشرێ و
خودای نەخواستە باری جیاوازی چینایەتی
و بۆچوونی دوور لەیەکی ئیدیئۆلۆژی
و لێکدانەوەی جار جار دژ بەیەك و دژلەهەڤی
سیاسی و شەڕی دوژمنی بە ڕواڵەت جیاواز
بشاردرێتەوە . مەبەست کورت و کرمانجی
ئەوەیە : لە چوار چێوەی مەیدانێکی وەك فێدراسیۆن
دا کە ئامانجی ئاڵوگۆڕ کردنی باری کۆمەڵایەتی
و سیاسی کوردستان نییە و ئەرکی بەرپا
کردنی شۆڕشی کۆمەڵایەتی و سیاسی لەبەر
دەم دا نییە ، هەڵی ئەمە هەیە
هەڵگرانی هەموو جۆرە ئیدیئۆلۆژییەك و لایەنگرانی
هەموو ڕێکخراوەکانی کوردستان بە بێ
ڕێزپەڕ و ئیستیسنا جێ بگرن تەنیاو تەنیا بەو
مەرجەی لەو ڕاستی یە تێبگەن کە لە چوارچێوەیەك
دا لە گەڵ کوردەکانی دیکە دا کاردەکەن کە
سەر بە ڕێکخراوی وان نییە بەڵام بە گشتی
بەلانی کەمەوە قازانجی ئەندامەکانی
خۆیانی لە ولاتێکی وەك سوێد دا تێدا
ڕەنگ دەداتەوە .

ڕێکخراوە سیاسی یە کوردیەکانی کە لە سوێد هەن
مافی خۆیانە چۆنی بە باش دەزانن بۆ
بەرگری لە مافی گەلی کورد لە [illegible]ولات
یەك بگرن ، بەڵام ئەرکێکی دیکە شیان هەیە
ئەویش بەشداری چالاکانە لە کاری ڕێکخراوێك دا یە کە
بۆ پاراستنی ماف ، قازانج و بە دەنگەوە هاتنی
کوردەکانی دانیشتووی سوێد هەوڵ دەدا .
ئەو باسە زۆری بە بەرەوە هەیە و کورد کوتەنی
ئەو هەویرە زۆر ئاو دەبا ، کە هیوادارم ببێتە
دنەدەری باس و دەمەتەقە لەم بارەوە و زیاتر
شی بکرێتەوە .

سوندسڤال ١٧ی ژانڤییەی ١٩٨٨
حەسەنی سەیفی قازی

www.arsivakurdi.org

## با هەموومان لە چوار چێوەی فێدراسیۆن دا ببینە

قۆلێک

جێی سپاس و پێزانینە کە کاک کمیا ئیزۆل بەرپرسی گۆڤاری "بەربانگ" داوای لە هەموو ئەندامانی کۆمیتەی گشتی فیدراسیون کردوو وە کە بە بۆنەی نزیک بوونەوەی کۆنگرەی ساڵانەی فێدراسیۆن بیرو رای خۆیان سەبارەت بە کار و رێبازی ئەم رێکخراوەیە بهێننە گۆرێ. ئەوا منیش لە خوارەوە بە کورتی و بە وردی گەلاڵەی چەند بۆچوونێک پێشکەش دەکەم و کورتە پێشنیارێکیش لە گەڵ ئەو کوردانەی تائێستا لە دەرەوەی فێدراسیۆن ماونەتەوە دەهێنمە گۆرێ.

١- فێدراسیۆن لە نێوان دوو کۆنگرەی خۆی دا هەنگاوی باشی ناوەتەوە و توانیویە ژمارەیەکی زۆرتر لە کوردەکان لە چوارچێوەی کۆمەڵەکان دا لە دەوری خۆی کۆکاتەوە. لەبواری فەرهەنگی و هونەری دا لە قەدەر توانا و دەرەتانی خۆی کاری کردوو وە (بۆ وێنە پێک هێنانی کۆری هونراوە خوێندنەوە بۆ ماموستا شێرکۆی بێکەس لە چەند شاران و رێکخستنی پێشبرکێی هەڵپەرکێی کوردی). فێدراسیون لە پێوەندی لە گەڵ دەزگای کار بەدەست و دەستەڵاتداری جۆر بە جۆری سوێد لە جاران چالاکتر بووە، و لە پێوەندی نێوکۆیی کوردەکان دا توانیویە تاڕادەیەک لە چوارچێوەی تەنگەبەری ناوچەیی خۆی دەرباز کا و بەگشتی هەنگاوی بەرەو ئەوە ناوە کەببێتە قسەوێژ و نوێنەری پارێزەری ماف و قازانجی کوردەکانی دانیشتووی سوێد. دیارە لە هەندێ ڕوو وەوە فێدراسیۆن نەیتوانیوە بەو جۆرەی کە پێویستە هەڵسوورێ و ئەرکی خۆی ڕاپەڕێنێ ئەویش سەبارەت بە مەسەلەی پەنابەران، باری کۆمەڵایەتی ژنان و منداڵانی کورد لەم وڵاتە و هەر وەها شێوەی پێوە چاران بە هەبوونی دوو ئەلفوبێتکە لە زمانی کوردی دا. بەو هیوایەی کە بە دەم سەقامگیربوونی فێدراسیۆنەوە ئەو ئەرکانەش بەرەبەرە مشووریان لێبخورێ و زیادتر سەرنجیان بدرێتێ.

٢- زۆربەی لایەنگران، ئەندامانی ئەو رێکخراوانەی کە خۆیان سەر بەیەک لە رێکخراوە یان پارتی‌یە سیاسی‌یەکانی کوردستان دادەنێن و لە سوێد داهەن بە داخەوە تا ئێستاش بۆچوونێکی ڕوونیان لە سەر فێدراسیۆن نییە و ئەو لێک گردبوونەوەیە بە بوونەوەرێکی جوێ لە خۆیان دادەنێن و بە شێوەیەکی میکانیکی لە نێو خۆیان و فێدراسیۆن دا هێڵ کێشی دەکەن. بە بۆچوون و تێگەیشتنی من فێدراسیۆن بۆ ئەوە دامەزراوە و کار دەکا کە بتوانێ کوردەکانی دانیشتووی سوێد بێ لەبەر چاوگرتنی ئەوەی کە لە کامە بەشی کوردستانەوە هاتوون، بێ لە بەر چاوگرتنی بەسترانەوە و نەبەسترانەوەی سیاسی و شێوەی بۆچوونی ئیدیۆلۆژی و فکری یان لە نێو خۆی دا کۆکاتەوە و ماف و قازانجی کوردەکان لە سوێد بپارێزێ و بتوانێ باری ژیانی کۆمەڵایەتی و فەرهەنگی یان لەم وڵاتە باشتر بکا. بوونی فێدراسیۆن و هەڵکشان و داکشانی، چلۆنایەتی هەڵس و کەوتی ڕاستەوخۆ بە هەلوو مەرجی چۆنییەتی باری کۆمەڵایەتی و سیاسی کوردستانەوە گرێ نەدراوە. فێدراسیۆن تەنێ دەتوانێ و بۆی هەیە بە شێوەیەکی ناڕاستەوخۆ ئەرک و وەبالی سەرملی خۆی لە حاست هەلوو مەرج و خەباتی گەلی کورد لە نێو خۆی وڵات ڕاپەڕێنێ. بۆ وێنە ئەگەر فێدراسیۆن دەرەتانی هەبێ و گشت ئەو کوردانەی لێی دەژانن بە دەنگی‌یەوە بێن بۆی دەلوێ ڕێگای لەبارتر بۆ ئەو منداڵانەی لە سوێد گەورە دەبن وپێدەگەن بدۆزێتەوە و یارمەتی‌یان پێ بکا بۆ ئەوەی ڕیشە

www.arsivakurdi.org

# بەرەو کـۆنگرەی هەشتـەم

دوای چەند رۆژێکی تر کۆنگرەی هەشتەمـــــی فێدراسیون لە ستوکهولم دەبەستری ٠

شێوەی نوێ فێدراسیون تا چ رادەیەك توانیویەتی لە ئاست کوردەکانی دانیشتوی سوید ئەرکی سەرشانی خۆی بە جێ بگەیەنێ ؟ کۆسپ و تەگەر لە بەر دەمـــی فیدراسیوندا چ بووە و لە باری کولتوری‌یەوە چ خزمە ـ تێکی کردوە ؟ بۆ بە هێز کردنی فیدراسیون پێویستە چ بکرێ و ئەرکی رووناکبیرو سیاسیەکانی کورد لـــەو بارەدا چی‌یە ؟

بێگومان ئەو گۆڕانەی بەسەر شێوەی تاکردنـــــی فیدراسیوندا هاتووە ، فیدراسیونی لە زۆر گیـــــرو گرفت و کۆسپ و ناکۆکی رزگار کردوەو راستیـــش ئەو شێوە تازەیەی سەلماندوە ٠ چونکە لە جـــاران چا لاکتر کەوتۆتە کارو بنکەی فرەوانتر بووە٠ بـــۆ نموونە لە کۆنگرەی حەوتەم دا ، دە کومەلە ئەندامـــی فێدراسیون بوون ٠ بەلام لە دوای کۆنگرەوە تا کۆنگرەی هەشت کۆمیتەی کار گێرو گشتی توانیان لە زۆربـــەی شارەکانی سوید لە هەر شوینیك کوردی ئاوارەو پەنا ـ هەندەی لێ بێ ، پێوەندیان پێوە بکەن و کۆمەلـــەی کوردی دامەزرێنن ٠

لە کۆنگرەی داهاتوودا کە لە ١٣ ـ ١٤ ی شوبـــات دەبەستری ، ژمارەی کۆمەلەکانی ئەندامی فێدراسیون گەیشتۆتە ٢٤ کۆمەلە ٠ بێ گومان ئەوە دەستکەوتێکی کۆمیتەی کار گێر و گشتی یە ٠ بەلام تا ئیستـــــا نیزیکەی نیوەی ئەو کوردانەی لە سوید دەژین لـــــــە دەرەوەی فێدراسیونن ٠ لێرەدا پێویستە پەنجـــە بـــۆ ئەو کۆسپانە رابکێشرێ کە بوتە هۆی ئەوەی هەمـــوو کوردەکان یا خود زۆربەیان لە ژێر چەترێ فێدراسیون دا کۆ نەبنەوە ؟ بە تایبەتی لە شارێکــــــی وەك ستوکهولم کە ژمارەی کورد دەگاتە دوو هەزار کـــەس و بە دەیان کۆمەڵەی کوڵتوری و دیموکراتی جیـــا جیای تێدایە کە دوور لە فێدراسیونن ٠ دیارە ئـــەو بارەی ئیستای کۆمەڵەکان و پاراستنی سەربەخۆیـــی کارو دووری لە فێدراسیون دەگەرێتەوە سەر بـــارو شێوەی کۆنی فێدارسیون کە لەسەر بناغەی ئـــەو کۆمەلانە دامەزرابوون کە سەر بە هیز و ریکخستنـــی سیاسی جوراو جۆری کوردستانی بوو٠ ئەوانـــــە دوای چەسپاندنی شێوەی تازەی کاری فێدراسیـــون دوورە پەرێز وەستان ٠ لێرەدا بە بروای من یـــەك هۆی سەرەکی بوتە تەگەرەو کۆسپ لەبەر دەم مانەوەی هێندی کۆمەلە دوور لە فێدراسیون یا خود ئەندامانـــی کۆمەلەکانی پێشوی فێدراسیون بێنە ریزی کۆمەلـــە نوێ یەکان ٠ ئەویش لێك جیا نەکردنەوەی کـــاری دیموکراتی و کۆمەلایەتی‌یە لەگەل کاری سیاسی ، یا بە جورێکی تر نەزانین و لێك جیا نەکردنەوەی ئەرکی کۆمەلایەتی فێدراسیون و ئەرکی سیاسی ریکخستنە ـ کانە ٠ فێدراسیون بە پێ پێرەو بەرنامە و چا لاکـــی رۆژانە سەلماندوویەتی کە ریکخراوێکی دیموکراتـــی کوردستانی یەو دەرگای بۆ هەموو کوردێکی نیشتمان پەروەرو دەلسۆز بێ جیاوازی بیرو باوەرو هەلوێستـــی سیاسی و ریکخراوەیی لە سەر پشت کراوەتەوە ٠

فێدراسیون لە پێناو بەرگرێ کردن لەبەرژەوەنـــدی کۆمەلایەتی ئەندامەکانی و بەرەو پێش بردنی ژیانـــی کولتوری و چارەسەر کردنی گیرو گرفتەکانـــــی پەنابەرانی کورد تێ دەکوشی ٠ بەلام ئەوانەی لـــــە فێدراسیون دوورە پەریز رادەوەستن ، یا تەگـــەرەو کۆسپ دەخەنە پێشی ، لە هەر روانگەیەکەوە بـــۆی بچن ، لە ئەنجامدا زەرەر بە یەکگرتنی ریزی کـــورد دەگەیێنن ٠ لە کاتێکدا ئەگەر فێدراسیون بە هیـــزو توانا بێ ، دەتوانێ خزمەتێکی گەورە بە کـــوردە ئاوارە و پەناهەندەکان بکاو ببێتە پاڵ پشتی خەباتی سیاسی و ریبازی دیموکراتی بزوتنەوەی رزگاریخوازی گەلی کورد دژی داگیرکەرانی کوردستان ٠

**وشەیەك لەبارەی رۆلی رووناکبیران و بـــاری گۆڤاری بـــەر بـــانـــگ**

لە سوید ژمارەیەکی زۆر رۆشنبیرو نووســـەر و شاعیر و هونەرمەندی کورد جێگیر بوون هەمووشیـــان تا رادەیەك چا لاکی کولتوریان هەیە ٠ بەلام جێگـای داخە کە کارەکەیان پەرش و بلا و هاوکاری لەگـــەل یەك ناکەن و هەر کەس بۆ خۆی دەژی ٠ نەك هەر ئـەوە بەلکو هێندێکیان بێزیان لە کاری هاوبەشـــــی کۆمەلایەتی گشتی هەیەو دوورە پەریز وەستاون ٠

لەکاتێکدا ئەگەر ئەو توانا و زانایی خۆیان بـــۆ بەرز کردنەوەی پلەی ژیانی کولتوری کۆمەلایەتـــی خەلکی هەراوی ئاوارەی کورد تەرخان بکەن ، لـــەو دەرفەتە سود وەرگرن و پێکەوە کار بکەن و گوڤـــاری فێدراسیون بکەنە گوڤارێکی کولتوری و کۆمەلایەتـــی دەولەمەند و پێشکەوتنخوازی گشتی ، دەتوانن نـــەك هەر لە ئوروپا بەلکوز لە ولاتیشدا بۆشاییەکـــی زۆر لە کتێبخانەی کوردی پر کەنەوە ٠ بـــــەلام بەداخەوە ئەزمونـــی ئەو چەند مانگەی دەستـــەی نووسەرانی بەربانگ دەری خست تا چ رادەیـــــەك نووسەران لە نووسین و هاوکاری دوورە پەریـــز دەوەستن و بەلام لە گلەیي و رەخنەدا چەند چابـــك و چا لاکن ٠

**د ٠ جەمشید حەیدەری**

بەربانگ ئۆرگانی فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانیەکانە لە سوید

بەرپرسیار: ک. ئێزێل سەرنووسەر: ر. ژیلان

دەستەی نووسەران: م. بەکر، ج. کۆزێل، ر. سمق، ج. حەیدەری

ئابونەی ساڵانە ١٠٠ کرۆنی سوێدیە بۆ دەزگاکان ٢٠٠ کرۆنی سوێدیە

ناونیشان: Berbang

Box. 45205, 104 30 Stockholm

پۆستگیرۆ: 643880-8

تەلەفۆن: 08-68 60 60

دەستەی نووسەران بەرپرسیار نیە لە نووسین و وتارەکانی فیدراسیۆن.

ئەو نووسینانەی بۆ بەربانگ دێن، گەر بلاو نەکرێتەوە بۆ خاوەنەکەی ناگەڕێتەوە.

www.arsivakurd.org

UTGIVAR KORSBAND

BERBANG
BOX 45205, 104 30 Stockholm

# Ez di karê xwe de têm teqdîr kirin



**Kurt Kero li nexweşxana Danderydê hemşîre ye û serekê beşa klînîka enfeksiyonê ye. Wî bixwe biryar daye ku bi mirovan re mijûl bibe. Karekî weha gelek tiştan ji mirov dixwaze, lê herweha gelek tiştan jî dide mirov.**

– Piştî dehsalan min karê xwe yê defterî û kasadariyê guhart. Karê bi kaxizan êdî tişt nedida min. Min bîryara xwe da ku ez bi mirovan re mijûl bibim. Lewra jî min xwe hînî pêşeya hemşîretiyê kir.

– Karê min ji bo nexweşan girîng e û ez ji aliyê wan ve têm teqdîr kirin. Ew kêfxweşbûna xwe bi karê ku ez dikim ve didin nîşandan.

– Karê di klînîka enfeksiyonê de carna dikare gelek giran be. Lê em di komika kar de piştgîrî û alîkariya hevudu dikin.

**Ma tu jî naxwazî bi karekî bi jiyanê ve girêdayî û jîndar ve mijûl bibî?**
**Telefonê "Vårdjobb"-ê bike!**
**08/737 30 30**
**Yan jî xwe hînî karekî bi jiyanê ve girêdayî û jîndar bikî?**
**Telefonê "Vägen till Vårdjobb"-ê bike!**
**08/737 30 40.**

**Stockholms läns landsting**
**Meclîsa wîlayeta Stokholmê**

www.arsivakurdi.org

Författares Bokmaskin
Stockholm 1988